K.T.

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZİMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSA BİLİND

# DI EDEBIYATA KURDISTANA IRAKÊ DE

# ROMANA SiYASÎ

Amadekar

Karukh Dara MOHAMMED

Şêwirmend

Doç. Dr. Kemal **EROL**

WAN– 2018

T.C.

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

# IRAK KÜRDİSTAN EDEBİYATINDA SİYASİ ROMAN

Hazırlayan

Karukh Dara MOHAMMED

Danışman

Doç. Dr. Kemal **EROL**

VAN –2018

## NAVEROK


**KURTE ........................................................ I**

**ÖZET ........................................................ II**

**ABSTRACT ........................................................ III**

**PÊŞGOTIN ........................................................ IV**

**SPAS Û PÊZANÎN JI BO ........................................................ VII**

**KURTEBÊJ ........................................................ VIII**

**1. DESTPÊK ........................................................ 1**

**BEŞA YEKEM**

**Nasandina Romana Sîyasî**

**1.1 Beş û Pênaseya Romana Sîyasî ........................................................ 1**

**1.2. Peywendîya Di Navbera Wêje û Sîyasetê de ........................................................ 7**

**1.2.1 Felsefe ya Sîyasî ........................................................ 9**

**1.2.2 Zanîsta Sîyasetê ........................................................ 9**

**1.2.3 Zanîsta Sîyasî ........................................................ 9**

**1.3 Taybetmendîyên Romana Sîyasî ........................................................ 12**

**1.4 Dîroka Romana Kurdî Di Kurdistana Irakê de ........................................................ 15**

**1.5 Qonaxên Romanên Kurdî ........................................................ 17**

**1.5.1 Qonaxa Serhildan Hêvîbûn, Nenasandina Hevdû û Ji Hev Cudanekirina Berheman Bi Şêweyekî Zanistî 1925-1970 ........................................................ 19**

**1.5.2 Qonaxa Bê Agahî û Kêmbûnê, 1971-1981 ........................................................ 20**

**1.5.3 Qonaxa Çîya û Bajar Pêşketinê 1982-1990 ........................................................ 22**

**1.5.4 Qonaxa Nasandina Romana Kurdî Bi Cîhanê Di Sala 1991 Heya Niha . 26**

**BEŞA DUYEM**

**Naveroka Romana Siyasî Li Kurdistana Irakê De**

**2.1 Naveroka Romana Siyasî Li Kurdistana Irakê de ........................................................ 34**

**2.2 Karesata Enfal ........................................................ 39**

**2.2.1 Qonaxên Enfalê ........................................................ 39**

2.3 Karesata Kîmiyabarankirina Navçeyên Kurdistanê ........................................44
2.4 Veguhestin (Terhîl û Tehcîl û Tesfîr ) .......................................................50
2.5 Rêketin Nameya 11 Adar 1970 .....................................................................54
2.6 Şikestina Şoreşa Îlona Sala 1975 .................................................................56
2.7 Şerê Îran û Iraqê ..........................................................................................59

**BEŞA SÊYEM**

**Têkiliyên Di Navbera Romanên Siyasî û Corên Sereke û Teknika Hunerîya Roman de**

3.1 Têkiliyên Di Navbera Romanên Siyasî û Corên Sereke Yên Roman de .........62
3.1.1 TêkilIya Di Navbera Roman Siyasî û Karekter de ....................................62
3.1.2. Giringiya Cihê Karekter Di Romanên Nû de ............................................66
3.1.3 Têkiliya Di Navbera Romana Siyasî û Corên Vegotinkirin .......................69
3.1.4 Têkiliya Romana Siyasî li Gel Dem ...........................................................72
3.1.5 Têkiliya Romana Siyasî li Gel Cih ..............................................................75
3.1.6 Têkiliya Romana Siyasî li Gel Bûyer ..........................................................79
3.2 Têkiliyên di navbera Romanên Siyasî û Teknika Hunerîya Romanê de .......83
3.2.1 Têkiliya Romana Siyasî Bi Hûnerê Pênasekirinê (Wesifkiirinê) ..............83
3.2.2 Têkiliya Di Navbera Romana Siyasî û Hunera Montajê de. ....................86
3.2.3 TêkilIya Romana Siyasî ligel Hunera Guftugokirinê ................................87
3.2.4 TêkilIya Di Navbera Romana Siyasî û Hunera Monolog de .....................91
3.2.5 TêkilIya Di Navbera Romana Siyasî û Ziman de .......................................96
ENCAM ..............................................................................................................99
ÇAVKANÎ ..........................................................................................................103

# KURTE

Ev lêkolîn herêma ku hatiye kirin, Di Edebyata Kurdistana Irakê De Romana Siyasî. Di Edebiyata Kurdistana Irakê de mijara romana siyasî hildaye dest. Di herêmê de derbarê felaketên civakî wek Enfal û Helebçe bûyerên trajîk jî hildide dest; ji ber vê yekê girêdayê raxistina têkiliya roman-siyaset maye tekstên honandî hildide dest.

Ev xebat, di Kurdistana Irakê de panaromaya dîroka bixwîn û siyasî kurtebir dike. Lewma di Kurdistana Irakê de bûyerên trajîk ku netewe jiyaye hinede dest tune ye. Ji ber vê yekê zanista roman-siyaset ve bivê nevê têkildar e.

Ev xebat têkiliyên siyaset-civak-dîrok û roman dike, di Kurdistana Irakê de vekolîna yekemîn pêk tîne. Ev tez wek xebatek akademîk hatiye kirin, di romanê de metodolojî, mijara romana siyasî, romana siyasî aliyê wê yê teorîk bigire di sê beşan de pêk tê.

Bêjeyên Sereke: Roman-Siyaset, Kurdistan-Komkujî, Gaza Kîmyewî, Enfal, Helebçe, Roman nivîs

## ÖZET

Bu araştırmanın yapıldığı yöre, Irak Kürdistan Edebiyatında siyasi roman. Irak Kürdistan edebiyatında siyasi roman konusunu ele almaktadır. Bölgede yaşayan sosyal felaketlerle ilgili Enfal ve Halepçe gibi trajik olayları da işleyen; bu nedenle roman-siyaset ilişkisini sergileyen bir anlatıma bağlı kalmış kurmaca metinleri ele almaktadır.

Bu çalışma, Irak Kürdistan'ında siyasi ve kanlı tarihin panoramasını özetlemektedir. Zira Irak Kürdistan'da ulusun yaşadığı trajik olayları dikkate almayan roman yoktur. Bu nedenle roman siyaset bilimiyle zorunlu olarak ilişkilidir.

Siyaset-toplum-tarih ve roman ilişkisini işleyen bu çalışma, Irak Kürdistan'da yapılan ilk araştırmayı oluşturmaktadır. Akademik bir çalışma olarak hazırladığımız bu tez, romanda metodoloji, siyasi romanın konusu, siyasi romanın kuramsal boyutları olmak üzere üç bölümden oluşmaktadır.


**Anahtar Kelimeler**: Roman-siyaset, Kürdistan-Katliam, Kimyasal gaz, Enfal, Halepçe, Roman, Yazar

## ABSTRACT

This literary research is about political novels in the Iraq Kurdistan. Due to the incidents that happened to the Kurds, like Anfaal, the use of chemical weapons, genocide, and many others, this research also shed light on the connection between novel and politics. The use of the articles that were written Kurmanji dialect contributed significantly for this research. In this research, the bloody political history of Iraq Kurdistan is shortly exhibited. Despite the fact that lots of monstrous incidents have happened to the Kurds, only few novels have been written in this field. Due to this fact, we can say that there is a very unwilling connection between novel and politics. This literary research is a new research in its field for the Kurdistan Region. Academically, the research is composed of three parts which are, Methods of Novels, Categories of Political Novels, and Social measurements of Political Novels.


**Key words**: Novel-politics, genocide-Kurdistan, chemical weapons, Anfaal, Halabja, novel writer.

## PÊŞGOTIN

Roman bi giştî û romana siyasî bi taybetî yek ji cûreyê serekiyên romane li edebê da. Eger vegerîne li ser destpêka serhildana van cûre romanan, ku romana siyasiye wekî çemk dîrokeke xwe ya dûr û dirêj tûne. Lê belê naverok û babet dîroka wê vedigerê ser sedsala navîn. Her çende bi vî navî jî nebûye, lê belê her hebû. Lê di dema me ya îro da ev cûre roman ku romana siyasiye û li cîhana romanê da gelek ji rexnegiran bi beşekî girîng û naverokekî diyar û ber bi çav dizanin. Bi taybetî piştî şerê yekemê cîhanî, ev cûre roman rû li zêdebûnê kiriye bi taybetî jî ji bo wan mîllet û neteweyên xwedî kiyaneke siyasî û dewleta xwe nebûn. Bingeha serekiya van cûre romanan, rûdana serekiyên naveroke ku hilgirê çemk û bingeha siyasî û rûdanên dîrokîne.

**Sînorê lêkolînê:**

Li vê lêkolînê de tenê me kar li ser romana siyasî li nav hemû cûreyên romanê da kiriye. Her wiha li nav romana Kurdî da jî wekî mînak me tenê romanên Kurdistana Irakê wergirtiye.

**Navnîşana lêkolînê**

Ev lêkolîne her wek ji navnîşana xwe diyare (Di Edebyata Kurdistana Irakê de Romana Siyasî) hewleke akademîke ji bo derxistin û peywendî di navbera roma û sîyasetê de û behiskirna hokar (sedem) û pirsgirêkên sîyasî u civakî ku bune sedema serheldana romana sîyasî di nav wejeya kurdistana Irakê de.

**Astengî û Pirsgirêkên Lêkolînê**

Guman li wê yekê da tûne ku hîç lêkolîneke akademî bi bê kêmasî nebê, yek ji pirsgirêkên lêkolînê nebûna çavkaniyên pêwîst bi zimanê Kurdî bû. Her wiha nezanîna zimanê dûyem ji aliyê lêkolîner ve kêşe û giriftekî din bû.

**Girngîya lêkolînê**

Girngîya vê lêkolînê xwe di wê da nîşan dide ku heta niha tu xebateke taybet li ser alîyên sîyasî di wêjeya kurdî da nehatine kirin û bi taybetî jî li ser alîyê sîyasî di nav janrên roman da nehatîye kirin

**Rêbaza lêkolînê:**

Li vê lêkolînê da me peyrewa metoda rêbaza wesfê şîrovekirinê kiriye, wate ji bo aliyên teoriyên romanê me sud ji wesfê wergirtiye, ji bo destnîşan kirina rûdanan û pêkanîna wan metoda rêbaza şîrovekirinê me bikaraniye. Her çende li hinek cîhan de jî me her dû metodan têkilhev jî kiriye

**Armanca lêkolînê:**

Armanca me pêkhatiye destnîşankirina rûdanên siyasiyên Kurdistana Irakê li nav tekstên romanên li Kurdistan Irakê û şîrovekirin û pêkanîn û berev pêşveçûna tevgera romana Kurdî li Irakê da.

**Pêkhata lêkolînê**

Ev lêkolîn berî pêşkêş kirin û spas û pêzanîn û pêşekî û kurtî bi her sê zimanên Kurdî, Tirkî, Îngilîzî, li sê beşan pêktê ku evin:

**Beşa yekem:**

Li 4 mijar pêkhatiye, Pênaseya Romana Sîyasî , Peywendîya Di Navbera Wêje û Sîyasetê De , Taybetmendîyên Romana Sîyasî , Dîroka Romana Kurdî Di Kurdistana Irakê De , ku zêdetir ji xistina rûya zanyariyê li çemk û pênase û zaraveya romana siyasî û qonaxên romanê li Kurdistana Irakê û peywendiya edeb û siyaset û cûreyên romanê li xwe girtiye.

**Beşa dûyem:**

Eve jî ji Naneroka Romana Siyasî Li Kurdistana Irakê De u li 6 mijaran pêkhatiye Karesata enfal, karesata kîmyabaran kirina navçeyên kurdistanê, veguhastin (terhîl û

tehcîl û tesfîr), roêketin namey (11) adar a 1970, çiruska şorşa îlon sala 1975, karesata şerê îran û iraqê 1980, li xwe girtiye.

**Beşa sêyem:**

Li vê beşê da jî behsa peywendiya romana siyasî li gel huner û teknîkên romanê dike, wekî (Monolog – Diyalog– Montaj – Vegotin – Wesf – Rûdan – Dem – Cîh – Karakter – Ziman û hwd...). Her wiha ji bo anîna mînakan li romana siyasî de me sûd ji romanên (Bextiyar Elî – Xisro Caf û ... Rêwas Ehmed û Ferhad Pîrbal û hwd) wergirtiye.

Li dawiya lêkolîna me de gihîştîn çend encamek, bi awayeke rêzbendî elif û bê çavkaniyên li vê lêkolînê de bekarhatine me xistiye rû.

Karukh Dara MOHAMMED
WAN 2018

## SPAS Û PÊZANÎN JI BO

Xwedayê mezin ku derfeta xwendina masterê (lîsansa bilind) da min.

Dayik û bav û xwişik û birayên min ku her demên pêvajoya jîyanê da piştgirîya min kirin.

Zanîngeha (Yüzüncü Yil Üniversitesi) ku derfeta xwendina masterê da min.

Gelek birêz Doç. Dr. Kemal EROL ku erka şêwirmendîya min girte ser stûyê xwe.

Hemî ew mamostayên ku di xwendina fakultê û masterê de gelekî alîkarîya min kirin.

## KURTEBÊJ

| | | |
|---|---|---|
| Weş | : | Weşanxane |
| J | : | Hejmar |
| R | : | Rûpel |
| Wer | : | Wergêr |
| Htd | : | Heta Dawî |
| Dr | : | Doktor |
| M | : | Mamoste |

## 1. DESTPÊK

Li gorî gelek kesan zelale ku roman cûreyeke nu ye û zêdetir bi şêweya pexşanê ve tê nusîn, lewma dema ku nivîskarek romanekê dinivîse bi armanca nîşandana pirsgirêkên nav civakê bi şêweyeke nerasterast dike, ev jî dema ku xwendevanek romanê dixwîne hest bi ew buyer û alîyên ku di nav civaka xwe da heye dike.

Peywendîya di navbera wêje û sîyasetê peywendîyeke tund û xurt e ku dema romannus romanekê dinivîse çend bûyerên sîyasî û tirajîdî nişan dide ji bo nivîskar dibin rawestgeha destpêkirina nivîsandna berhemên wêjeyî wek roman, ji ber wê dema ku em bala xwe didin romana nîvîskarê em dibînîn gelek sedem hene ku bune sedema nivîsandina romanê wekî ew karasatên ku bi ser miletê me da hatiye.

# BEŞA YEKEM

## Nasandina Romana Sîyasî

### 1.1 Beş û Pênaseya Romana Sîyasî

Roman di serdema nû de di hewlekê deye û bi jîyana rastî ve girêdayîye. Hewil dide hurtirîn wêneya bêxe di nava naverokê de, nûjenî, êş û xwenan bike di nava Roman'ê de. Roman hewil dide evan hemûyê derbixe û hemû babetan pêşkêş bike.Dixwaze wêneyê bûyeran tevil jîyana rastî bike.

Nivîskar û Roman nivîsên kurd yên di serdema nû ya roja îro de bûne dîrok nivîsên rastîya bûyerên xelkê.Ev jî bi rêya xelkê hewil dide berjewendîya takekesî ne hêle û armamca civakê derbixe. Yan jî ev bi rexnegirtin û dijayetîya kesên hizir teng û berjewendî xwazên di nava romanê dene.

Beşekî gelek ji van kesayet û karekteran cîhanê pêktînîn. Wekî kesên maxdur û Şoreşger tê naskirin. Ji ber vê jî gelek ji wan kesan zilim lê hatîne kirin, di serdema nû û kevin de bergirîyê li mirovayetî û parêzgarîya kesan kirîne. Ewan ji êşên jîyanê û neçarîyê rizgar dikin.

Em dikarin bêjin : Ji berî hemû tiştekê alîyê sîyasî û ramyarî di nava hemû civakê de hatîye goherîn. Ji ber kû bi sinordarkirin û rêkxistinkirina karê dewletê ve girêdayîye. Ji ber vêyekê dibêje : "Romana Sîyasî girîngî dide nûjenkirina karûbarên sîyasî, di heman demê de jî bandorîya wê di jîyanê de eşkere dike" [1] . Ji ber vê jî ev bûye sedemê derketin û serhildana Romana Sîyasî.

Her wiha di pênaseyek din de dibêje "Romana Sîyasî û Zivirandin tê de behsa buyerên sîyasî û dîrokî hatîye kirin. Çi bi awayekî balkêş yan jî sembolîk be jî bandora wê li ser kirdarên sîyasî heye " [2] . Em dikarin vê jî destnîşan bikin ku, ne şertekû nivîskarê Romana Sîyasî alîgirê Hizbek yan jî alîyek sîyasî be. Yan jî xwedîyê îdeolojîyekî sîyasî û hizbî be. Belkû xwedîyê îdeolojîyek taybet a xwe be,armanca wî ewe kû wan tiştan bi gehîne xwendevan û wisan bike ku tiştên di nava romanê de hatîne nivîsandin bi xwendevan bide bawerkirin. Bi taybetî ew kesên kû bi asanî bawer nakin req û hişkin di dema xwendinê de hemû deman fikrên cîyawaz hene. Ji ber vê jî li gel xwendevan bi ser dikeve û wisan lê dike rastîyê sîyasî û ramyarî lê dide fêmkirin. Ev jî ji alîyê roman nivîs û nivîskar ve karekî giran û westandinek di xwaz. Ji ber ku dixwaze di destpêkê de hişyarîyê bi de heya dawî, di bûyer û sehatîyan de hizir û fikrên sîyasî pêşkêş bike û li gel armancên civakê û xelkê bi guncêt.

Em dikarin bêjin : Romana Sîyasî "Ne ew romane kubi romanên civakî tê navkirin. Xwedîyê eşkerekirina pirsgirêkên civakêye, ev kare jî di rîya buyer û kesan de çêdibe.

---

[1] Necme Ugstos, *Sederet Lîl Kîtab Elrîwayat Sîyasîye*, beyrut, 1974, Mektebe Ellucne, r 19.
[2] Hemdî Hisên, *Elrîwaye Elsîyasye Fî Elrîwaye Elwaq'îye*, Qahîre, 1994, Mektebe El Ula,r 177.

Bê goman eger em bi berfirehtir temaşe bikîn em dikarin bêjin; gelek ji Romanan , Dariştinan, Çîrokan karê wan eşkerekirina pirsgirêkên aloz yên civakî û sîyasîne. Ji ber ku hertim pêşbirka Conflict polîtik roman encamên ji navçûyî û çend faktorekin dibin sedema xwesteka xwendevan ji bo xwendina romanê zêdetir bibe û bi goman li benda buyeran dimîne" [3] .

Lê belê li gorî hinek kesên din pênaseya Romana Sîyasî ; hertim pêwîst dike bûyer û kesayet li derdura sîyasetû civakê bi zivire. Yan jî hinek caran tevlî bûyer û zivirandina dîrokê debe . Tevlî bûyer, dîrok, sîyaset, kesayetîyên sîyasî yên gel û neteweyên din ê cîhanê bibe.

Ji ber wê jî dibêjin "Romana sîyasî, hinek caran cih û dem ji bûyerên dîrokî werdigire. Lê belê ve jî herî zêde wextê romanê bi ser dibe. Xweza , civak û bûyerên bê alî bi hûrî li gel nivîskarbin bi şêweyekî berfireh eşkere bike. Ji bilî vê jî pêwîste bûyerên xwezayî, dîrokî û sîyasî romanê girîngîyekî serekî hebe" [4] .

Ji van Romanan di wêjeya Ewrupî de wekû Îvnaho Beî, Waltrskot bakurê rojavayê Kont Brtz di wêjeya kurdî de jî li ser vî corî heye û dikeve beşê romana sîyasî. Wekî ; Şarî Mosîqa Respîyekanî a Bextîyar Elî, romana Pêşmerge ya Rehmî Qazî, romana Enfal a Rizgar Hemedî, romana Sercem Berkekanî a Kemal Xesro Cafî, romana Pêncemîn Kitêbî Dunya Cemal Cebar Xerîb û çend pirtûkên din yên binav û dengên kurdî hene ku beşekin ji Romana sîyasîne .

Di romanên sîyasî de herî zêde dubarekirina wan takekesîne. Lê belê di qalibekî giştî û civakî dene. Em dikarin bi wateyek din bêjin ; Çîrokên civakî yên kevin nûjenekî giştîye ji bo jîyanê. Di demekê de dubarekirina çîrok û romanê cîyawaz yên serdema nû de valetîyekî berçave di nava kit û komîya cîhanê de. Ev jî tengbûna kesan dîyar dike di dema durketina civakê de.

---

[3] Cewad Mistefa, *Roman Çiye*? , Dihok, 2006, Çapxaneî Xane, r 46.
[4] Cewad Mistefa, *Roman Çiye*? , Dihok, 2006, Çapxaneî Xane, r9.

Nivîskarê binav û dengê Elmanî Cote Gote eşkerekirina dubarekirina nû dike ku wekî "Destanekî take kesî derdikeve, bi wê rêya ku dixwaze daxwaza wêneyê cîhanê dike " [5] .

Her di vê derbarê de Corg Lekaş wiha dibîne, pelewan li gel bunewerekî ruberuyê rastîya civakê dibe. Ev jî qet wateyek ya xwe nîne. Yaku li ser milê wî pelewanî ewe ku wê wateyê derbixe yan jî li pey bi gerê. Her çiqas ev pêketine jî dawîya wê bê sude.

Nivîskarê romana Sîyasî dikare fikrên xwe di rêya dubarekirina buyerên nû yên cîhanê de pêşkêş bike. Di rêya wênekişanê di çarçûveya dîrokekî bi fêl îdeolojîya sîyasî bi şêweyekî ne rasterast pêşkêş bike. Wekî ku em dibînin ew romanên ku di serdema çîya de sansora sîyasî nivîsandîne hilgirê beşa îdeolîya sîyasîne. Ji bo gelekî wekî gelê kurd jîyan û goherîna wan , nexweşî nehameta sîyasî, dagirkirini, rakirina wan ji navçeyên wan herî zêde xirapkirina gondan û nîşamên Enfalê şewitandina maşlên kurdan ji alîyê rejîma behs a Êraqê ve.

Sîyaset û bûyerên sîyasîyên îro yê di cîhanê de, bune sedemê babet, tezekî dîyar û berçav di wêje û wêjetîyê de û di nava civakên cuda yên cîhanê de, qet kesek di nava civaka Rojhilatîyan de sîyasetê nekin behsa xwestek û daxwazên xwe di dezgehan de nekin û fikrên xwe yên sîyasî neynin ziman.

Jîyana niha ya mirov û mirovatîyê bi corekê bi sîyaset û bûyerên sîyasî ve girêdayîye. Ji ne xweşîyan ne bê pare, Eger îro jî ew nexweşî nebe bê goman wê sibê bibe. Ji ber ku em di qonaxekî gelek dijwar û giran de dijîn. Ji ber vê jî nivîskar yan jî roman nivîs rastî westanekî zêde tê. Ji ber ku pêwîste bikare xwendevan bi gehîne qeneatê û bikêşe ser cîhana romanê û bûyerên di nav de. Nivîskarê Romanê naçe di nava bûyerên hunerî li gel xwendevan. Belku di rêya Îdeolojîyê dixwaze fikrê sîyasî û

---

[5] Mihemed Ezam, *Elbetel Eşkalî Fî Elrîwayet Elerebîye Elme'asire,* Dîmeşq, 1992, Mektebe El Ehalî r 107.

îdeolojîya xwe tevlî hunera romanê bike. Bi taybetî jî hinek nivîsên nivîskaran bi vî şêweyî dinivîsîn. Yan jî di rîya Rîyalîzmê û rexnegirtinê mijarên sîyasî eşkere dike. Bi wateyek din nivîskar û romannivîs eger di mijarên xwe de dijayetîya sîyasî û alîyên xirap yên desthilata sîyasî bike, wêdemê " Xwendevan kêm dibe û bi şêweyekê metirsî li ser gelek pirsgirêkan dibe yan jî rê li çapkirina wan têgirtin " [6] .

Zarevayê Romana Sîyasî hur hure û corekî taybete belav bûye. Hinek caran jî alîyên wê be balkêşe. Yan jî ji bo razîkirin û bawerîyê tê nivîsandin. Ji ber vê jî " Romana Sîyasî û civak jêre dibêje herî başe ev romanê bawerîyê yan jî propaxandayê bê ji navbirin. Ji ber ku ev corê romanan ji bo bergirî yanjî dijayetîya çînekî dîyar tê nivîsandin. Yan jî propaxandeyekî ji bo şêwazekî taybet a jîyanê û çandekî taybet dike " [7]

Ji ber vê jî em gelek caran dibînin ev romanane ji bo armanca sîyasî hatîne nivîsandin, heya demekî nivîskarê wê alîgirê alîyekî sîyasî dike. Bi hurî jî dinava romanê de hestpê têkirin û dîyare.

Ji ber vê jî jêre dibêjin romanê sîyasî û civakî "Ew romanên armanca wan eşkerekirina pirsgirêkên civakîne li ser wê xwastekê ne propaxandayê ji bo bawerîyekî taybet bikin " [8]

Ji ber wêjî romanên Rîyalîzmê her wekî dizanin hertim civakê dike navnîşana romana xwe. Meseleyên dijwar yên civakî di nava darîştina romanê de di guncînin. Bi her corekê be jî navenda serekî ya van romanan romana sîyasîye û pirsgirêkên civakî rubirubûnên mirovan jî li gel wane.

Pêwîste em vê jî li ber çavan bigirin romanên sîyasî coreke ji corên peywendîyên tond yên dîrokî yên heyîne. Ji ber ku cara dawîye buyerên sîyasî, babet û xwestekên sîyasî dibin demê derbazbûyî. Belgenameya vê jî dîroke ku romanên sîyasî gelek caran

---

[6] Elseyîd Elhusên, *Mefahîm 'Îlim Electîma'î Elsîyasî*, Qeter, 1986, Dar Qeterî Bin Elfecat, r 123.

[7] Dr. Teha Wadî, *Elrîwaye Elsîyasîye*, Lunecman, 1985, Elşerîke Elmisrîye Lîl Neşir, r,81.
[8] Dr. Teha Wadî, *Elrîwaye Elsîyasîye*, Lunecman, 1985, Elşerîke Elmisrîye Lîl Neşir, r,81.

dibin romanên dîrokî. Bi corekî rexnegirekî wekî "Giraham Hof, 1847- 1922 misoger dike Hemu romanek peywendîyekî zêde bi jîyana rastî a cîhanê re heye "[9]

Her wiha hinek ji rexnegirina romanê wekî "Mîratgerîya Şereî a Dîrokî "[10] .dibînin. Wekî dubarekiriinekî ji dîrokê ne veqetayî dibînin. Bi wê hunerê pesna wê dikin ku " Çîrokekî xeyalî xwezayekî dîrokî a kur heye "[11] .

Ev corê fikrê nivîskar û rexnegirên wêjeyê yêndi derbarê romanê de, di vî şêwazî de çavkanî girtîne. Bi şêweyekî giştî roman nivîs bingehek û rêgezek ji romanê û giştî bûyerên hunerî re danîye. Dema ku bûyer û rastîya cîhana ji derve dikirin hêvênê nivîsandina romanekê, hewil didan di rêjeyekî bilind de rastîya di nava romanê de bi parêzin. Ji ber ku nivîsîna romanê "Destpêka wê dizivire ser serdema Ronesansê û derketina civakê Borjovazîyê "[12] Di demekê de bû şerê di navbera Kilî se û desthilatdaran de gihiştî bû payeyekî bilind. Ji ber cengê şerekî li pey hev berdewam hêza desthilatdar li ber lewazîyê bû li beramberî wê çîna Borjova li ber derketin bi hêzbûnê da bû. Çînek bû bejdarî di berfirehkirina bajaran de dikir. "Her wiha belavbûna madeya Barotê, hebûna cengû şeran li Ewrupayê bû. Çekekî giran di destê çîna Borjova de bû li dijî dijmin û desthildarîyê rakirin. Cengekî dirêj û xwedî windahîyên pir mezin bû "[13] Ev jî bûye sedemê ji dayîkbûn û serhildana romana sîyasî. Ji ber ku ev bûyer bûne sedemê kavilbûna hemû cîhanê bi taybetî Ewrupayê. Piştre jî li rojhilata navîn û welatên bê hukmet û desthilatdarîya sîyasî belavbû. Kurd jÎ wekî her gelekî din ev corê romana sîyasî û bûyer li navçeyên wan jî serî hilda û çêbûn bi taybetî jÎ Başurê Êraqê. Ev buyerên ku wekû Enfal, Cînosayd, Zîndî kirina çal, Koçberkirin, Şerê İraq û İranê, roxandina Mîrnîşîna Kurdannakokîyên navxweyî yên di nava hizbên kurdî de . Corekî dîyar û berçav ya romanên sîyasî ku ketina ber rexneya wêjeyê û nivîskarên wêjeyê yek ji wan jî romanên sîyasî yên kurdî bûye.

---

[9] Dr. Mihemed Rîaz Wetar, *Tewzî' Eturas Fî Elrîwaye El'erebîye Elmu'asire*, Dîmeşq, 2002, Menşurat Entîma Wel Kîtab El'ereb,r,104.

[10] Tahîr Hecar, *Eledeb We Enwa' Eledebîye*, Dîmeşiq, 1985, Dar Eltelas,r 131.
[11] Tahîr Hecar, *Eledeb We Enwa' Eledebîye*, Dîmeşiq, 1985, Dar Eltelas,r, 138.
[12] Cemîl Hemdawî, *Medxel El Nezerîyet Elrîwaye*, Beyirut, 1989, Mucele Eleqlam Elseqafîye www.aklaam.net .
[13] Hena Ebud, *Mîn Tarîx Elrîwaye*, Dîmeşiq, 2002, Menşurat Etîhad Elkîtab El'ereb, r142.

### 1.2. Peywendîya Di Navbera Wêje û Sîyasetê de

Wêje û nivîskarên wêjeyê peywendîya wan bi jîyana mirov û mirovatîyê ve heye. Wêje bingeha wê fikir û hizrê mirove, di serdemên cîyawaz yê şaristanîyê de hebû. Qet wêjeyek yan jî berhemekî wêjeyî di valetîyekê de çênebûye. Belku hilgirê beşê corbi cor yên civakê, aborî, sîyasî, perwerdeyî, ayînî, rewşenbîrî, ramyarî û amojgarîyê ye. Ji ber wê jî çendî rêbazên rexneyî û wêjeyî serî hildane û çêbûne. Her yek ji wan hilgirê mayîn û delalîyekî taybetû dîyarin. Ji ber wê jî qet wêjeyek nîne ku wateyekî taybet û giştî nebe. Bi wateyek din çêbûna corên romanê, Helbest, Pexşan, hemû niviskarên wêjeyê xwedîyê vê rastîyêne. Şahidê reng,deng, şêwaz û nivîskarên cîyawazin . Wêje peywendî bi mirov û mirovatîyê ve heye. Eger mirov û mirovatî ne be wê demê sîyaset û beşên sîyasîyan, bûyer, serpêhatî, şer û nexweşî, ne rihetîyên jîyanê heyîna wan wê nebe. Ji ber wê jî nivîskarjî yek ji ferdên vê civakê ye. Ji ber wê jî ji nerihetî û nigeranîya sîyasî ne bê pare. Ev jî bese ji bo afirandina nivîsın, mijarekî wêjeyî û sîyasî û romanekî sîyasî .

Roman yek ji berhemên belave û bandor yên cîhana nûye. Bi corekê ji berhem û nivîskarên din zutir pêşketîye û heya diçe jî zêdetir pêşdikeve. Berevajî van fikran ku dibêjin ; TV, Sînema, zîyan daye van berheman û nivîskaran. Lê belê li gorî min gelek caran ev herdû bûne sedemê nasandin û pêşketina van berheman .

Sîyaset tevlî jîyan û berhemên mirovan bûye. Nikare bi asayî bêyî sîyasetê mijarekî binivîse. Ji ber ku ev beşe cihê metirsîyê ye. " Berê xwe dide komek babetan û desthilatîya îdeolojîya dîyarkirî yan desthilata tund asîyasî di cihê peywendîyê civakî û Tzrf î Tundrew yan jî serdemekî Dîkdatorî yan jî desthilatekî rêgeza mirovên din wekû Meymon . Ji bilî babetên din dikare babetên din jî dîyar bike "[14] .

Her wiha ev corê romanên sîyasî û fikrên sîyasî di çarçêweya bazneyekî metirsî de dixe ber destan. Her di virdejî dikarin ji ber rewşenbîrîya vî zarevayê endişeya niştîmanî bê behskirin. Bi taybetî dema sîma ya sîyasî veşartîbe.

---

[14] Kemal Elrîyaz, *Elensan Wel Xeyal Elsîyasî,* www.droob.com .

"Komkirina bûyerên sîyasî û mayîna berhemên sîyasî ev jî herî zêde xwe di nava babetên neteweyî û nîştîmanî perwerî de vedişêre. Ev jî di wî demî deye dema nivîskar hewil dide bûyerekî bi awayekî hunerî wêjeyî di mijarek yan çîrokekê de eşkerebike û berdest bike " [15] Ji bo ku ji paşveçûna rasterast dur bikeve. Da ku bi keve bin bandora hizrên sîyasî de. Mijarên sîyasî pêşketinek rasterast a hizrên nivîskarane.

Sîyaset û desthilatdarên hukmetê, ew kesên sîyaseta welat dikin û bi rêve dibin. Hinek caran dibin sedemê serhildan û çêbûna berhemên îstatîkên bilind û hunerî. Mînk ; Deshilata Rusî demekê daxwaza  Maksîm Gorgî  dike di vê derbarê sîyaseta nexweş de romanekê binivîsîne ku bandora wê li ser xelkê hebe. Ew jî Romana Dayî dinivîse Romanekî cîhanî bû û serkeftî bû. Tê de mijarên li ser sîyaset û bûyerên bi serhatîyên sîyasî nivîsandî bû. Her wiha  Mehmud Safî Elbarodî  di wêje û wêjeya erebî de mijarên wî hilgirê beşê babetên sîyasî û sîyasetin. Di wêje, helbest , pexşan û romanê kurdî de jî nivîskar û nivîsînên zêde me hene. Ji Mem û Zîn a  Ehmedê Xanî bigire heya digehe nivîsînên nivîskarê roja îro bi seden mijarên sîyasî di qalibekî wêjeya bilind ya kurdî de hatîne nivîsandin. Di wêjeya kurdî de cihê wan dîyar û berçave.

Eger em temaşeyî Romana  Beyrot, 1984  bikîn, emê bibînin ku ji alîyê nivîskarê sîyasî Senala Birahî  nivîsandîye. Em dibînin babetekî Ramyarî ceng a xelkê li Liblanê bi şêweyekî hunerî nivîsandîye. "Wekî her dubarekirinekî din, Lê belê dariştin ji bo nivîskarê Ereb dike di cenga  Xelkê  sala  1980  pişt bi belgeyên cor bi cor ve girê dide û pêşkeêş kirina pêşangehekî hunerî wêneyê derbazbuyîya Liblanê nîşan dide "[16]

"Îro sîyaset bûye yek ji mînakên herî serekî ji bo girîngî dayînê, hizr û hişê hemû xelkê dagir kirîye. Bi taybetî rewşenbîr ji bo pesna mirovên wê serdemê bikin, bi navê gîyandarekî sîyasî û demî pesnê romana sîyasî û wêjeya sîyasî dikin. Ji ber wê jî pêwîste em du navgiran destnîşan bikîn. Yek jiwan  Dîroke ya din jî  Rexnegirên wêjeyê  ne " [17]

---

[15] Rêzan Salîh Mewlud, *Endêşey Şî'rî Le Nêwan Rêbazî Kilasîk Û Romanêkî Kurdî Le Kirmancî Xiwaruda*, Koye, 2009, Nameî Master Kolêjî Ziman- Zankoî Koye, r 124.
[16] Sin'ella Ebrahîm, *Beyrut Beyrut*, Qahîre, 1998, Dar Elmusteqbel El'erebî ,r58.
[17] Hena Mîne, *Sewacs Fî Eltercumw Elrîwaye*, Beyrut, 1982, Dar Eladab, r 91.

Wêje karekî mirovatîye ji ber wê jî nabe têkilîya wê ji cîhana ji derve re bê birîn. Her çiqas hewlekî zêde daye rêbaz û rexnegirên nû dibistanên nû serî hildaye. Di xwestin wêjeyê ji cîhana ji dervere bibirin, tenê wekî berhemekÎ serbixwe û mijarekî zimanî kar li ser pêkhateya navîna mijarê bike .Lê belê ev nekarî bikin carek din zivirîn ji bo şîrovekirin û lêkdana cîhana ji derve. Peywendîya mijaran bi rewşa Aborî

Sîyasî, Rewşenbîrî, Ayînî, Dîrokî û Tureyê, hwkd. Her wekî ku çawe Karl Maks jêrî û serî ya aborîyê destnîşan dike, li gorî Marks alîyê hunerî û pêşdeçûna berhemên wêjeyî hûnerî a bilind pêwîstîya wê bi jêr erdîyekî bihêz heye. Aborî, Sîyaset, Civakî , Rewşenbîrî û Ayînî....hwd ev jî hemû bandor û pêşdeçûna wan li ser rewşa wêjeyî heye. Sîyaset û wêje ji yek diravîne nikarin ji hevdû cuda bikin. Bi taybetî ji bo wan netewane ku xwedîyê desthilatek serbixwe ya xwene.

Lê belê rexnegirên wêjeyî dibêjin : Mijarên wêjeyî û sîyasî ewe ku em pesna wêjeyê dikin. Em nivîsîna wan nûjen dikin li ser şêwaza hunerî. Pêwîste babetên sîyasî di qalibekî hunerî a bilind de bê nivîsandin. Eger em behsa sîyasetmedaran bikîn emê bibînin, cîyawazîyekî eşkere di navbera wan de heye Zansî Sîyaset- Felsefa Sîyasî- Sîyaset

### 1.2.1 Felsefe ya Sîyasî

Di bingehê de girîngîyê dide fikrên sîyasî, li gel bawerîkirina durîya dem û zeman lê belê serbaret

### 1.2.2 Zanîsta Sîyasetê

Ew girîngîyê dide rêxistinên sîyasî, bi armanca gehiştina mideya giştî, pişt bi çawenîya şahidan ve girê dide. Ev jî pişt bi Felsefeya Sîyasî ve girê dide û hizrên giştî yên wekî Maf, Azadî û Dadperwerî .

### 1.2.3 Zanîsta Sîyasî

Di gehiştina hukmet û nîzaman sîyasî de kar dike. Bi bikaranîna bıraşora zanistî. Her çiqas Sîyaset e ew mînaka hukmî bi rêvebirina sîyasî û çawe çêbûna rêbaza sîyasî û

cihkirina biryarê di rêya sîyasetê de. "Di vir de damezirandina sîyasî ji welateka heya weletekî din tê gohertin " [18] Her çi qasî zanayên Antropolojîyê fikrên wan cîyawazin lê belê li gel wê jî hemûyan bi ser sê xalan ve komdikin.

**A-** Nesqa Sîyasî Di civakê de bi giştî ji bo parêzgarîya nîzamêye.

**B-** Fikrên Herêmî Tê bi wê wateyê ku ew bingeha nesqî asîyasî bi herêmekî dîyar ve girêdayîye.

**C-** Di civakê de bi karanîna hêzê ji bo gehiştina armanca nîzamê. Wisan bi civakê dikin ku hevgirtîbin û di çarçuveyekî ajîyana xwede berfirehtir bin. Bi kurtî Nesqa Sîyasî; Wateya wê ewe ku di civakekeê de herkesek rolek ê sîyasî yê xwe hebe. Di çarçuveya bingeha sîyasî de kar li ser bikin.

Di civakê de sîyaset dest li hemû karan pêçaye. Bê goman ev jî dibe sedemê tevlîbûna mijarên wêjeyî li gel yên sîyasî û bûyerên sîyasî. Mînak : "Çêkirina cadeyan, çêkirina Firina Nan, yan jî dîyarkirina temen ji bo çûyîna dibistana.Yanjî çespandina rêbaza peywendÎyên, danîna kenalê TV, Radyo û vekirina Govaran û Rojnameyan, vekirina xanîyekî ji bo Sînemayên ev hemû bi hev ve girêdayîne wekî bazinekî hukimkirinê ne ji bo sîyasetmedaran"[19] . Bê goman sîyaset dibe sedemê acîzÎya ji hukmet û hukumkirina sîyasî. Bi vê re jî corên helbestan, pexşan çîrok, Romanên Sîyasî serî hildide.

Sîyaset di jîyanê de wateya wê ewe ku berpirsê xoliqandina rastîyê ye. Nivîskar dema ku bûyerekî sîyasî hildibijêre ji bo tegerkirina hizrê xwendevane. Nivîskar dixwaze wan bexe dibin bandora dubarekirina sinorê romanê. Tenê hejmarekê jê hildibijêre û behsa wê dike." Ji ber ku peywendîya nivîskar bi dîrokê ve gelek heye û li

[18] Dr. Teha Wadî, *Elrîwaye Elsîyasîye,* Lunecman, 1985, Elşerîke Elmisrîye Lîl Neşir, r 233.
[19] Dr. Teha Wadî, *Elrîwaye Elsîyasîye,* Lunecman, 1985, Elşerîke Elmisrîye Lîl Neşir, r358.

gel dîrok nivîs û bûyerê " [20] . Ji ber ku nivîskar pêwîste bûyerên dîrokî û sîyasî bi şêweyekî hunerî û îstaktîkî binivîse. Ne wekî ku wergirtine. Pêwîste em vê jî destnîşan bikin hinek caran şoreş û bûyerên şoreşê pêwîste bibin hêvênên mijarên sîyasî û hunerî bi taybetî jî romanên sîyasî. Hinek caran jî Bizotneweya Rizgarîya Azadîxwaz di nava gelan de dibe çavkanîyek bi sud û berçav ji bo romana sîyasî. Ji ber ku beşên şoreşê tefsîrê zêde hildigirin.

Xwedîyê alozîyekî zêdeye. Karl Poper li gorî wî " Peyva Şoreş, bi wateya goherînekî Aşitî xwaz tê. Tê wateya goherînekî tund û tujî . Li gorî wî Marksîzm her du wate bi vekirî hiştîye. Her wiha Poper vê jî destnîşan dike Goherîna tund û tujî encama wê dîkdatorîyê dişkêne"[21] .

Ezmî Beşare di pênaseya Şoreşê de dibêje: "Armanca Şoreşê pêktê ji livandinek ya gel a berfireh ji derveyî destora ku heyî. Yan jî ji derveyî rewatîyê armanca wê goherîna sîstema hukmdarî û dewletê ye. Bi vê wateyê re Şoreş pêktê ji livandina ji bo goherîna sîyaîye. Goherîna wê jî bi wêye ku sîstemekî nû bê çêkirin" [22] . Herwiha Bextîya Elî di vê derbarê de dibêje:" İnsan pêwîstîya wê bi wêye ku şoreşê li ser xwe bike û piştre jî hizra azadkirina yên din bike "[23] . Şoreş yaxîbûna alîyê baş yê însanaye bi ser alîyê din ê zordar de diçe. Li gel wê jî hemû şoreşêk coreke ji hişyarî dayîna beraberı sîstemê ye. Belku dîkdatorî be yan jî sîstemek be dijî civakê be. Ji ber wê jî mijar serîhildidin kes hişyar dibin û şoreş çêdibin. Bi vê re mijarên wêjeyî ji dayîk dibin û romanên sîyasî serî hildidn.

Şoreşên li vir û li wir ji ber sedemên dîyar û berçav serîdidin. Wêjeya dîyar dibe û nîskar jî di cîhanê de dîyar dibe. Mînak ; Şoreşa binav û deng ya Firansa dîyartirîn şoreşe. Di nava cîhanê de çerxekî mezin hebûye, bi taybetî jî wêje û romanên sîyasî.

---

[20] Necim Xalîd Necmedîn Elwenî, *Deq Awêzan Le Pêncemîn Ktêbî Cemal Cebar Xerîb*, Hewlêr, 2016, Çapxaney Hacî Haşim, r96.
[21] Aram Sidîq, *Berew Romanî Kurdî- Lêkolînewe*, Silêmanî, 2015, Çapxaney Yad, r 50-51.
[22] Aram Sidîq, *Berew Romanî Kurdî- Lêkolînewe*, Silêmanî, 2015, Çapxaney Yad, r 51.
[23] Ezmî Beşare, *Şoreş Nasî*, (Wergêr, Dr. Yasîn Serdeştî) , Hewlêr, 2016, Le Bilawkirewekanî Xaney Wergêran, r 158.

Gelê kurd neteweke herî zêde wan di dîroka xwe de bûyerên sîyasî tomar kirîye. Bûyerên wan jî bûyerên zilm û zordarî bi xwîn bûne. Ji ber ku heya niha jî berdewame û dubare dibe. Jibo nivîskarên kurd jî bûye sedemekî baş û çavkanîyek baş ji bo nivîsandina mijaran. Sîyaset buye rabuna hest û sozên nivîskarên kurd . Ji bo wan bûye hêvênê berhemên wan ev jî bûyerên dîrokî yên kevin û nûne. Helbestvan û nivîskar sudekî mezin ji wergirtina bûyer û bi serhatîyên sîyasî û dîrokî girtîne û dina berhemên xwe de bikar anîne " [24]

Ji ber wê jî hertim dibêje " Helbestvan û nivîskar dîrokê nûdikin ji bo jidayîk bûnekê. Fikrên dîrokî û dubarekirina bûyeran, bîranîna demê bûrî di wêneyê helbestên xwe de belav dikin " [25] .

Netewa kurd jî wekî netewên din xwedîyê berhemên bilindin.Her wiha nivîskarên dîyar û berçav yên di nava cîhana wêjeyê de bi taybetî romanên kurdî di nava wan de jî romanên sîyasî hene. Di dawîyê de em dikarin bêjin : Roman bi giştî û romanên sîyasî hest û hebûnekî dîyar ya wan heye. Em nikarin wan ji mijarênwêjeyî û sîyasî cuda bikin. Ji ber ku Henrî Cems dibêje : "Roman heyînekî zindîye weku her heyînek din peykerekî pêveye her çiqas ji temenê wê bi çe ew qas eşkere dibe . Di her beşek ya wê de nîşanek temam di beşên din de heye" [26]

### 1.3 Taybetmendîyên Romana Sîyasî

Wêje bi giştî berhemên romanî bi teybetî hilgirê civakî û beş û bingeha civakî, aborî,ayînî sîyasî , dildarî taybet bi xwe heye. Ji ber wê jî romana sîyasî xwedîyê beşek taybet a xweye. Kêm û zêde bejî ji corên din yê romanê tê cudakirin.Bi wateyek din romana sîyasî xwedîyê wate kurd û mifteya sîyasî û ramyarîye.

---

[24] Soran Mamend Ebdula, *Nostalojiya Le Şi'rî Hawçerxî Kurdîda Be Nimunekanî Ebdula Peşêw Enwer Qadir Mehmud Û Sebah Rencde*, Taran, 2016, Çapxaney Taran, r392.
[25] Soran Mamend Ebdula, *Nostalojiya Le Şi'rî Hawçerxî Kurdîda Be Nimunekanî Ebdula Peşêw Enwer Qadir Mehmud Û Sebah Rencde*, Taran, 2016, Çapxaney Taran, r392.
[26] 'Ebas Hemudî, *Tîorî Roman*, (Wergêr. Mihemed Kerîm), Silêmanî, 2003, Le Bilawkirdnewey Dezgaî Çap û Pexşî Serdem, r180.

Bûyerên sîyasî û pirsgirêkên sîyaseta welat û yên ku bi ser gelde tên dibin hêvên û bingehê serekî ji bo ji dayîkbûna berhemên mijaran, romanên sîyasî. Her welatek xwedîyê romanên sîyasî yên bi xwene. Ji ber ku bûyerên sîyasî ji xwezayekê heya xwezaya din cîyawaze. Hem di alîyê cih û dem de hem jî bûyerên bi bandor yên erênî ûnerênî û bûyerên sîyasî. Em dikarin bi corekî din bêjin; Ew romanên ku diçin dibin sîya romanên sîyasî de xwedîyê komek taybetmendîyane bi vêre ji corên din yên romana tên cudakirin. Ji ber wê jî emê hewil bidin li jêr çend taybetmendîyên romanên sîyasî û romanên sîyasî yên kurdî bidin dîyarkirin û eşkerekirin.

**1-** Romanên sîyasî higirê îdeolojîya sîyasî û heya demekê leşkerîye. Ev corê bûyeran herî zede xwe di nava bûyerên dîrokî yên kevîn û derbazbûyîde dibîne û çêdike. Lê belê ji bo ku zîyanê nede bingeha zivirandina romanê xwe ji romanekî sedan sed dîrokî di parêze. Eger em temaşeyî romanên Başurê Kurdistanê bikîn emê bibînin ku bingeha damezirandina vî corê romanê bûyerên sîyasî yên cor bi cor yên Kurdistanê û navçeyên bi serhatî de ne. Bi vê yekê re romanên nivîskarên kurdî bi eşkereyî nîjenkirina romanên piştî Raperîna 1991 anin ku hatîne nivîsandin.

**2-** Di alîyê Rêveçûna Zivirandinê De Yek ji taybetmendîyên din yê romanên sîyasîne kû tov yan jî rêgeza zivirandinê ye. Di vî corê romana sîyasî de Çîrokên xwe zivirandîne bi her sê rêveçûna bûyerên sîyasî de di dem û cihekî dÎyar de girtîye. Bi wateyek din roman nivîs bi şêwazê gêre werî ya hemû tişt zanî gêrewerîya heman tişt zanî û gêrewerîya kêm tişt zanî pesnê kes, cih, bûyerên dîyar yên dinava romanê de dike. Bi taybetî jî bûyerên sîyasî. Di gelek deman deman de ji bo bi destxistina zanyarîyên zêde roman nivîs berbi gêraneweya kêm tişt zan ve diçe. Di rêya name nivîsandinê û pirtûk nivîsandinê de belgeyên dîrokî zanyarîya eşkere dike. Bi vê re jî roman qalibekî sîyasî werdigire û diçe xaneya romana sîyasî.

**3-** Yekek dine ji taybetmendîyên romanên sîyasî ku pêktê ji cihê buyeran û dîyare dema behsa sîyaset û romanê sîyasî dike. Girînge em cihê wê destnîşan bikîn. Ji ber ku jîyana mirovan ji şirînî û tehlîyê tejîye. Sîyaset û hebûna sîyasetê jî pêwîste hebûnekî fîzîkî û locîkî hebe. Roman nivîs jî bikare dema nivîsandina romanê de bikar

bîne. Nav anîna rewşa sîyasî pêwîstî bi cihekê heye ku biserhatî bÛyer û bûyerên sîyasî tê de encam bidin. Tenê ev corê romanê ku romana sîyasîye em bêjin;Peyman û rêkeftinên sîyasî di nav xwe de digire, tenê cihê encamdana vê peyamê û rêketina pêwîste ji bo roman nivîs. Ji bo ku bingeha romana xwe li ser dayne û romana xwe binivîse. Roman ve gohstinekî rastîye di jîyana cîyawaz de. Lê belê pêwîste em vê jî jibîr nekin armanca ve gohestina rastî ew be roman nivîs rastîya ku heye ve gohezine ser rupelê. Nexê belku bi şêweyek din rastîyê werbigire. Cilekî hunerî li ber dike û nû dinivîse. Di heman demê de rexne û çareserîyan jî ji sedê pêncî li ser datîne.

**4-** Dema ku em dibêjin romana sîyasî , pêwîste em vê jibîr nekin.Romana sîyasî yek ji corên romanane û di nava hemû netewe û gelên cîhanê de hebûna xwe heye. Ji ber wê jî yek ji taybetmendîyên romana sîyasî di nava romanê de hebûna bûyerên sîyasîye. Eger romanek hilgirê beşê wateyê û delalîya sîyasî, bûyer, serpêhatîyên sîyasî , rêkftin, peyman û peyman name nebe ew nikare û nabe romanekî sîyasî. Ji ber ku dibêjin romanekî civakîye û hilgirê beşê .

Binyatekî serekî û girîngtirîn beş pêwîstîyekî daneberaw di corê romanên sîyasî de. Ew jî bûyerên di nava romanê deye. Em dikarin bi corek din bêjin bûyerên serekî yên romanê pêwîste bûyer û serpêhatî sîyasî bin. Çi yên bi ser gelde hatîne wekî nest û hestekî komin yan jî ev bûyer û serpêhatî bi ser kes û karekterên di nava romanê de hatîne.

**5-** Xalek din ji taybetmendîyên romana sîyasî pêktê ji zeman demê di nava romanê û nivîsandina romanê de. Ji ber ji bo romanê pêwîste em vê rastîyê ber çavan bigirîn. Dem, wext girîngîyekî taybet ya xwe heye. Eger em bi hurî bikevin dinava romana sîyasî de emê bibînin demê bûrî bi ser romanê de zale. Ji ber ku hertim wisa bûye bûyerek çêdibe yan jî pêşhatinekî sîyasî çêdibe wê demê behsa wê tê kirin û dibe babet û wê demê jî dibe demê borî. Bi wateyek dina dinava romanên sîyasî de dem pêwîste.Yan jî xelkên vê jîngeyê yan jî babetên sîyasî û bûyeran werdigire û di ke dinava romanê de. Bi şêweyekî hunerî carek dina bi bergek din eşkere dike. Bê goman roman nivîs jîyanê dinivîsîne . Ji ber wê jî nikare ji jîyanê veqete. Lê belê ne gengaze ku

ew jîyane wekî xwe bê nivîsandin. Belkû nivîskar di goşeyekê deFikrên xwe bi corekî din dinivîsîne û bişêweyekî din têxe ber destê xwendevan. Her wekî Birsî Lobok di pirtûka Pişeya Roman ê de dibêje : " Erkê roman nivîs berhemên jîyanê ye "[27] .

**6-** Romana sîyasî hilgirê beş û wateya sîyasî û fikrê sîyasîye. Bi taybetî di zivirandinekî hunerî û zivirandinekî din de, çîrokek din, hizir û fikrê sîyasî ramyarî hizir û fikrê serekîne. Ji ber wê jî rexnegirên Elm Actmae Aladb zanîsta civakî wêjeyî wisan dibîne,roman zivirandin hêzekî pêşkêş û sîyasî heye. Her çiqas zivirandin xizmeta kesan dike bi şêweyekî taybet.

## 1.4 Dîroka Romana Kurdî Di Kurdistana Irakê de

Li beramberî romanên gelên din yê cîhanê, romana kurdî ne xwedîyê dîrokekî dur û dirêje. Lê belê li gel vê jî nabe ku em bi kurtî û bi çend hevokan behsa dîroka romana kurdî bikîn. Bi şêweyekî bê bingeh û ne akademî li ser bêjin û bi kêmî bênirxî jî temaşeyî bikin.Ji pile û payeya vî corê wêjeyê kêm bikin. Romana kurdî cihê xwe girtîye û ketîye ser rêça xwe. Eger romana kurdî çav li romanên din yên cîhanê jî kirîbe ne gengaze di cihê buyeran û hizrê kesayetên kurd serhatîyên wande çavlêkirinek hebe.

Romana kurdî rastîya gelê kurde. Xwedîyê nasname û taybetmendîyên xweye . Her wiha bi van taybetmendîyên xwe nêzîkî sewdayekê dibe. Karîye pêşketinekî berçav di xwede bibîne. Heya demêkê karîye li gel pêlên nûjenîyê şaristanîya cîhana ji derve û li gel mil bi milê romanên gelên din biçe. ,

Lê belê nabe ku em di heman demê civaka kurd bi hemû alîyên jîyana wê ve bikin beramberî civaka şaristanî û hevçerx.Nabe em wêjeya xwe jî bînin beramberî ya wan. Jiber ku "Nabe em civakekî paşketî bînin beraberî civaka kurd ku romanên wan jî wekî romanên kurdî û şaristanî be "[28] . Di be ku civaka kurd di çavê civakên din de

---

[27] Bîrsî Lubuk, *Sin'et Elrîwaye*, (Tercume. Ebdulsitar Cewad), Beyrut, 1981, Dar Elreşîd Lîl Neşir, r 46.
[28] 'Eta Qeredaxî, *Geranewe Le Xeyalewe Bo Waqi'* , Silêmanî,2004, Dezgaî Çap û Pexşî Serdem, r185.

şaristaneyeta wê cudabe. Lê belê ev jî wê ranagihîne civaka kurd paşketî be qet berbi pêşve neçûbe.

Pêwîste em vê jî bizanibin nebûna dewlet û serxwebûnê dibe sedemê asta pêşketin, nebûna rewşenbîrî, zanist û fêmkirina mirov û kesên di nava civakê de. Her nivîskarek dikare pêşketinên di Netewe,Xak, Ziman û Çandê de bike. Ji ber ku " Her çîrokek,romanekî kurdî her berhemê wêje û nûnerê jîyan awazê neteweyîye " [29]

Eger corên din yên wêjeyê wekî çîrok roman û rêbaza rexnegirîyê, nivîskarên wêjeyê cuda cudabin ji gelên din, nivîskar û wêjevanên kurd sud ji alîyên din yên hunerî wergirtî be, wê demê cihê bûyerê, pelewan, hizir, rewşa hewayê û dem hêvênê bûyeran jî ji sing û deronîya civaka kurdewarîne. Gelek asayîye mijarek cara destpêkê pêşketinê di xwe û taybetmendîyên xwe de bike.

Nivîskarên wêjeyêbi şêweyekî giştî dinava wêje û wêjeya gelên din de di serdem û rojên cûda cuda de serî hildane . Ji ber wê jî pêşketina wêjeyekê ji ya wêjeya gelê din cudatire. Wêjeya kurdî jî nivîskarê romanê pişt bi pişt û di rojekî dur û dirêj de beramberî ya gelên din derketîye.Ji ber vê jî dibêjin "Ji ber wêye ku hewildidinromana kurdî binivîsîn û baş li ser bisekinin" [30] .Her çiqas girîngîyekî mezin ji bo pêşketina romana kurdî bê dayîn ew kas jî bihayê wê giran dibe û rêz lê tê girtin. Wêjeya kurdî jî wekî wêjeyên din yê cîhanê an go gelên din yên cîhanê ber bi pêlek ya pêşketinê ve çûye . "Di nava wêjeya Kurd de romanê girîngî û taybetmendîyek ya xwe heye . Bi taybetî jî ew romanên ku ji alîyên xwendevanên Kurd ve girîngîyek ya xwe heyî"[31] . Xwendevanên kurd jî girîngîyê bi romanên bi vî awayî dide. Kurd û gelê kurd jî wekî her gelek din yê di cîhanê de xwedîyê roman û roman nivîsên xwe ne. Di nava romanên kurdî de jî êş Û azar, jîyana rojane, ne xweşî, alozî wan hatîye nivîsandin.Destnîşan dike ku "Emkurd jî ji romanan ne bê parin, her çi qas roman ligorî me karekî wêjeya nûye wêranî û êrîşkirina rewşenbîrîye dijî bingeha rewşenvbîrîya meye roman nivîsên baş me

---

[29] Ezedîn Mustefa Resul,*Edebyatî Niwêy Kurdî Şi'rî Niwêy Kurdî* , Witar Berlîn, 1993, Le Werzî Kordolocî Da Le Zankoy Azad Le Berlîn Pêşkêş Kirawe.
[30] Teha Ehmed Resul, *Rexnegirtin Le Bextîyar Elî*, Silêmanî, 2005, Çapxaney, r11.
[31] Enwer Husên, *Romanek Le Giftugoda*, Silêmanî, 2006, Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r13.

hene . Di heman demê de di van salên dawî de karîne romanên kurdî gelek bi nav û deng bikin"[32] .

Her çiqas li vir û li wir jî hinek ji rexnegir û nivîskarên wêjeya kurdî ji bilî kurdan jî li gorî wan romanên kurdî hîna gelek jê re maye bi gehe asta romanên cîhanê. Ji bo vê rexneyê jî gelek bergên romanên kurdî kirîne cihê lêkolînê. Di demekê de bi vê bingehê û lêkolÎna romanê bi başî û xirabî li gel wan kar nayê kirin. Ji ber ku civaka mirovahîyê di pêşketin û pêşdeçûnê de ye. Dem ji bo xwendina vî corê xwendinên nîne zehmete mirov bikare di demekî wihada xwedî giranîyên jîyanê û tevgerekî leşkerîde romanê bi xwîne.

Romana kurdî heyîna wê nîne an jî di paşketinê deye . Berevajî wê romana kurdî hertim di pêşdeçûnê deye. Mînakên me jî gelekin;çi wekî roman çi wekî romana Bextîyar Elî, Şêrzad Hesen, Ebdula Serac, Ferhad Pîrbal, Karwan Heme Sor, Xesrew Caf, Cemal Cebar Xerîb .... Ev hemû çendîn mînakên din jî me hene.

Eger em temaşeyî nivîskarê roman û wêjeya kurdî bikîn, ew jî wekî wêjeya din a cîhanê yan jî gelên din ya cîhanê serîhildaye. Ji ber wêjî bi çend serdem û qonaxên cîyawaz re bûyer, sal, demû cihên cuda re derbaz bûye. Bi vê re jî qonaxekî serkeftî birîye û gehiştîye mil bimilê romanên din yên cîhanê.
Em li jêr hewilbidîn qonaxên romana kurdî bidîn dîyarkirin.

### 1.5 Qonaxên Romanên Kurdî

Dema ku nivîskarekî wêjeyî di demekî nu derdikev, rexnegir, lêkolînvanên wêjeyê di heman serdem û demde dikevin nava tevgerê ji bo lêkolînkirina li ser berhema wî. Ji ber wê jî nivîskarê romanê jî biçend şêwazên cuda li gorî rewş û xwezaya mijarê, bûyerên gel, rewşa sîyasî, aborî, civakî û ayînî tê dabeşkirin cuda dibe. Ev cudakirine jî di serdemkê de yan jî nivê serdemê an jî çarêka serdemê de dibe.

---

[32]Mehdî Salih, *Derbarey Roman*, Hewlêr,2006, Çapxaney Roşinbîrî, r32.

Ev dabeşkirin yan jî cudakirine ji bo gelê kurd guncaw û di cihê xwe deye. Ji ber ku wekî her gelek yê cîhanê ne xwedîyê dewlet û serxwebûnekî sîyasîye. Ji ber wê jî dabeşkirina bi ser van qonaxan de gelek pêwîste. Eger em temaşeyî navçeyên Başurê Kurdistanê bikin hertim bûyên sîyasî di nava navçeyên wan deheye. Di navçeyên wan de berdewam nexweşî, tengbûn bi ser gelê kurd de tê. Ev jî wisan dike qonaxên romanê bi vî awayî bên dabeşkirin. Ji ber wêjî rexnegirên romana kurdî romanê di wêjeya kurdî de bi ser sê beşan de cuda dikin. Wekî yên li jêr hatîne dîyarkirin.

1- Qonaxa ji dayîkbûn û hewldanên destpêkê 1927-1970

2- Qonaca damezirandin û pêşketinê 1985-1990

3- Pêşketin û nujenî 1991

Ev dabeşkirina li jor hatî dîyarkirin eger em temaşe bikînemê hest bikîn dema dinavbera salên 1971-1985 an de ne hatîye behskirin. Ev jî dibe kêmasîyek ya dabeşkirina wê. Lê belê li gelvê yekê jî dabeşkirinekî dîrokîye ji bo qonaxa romana kurdî. Di dabeşkirina romanan de me dabeşkirinek din heye. Ji alîyê nivîskarê romanan Karzan Mehsin Qadir di nameya macesterê ya binavê Sîmayên nû yên romana kurdî di navbera salên 1991- 2000 an de di Zanîngeha Selahedîn Kolêja Ziman de wekî li jêr dabeş kirîye.

1- Qonaxa Serhildan, Hêvîbûn, Nenasînê dinavbera sanlên 1925-1970 an de.

2- Qonaxa bîyanîbûn û kêmbûnê di navbera salên 1971-1981 de.

3- Qonaxa pêşketina çîya û Bajaran dinavbera salên 1982-1990 an de.

4- Qonaxa temamî gehiştin û nasandina romana kurdî bi cîhanêre dinavbera salên 1991 heya niha" [33]

Di dawîyê de em dikarin bêjin **:**

"1- Qonaxa yekem :( 1925-1970 ) qonaxa serhildan û hêvîbûnê û nenasandina berheman.

---

[33] Sabîr Reşîd, *Romanî Kurdî*, Hewlêr,2007, Dezgay Çapû Bilawkirdinewey Aras, r15.

2- Qonaxa duwem : ( 1971-1981 ) qonaxa bîyanî û kêmbûnê.

3- Qonaxa sêyem : ( 1982-1990 ) qonaxa çîya û Şaristanîyê.

4- Qonaxa çarem : ( 1991 heya niha ) qonaxa bi temamî gehiştinû nasandina romana kurdî bi cîhanê" [34]

### 1.5.1 Qonaxa Serhildan Hêvîbûn, Nenasandina Hevdû û Ji Hev Cudanekirina Berheman Bi Şêweyekî Zanistî 1925-1970

Ev qonaxe piştî şerê cîhanê ya yekem 11 salan heta 11 Adara 1970, yanî piştî nemana hukmeta Şêx Mehmud û hatina leşkerên İngilîz" [35] e.

Berhemên vê qonaxê heya demekê hêvîyên hevdû bûn. Ji ber ku di navhevdebûn bi asanî ji hevdû ne dihatin cudakirin. Gelek ji mijarên nivîskarên din yên wêjeyî karîne tevlî hevdû bikin. Ev jî bûye sedemê kû bibe şêweyekîne zanistî û ne akademî, ji alîyê beşek ji rexnegirên wêjeyê ve bûye sedemê cudakirina wan. Bi vî corî re jî xwendevan hinek mejîyê wan tevlîhev dibe. Ji ber wêjî biryardan di vê qonaxê de ne asane.

Ev fikrên cîyawaz dinavbera rexnegir û pisporên wêjeyê de heya niha jî berdewame . Mînak ; Eger em temaşeyî van berheman bikîn wekî belge berhemên wekî Le Xwemaî Cemîl Sayb 1935 û Meseleya Wijdanî ya Ehmedê Xal 1927 her nivîskarek û rexnegirek têxe dibin sîbera wêjeyê de. Ev jî bi fikrên xwe cîhan dîtîna xwe li gel wê bazarê dike. Ev jî wisan dike ku hinek kes bêje ; Ev çîrokin yan jî çîrokên dirêjin. Her çi qas hinek din ji van nivîskaran dibêjin romanên fêrkirinên û romanên temamin.

Di alîyek din de berhema Mihemed Elî Kurdî ku bi navê "Nazadrîya Kiça Kurd Le Ladê, 1936" [36] Ev berheme yekem car zarevayê romnaêli ser hatîye nivîsîn û di Govara Ronakî jimara 11,7 ,1936 an de hat belavkirin. "Ev berhem ji xeyrî di govara

---

[34] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn,r 9.
[35] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r9.
[36] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r10.

Ronak de hatî belavkirin, qet asawerê beşek din ne bû û ne bi zimanê kurdîye û ne dîyare"[37] . Her çiqas ev berhem û beşên din yê wê nemane heya niha jî ne dîyare.

Lê belê destpêkek baş bû ji bo romana kurdî herwiha Romana "Pêşmerge "[38] ya Rehîm Qazî di sala 1958 an de nivîsandîye di û di sala 1961 an de li Bexdayê belav kirîye. Ev mijare ji demekî dirêj gotobêj li ser hatin kirin yek ji romanên kurdîye. Lê belê ev berheme jî ne beder bû di nava goftogo û fikrên cîyawaz yên rexnegir û nivîskarên wêjeyî de. Bi taybetî jî ev hewildane dizivire. Nivîskarê vê romanê jî li Rojhelatê Kurdistanê yan Îran ê bû. Li gorî hinek kesan bandora wê li ser romanên başûrê Kurdistanê nîne. Ji ber ku Karekter, cih û demê di nava romanê de jî peywendîya wê bi romanên Başurê Kurdistanê ve nîne.Lê belê li gorî gelek ji nîvîskaran ev romane bandorek ya wê zêde hebû li ser nivîsînên Başurê Kurdistanê . Ji ber ku ev romane li Başurê Kurdistanê hatîye çapkirin û belavkirin. Bandorek zêde ya wê li ser nivîsînên Başur hebû.

Berhemek din di vî demî de belavbûye, ew jî "Aşitî Kurdistan " [39] nivîskar Mihemed Salih Seîd ku di sala 1970 an de çapkir û belav kir. Ji bîlî van berhemên ku me destnîşan kirîn berhemên din jî hene. Ji ber ku alozîyekî zêde di navbera wan de bû nivîskarên din yên wêjeyê bi temamî Çîrok û çîrokên dirêj nêzîkbûna wan zêdetire.

### 1.5.2 Qonaxa Bê Agahî û Kêmbûnê, 1971-1981

Di vê qonaxê de berhem heya demekî nebûn. Yan jî gelekî kêmbûn bi tîlîyan dihat hejmartin. Hinek jî li ber nivîsîn û çapkirinê man heya dawîya salên 80 û destpêka salên 90 an. Ji ber wê jî aev qonaxe wekî qonaxa kêm berheman tê zanîn. Her çiqasî peywendîya wê bi rewşa sîyasî a wê demê ve hebû jî bi taybetî piştî Şoreşa Eylulê.

---

[37] ÎbrahÎm Qadir Hemed, *Romanî Kurdî Le 'Êraqda*, Hewlêr, 1990, Namey Master, Kolêjî Adab Zankoy Selahedîn, r33.
[38] ÎbrahÎm Qadir Hemed, *Romanî Kurdî Le 'Êraqda*, Hewlêr, 1990, Namey Master, Kolêjî Adab Zankoy Selahedîn, r42.
[39] ÎbrahÎm Qadir Hemed, *Romanî Kurdî Le 'Êraqda*, Hewlêr, 1990, Namey Master, Kolêjî Adab Zankoy Selahedîn, r 44-45-46.

Her çi qas bejî postekî zêdetir ji qonaxa xwe ya pêştêr tê danîn. Qonaxa serhildana romana kurdî bû lê belê mixabin qonaxa 1971 -1981 an ji ber rewşa nevçeyê rêgir bû ji bo pêşketina romana kurdî . Bê goman ev jî ne bê sedem bû. Rexnegir û nivîskarên romanan çend sedemên sistî û kêmbûna vê qonxa wêjeyê bi giştî romanê dabeş dikin . Wekî ku li jêr hatî dîyarkirine.

**1-** Rewşa navçeyên Kurdistanê alozî û ne tenyayî bi taybetî piştî salên 1974.

**2-** Ji ber bê sozîya paşketina rejîma Behsê ya Êraqê di roja 11, Adarê ku di nava Kurd û Hukmeta İraqê de hatîbû wajokirin , xwen û hêvîya kurdan bin axkirin. Ji ber ku bû sedemê ji navbirina Şoreşa gelê Kurd.

**3-** Girîngî dayîna nivîskarên kurd ji bo nivîskarên bîyanî bi taybetî Çîrok-Helbest bi taybetî Helbestan xwe misoger kirîye.

**4**- Nivîskarê Çîrokê bi şêweyekî hunerî û zanistî dawîya salên 1970 an berbi pêşve çûye. Tondîya xwe di roxsîne. Ev jî bû sedemê ku nivîskarên kurd berê xwe bidin van nivîskaran û girîngî didan wan. Nivîskarên wekî" Hisên Arif, Kake Mem Botanî, Ebdula Serac, Ebdula Agrîn, Hisên Caf, Rauf Bêgerd, Mihemed Mokrî, Ahmed Mihemed, İsmaîl Elî, Faroq Hisên, Şêrzad Hisên, Heme Kerîm Arif, Xelîl Kake Weys, Cebar Cemal Xerîb, Slam Menmî, Salh Emeri Rauf Hesen, û Mihemed Reşîd Fatih" [40] . Ev û çendî din heya niha dinivîsîn û berhemên xwe belav dikin.

**5**- Yek ji sedemên din ê serekî nebûna Govarekî yan jî belavkirina wêjeyekê ku taybet be bi romanê. Ji ber ku roman pêwîstîya wê bi qalibekî berfirehtire . Lê belê ev ji bo nivîskaran ne bes bû bibe sedem û bandora pêşneketina romana kurdî.

**6**- Nebûna hewildan û tevgerê. Bi kêmî romanên cîhanî werdigeran din ser zimanê kurdî. Her çi qas çend berhemekê hebûna xwe hebû jî dîsan ne bes bû ji bo van nivîskaran. Ev jî bû sedemekî herî bi bandor ji bo pêşneketina romana kurdî.

Her çiqas ev qonaxe ji bor dîroka romana kurdî qonxekî baş û pêşketî jî be , lê belê nayê wê wateyê ku qet berhemek yan jî mijarek ya nivîskarên kurd di vî demî de ne hatibe nivîsandin. Di vî demî de şeş berhemên wêjeyî hatîye nivîsandin. Yek ji wan jî

---

[40] Sabîr Reşîd, *Çîrokî Kurdî*, Hewlêr, 2005, Çapxaney Roşinbîrî, r16.

mijarên serkeftî û baş alîyê romana kurdî debû. Ev jî di encam pêşbirka ku ji alîyê Yeketîya Nivîskarên Kurd ku di sala 1971 an de li ser berhemên Çîrok, Helbest, Pexşanû Gotarên Wêjeyî di heman demê de şeş romanên kurdî jî nivîsandî bûn ji bo pêşbirkê. 14 Temoza sala 1971 an de hat ragehandin ku xelata yekem da Romana Agirê Bin Kayê, Seîd Nakam û xelat da Romana "Rêga ya Mihemed Mewlud Mem" [41] Ji ber wêjî hebûna van romanan deskeftîyekî mezinbû ji bo romana kurdî. Bi vê re jî romana kurdî berbi astekî baş bir. Ji bilî berhemên di vê serdemê de berhemek din jî hat çapkirin û belavkirin. Em dikarin bêjin romanekî serkeftî ya vê qonaxê bû. Ew jî "Romana Jana Gel" [42]ya nivîskarê Kurd İbrahîm Ehmed bû. Di sala 1973 an de li çapxaneya Kake Felah çapkir û belavkir. Nivîskar û pisporên romana kurdî ev berhem û romane serkeftî didîtin.

### 1.5.3 Qonaxa Çîya û Bajar Pêşketinê 1982-1990

Di alîyê dîroka romana kurdî de ev qonaxe gelek girîng û pêwîste. Di vê qonaxê de romana kurdî pêşketinekî berçav û dîyar di xwe de dît. Ji bilî rexne û lêkolînan berhemên di alîyê romanê de pêşde çûn. Di nava civaka kurd û kesên kurd de pêşketinekî mezin bi xwere anî . Herwiha ev qonaxe qonaxên pêşîya xwe cuda dikirin û belav dikir, di heman demê de berhemên çîyan bû.

Beramberî nîvîskarên di nava bajêr de rolekî yê wan ê berçav hebû, berbi pêşde diçû. Yek ji van berhemên herî girîng yên di vê qonaxê de romana kurdî bû. Ji alîyê nivîskarê çîyayî ve hatîye belavkirin, ew jî romana "Segure a Mihemde Mukrî bû. Di sala 1982 an de çapkir û belav kir. Hem bi pirtûk hem jî bi nivîsîn di govar û rojnameyên çîyan de nivîsîn û rexneyên zêde li ser hatibû nivîsandin" [43] . Bi vî awayî di vê qonaxê de rexneyên romanê bi awayekî berfireh xebat li ser hat kirin û girîngîyekî zêde hat

[41] Sabîr Reşîd, *Çîrokî Kurdî*, Hewlêr, 2005, Çapxaney Roşinbîrî,r13.
[42] İbrahîm Ehmed, *Romanî Janî Gel Bilawkirdnewew Pêşekî Dr. Kemal Fwad*, Silêmanî, 1972, Çapxaney Kakey Felah, r3 .
[43] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r12.

dayînê. Ev jî ji ber sedemê bejdarîkirina govar û belvbûna nivîsînên çîyan rexneya romana kurdî wekî "Nuserî Kurdistan, Gzng, Bang, Alayî û Şoreş....hwd" [44]

Pêwîste em vê jî jibîr nekin, berhemên çîya û bajar cudahîya wan gelek bû di alîyê naverok û îdeılıjî û azadîyê de. Ji ber ku di vê qonaxê de di kurdistanê de du desthilat hebûn. Nivîskarên çîya dibin desthilara Bizotneweya Rizgarîya Azadîxwaza Kurdistanê de bû. Bi Azadî berhemên xwe derdixistin û fikrên xwe dinivîsîn. Lê belê nivîskarên Bajêr dibin desthilata rejîma behs ya Êraqê de bûn. Ji ber vê jî ne dikarîn bi awayekî azad berhem û nivîsînên xwe binivîsîn. ji ber ku dibinçavan de bûn . Ev jî bû sedemê ku ne belavbûn û pêşdeçûna romana kurdî. Bi taybetî jî nivîskarên çîyan de diman ji bo çap kirina berhemên xwe teknîkekî nû anîn di nava romana kurdî de. Ev bi bandorîya roman nivîsên welatê cîran yên wekî Îran, Turkîye, Surya û Êraw. Roman nivîs bi wergerê wan berhem jî derdixist.

Qonaxa Bajar û Çîya pêşketinê di sala 1982-1990 an de ji alîyê gelek rexnegir û nivîskaran ve ev qonax wekî wonaxekî pozîtîf û serkeftî ya romana kurdî didîtin. "Nivê duwem yên sala 80 yan jialîyê me ve romana kurdî pêşketinek mezin dihat dîtin" [45]

Dikarîn vê qonaxa salên heştîyan wekî xeta zêrîn ya romana kurdî bê danîn. Nivîskar yan jî roman nivîsên kurdî van xeletîyên giran û berhemên serkeftî ji bo ku binivîsin "Romana kurdî jî serdema xwe ya zêrîn destpêkir" [46] , her wiha Dr Adil Germîyan dîyar dike ku girîngîya vê serdema romana kurdî em dikarin wekî serdema zêrîn bidin nasandin. Berhemên romana kurdî 9 yên wî serdemî ketina di navbera salên 1982-1990 an de. Wekî alîyê Rîyalîzmê ev berhemên romanê eşkerekirîne. Li gorî lêkolînan "Di navîna salên Heşîyan de li gorî lêkolînên rexnegir û nivîskarên romanî kurdî de, em dikarin bêjin; romana kurdî destpêkir " [47] Pêwîste em vê rastîyê jî ber çavan bigirin qonaxa bajar û çîya ku di sala 1982-1990 an de qonaxekî nazik û hestyar

[44] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r13.
[45] ÎbrahÎm Qadir Hemed, *Romanî Kurdî Le 'Êraqda*, Hewlêr, 1990, Namey Master, Kolêjî Adab Zankoy Selahedîn, r20.
[46] Sabîr Reşîd, *Çîrokî Kurdî*, Hewlêr, 2005, Çapxaney Roşinbîrî, r8.
[47] Sabîr Reşîd, *Çîrokî Kurdî*, Hewlêr, 2005, Çapxaney Roşinbîrî, r5.

bû. Ji ber ku di vê qonaxê de bandora sansorê desthilatdaran li ser nivîskarên wî demî hebûn.Ne dikarin bi awayekî azad berhemên xwe belav bikin. Bi taybetî jî di alîyê pêşketinê de ne dikarîn bandorê li ser başî û xirabîya roman bikin.

Bê gûman "Ev jî di zivire ser rewşa sîyasî ya wî demî, qebûlnekirina fikrê beramber û retkirina wan ji alîyê desthilata rejîma behs ya Êraqê, li gel hemû alîyên jîyana wan. Behrehemên nivîskaran jî dîyarkirîbîn û sinordar bûn...." [48] .Ji bilî wê jî lêkolînên berhemên wêjeyî bi taybetî jî berhemên bajêr ketibû nava raperîna mezin a Kurdistana Başur, sala 1991 bû di heman demê de Govara Akademîk li Bexdayê derket. Wekî Kolêja Perwerdê a Îbin Ruşod, Bexda . Qala van berheman ne dikir û bi bîr ne dixist ku berhemên bajar û çîyan bû. Ev jî jêr destê Hukmeta Herêmê a Kurdistanê de bû. Dr Adil Germîyanî bi xwe di lêkolîna xwe de dibêje ;"Sinorê çarçûveya lêkolînê ev berhem bûn, roman jî di nav xwe de ne digirt û bi kêmî li Kurdistana Başur derdiket" [49] Rewşa sansorkirin û rewşa Sîyasî, yan jî nebûna Azadîyê bûne sedemê ku derneketina nivîskarên romana kurdî bi taybetî jî wêjeya kurdî giştî. Lê belê bi rexmê hemû astengîyan jî nivîskarên kurd berdewambûn li ser nivîsînên xwe. Lêkolînvan û nivîskarên kurd yên wekî Dr, İbrahîm Qadir, Dr Adıl Mecîd Mihemed Germîyanî , qonaxa nîvê duwem ya Sala Heştîyan wekî serdema Pêşketina Romana Kurdî danîn . Ev wexte weke Serdema Zêrîn a Romana Kurdî dan nasandin.

Ji ber vê jî em dikarin bêjin ; Ev qonaxe qonaxekî pir girîng bû, ji bo romana kurdî bi giştî.

Di alîyek din de em dikarin vê jî destnîşan bikin, her du lêkolînvan jî ne dikarîn ji ber sedeman bi başî behsa romanên çîyan bikin û wan eşkere bikin. Ev jî dibe sedemê ku bi kêm bimîne. Lê belê "Dr Karzan Muhsin Qadir, di nameya xwe a bi navnîşana Sîma Tazekanî Romanî Kurdî di navebra salên 1991- 2000 an de" [50] Bi awayekî gelek zelal ev qonaxane dîyar kirîye, berhemên bajar û çîya , nivîskarên romanan jî destnîşan kirîye Her wiha nivîskar behsa semîner û Konferansên li ser romana kurdî di. 27-29 ê Gulana

---

[48] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn,r19.

[49] Adil Germîyanî, *Rîyalîzîm Le Romanî Kurdî Hawçerx Le 'Êraqda*, Bexda, 1996, r8 .

[50] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r20.

2006 dike. Li ser romana kurdî semîner bi navê Romana Kurdî di Çîyade ji alîyê nivîskar Sabir Reşîd pêşkêşkir. Sabîr Reşîd, di vê lêkolînê de bi şêweyekî ber çav bal xistîye ser romana çîya, girîngîya wê jî ya bajar eşkere dike. Li gorî nivîskar "Romana Kurdî çi li bajar be çi jî liçîyawa be her du jî hev temamkerên hevin, ji yek laşî pêktên"[51] .

Di vî demî de çend roman û kurte roman li bajar û çîya hatîne nivîsandin û çapkirin. Wekî ku me li jêr bi awayekî berfireh daye eşkerekirin ku, romanên di navbera salên 1982- 1990 de ne.

1- Segwer, Mihemed Mokrî , 1982 neh berg Romana Kurdî li çîya.

2- Heres, bergê yekem, Mihemed Mukrî,Bergelo,1985, Romana Çîya.

3- Tole, Mihemed Mukrî, Sergelo, 1985, romana çîya.

4- Kwêxa Sêwê, Ezîz Mela Reş, Hewlêr,1986, Romana Bajêr.

5- Şar, Husên Arif,Bexda, 1986, romana bajêr.

6- Heres, bergî duwem, Mihemed Mukrî, Yexsemer,1988, romana çîya.

7- Twanewe, Ebdula Xefor Salih, 1988, romana bajêr.

8- Kangaî Bela, Hesam Berzencî, Bexda,1988,romana bajêr.

9- Kodere, Xesrew Caf, Bexda,1989, romana bajêr.

10- Helkişan Berelotke, Bexda, 1989, romana bajêr.

11- Buhjin,Fane Akreyî, Hewlêr, 1989romana bajêr.

12- Gorg û Bizin, Ezîz Mela Reş, Hewlêr,1989,romana bajêr , Ji bo zarokan nivîsandîye.

13- Persengî Dildarî, Îsmaîl Resul, Bexda,1989 romana bajêr.

Di vê qonaxê de wekî berhemên romanê 13 berhem hatin çapkirin û belavkirin. Berhemên din jî hebûn hatîbûn çapkirin lê nehatîbûn belavkirin,yan jî bi destê me de neketîbû. Ji bîlî van romanan hinek berhemên din ê romanê di vê qonaxê de serî hilda ew jî Novil yanî kurte roman . "Ew jî wekî yên me li jêr dayîn dîyarkirine.

1- Zelîl, çîrokê dirêj Hesamedîn Berzincî, Bexda, bajêr.

---

[51] Sabîr Reşîd, *Romanî Kurdî Le Şaxda*, Hewlêr, 2006, Çapxaney Minare, r84.

2- Panze Xwin , Dastanî Kurdewarî, Mihemed Mewlud Mem, Bexda, 1987, bajar.

3- Nameyekî Çepel, Kurte Roman, Karwan Ebdula, 1987, yekemîn romana bi nav û deng a
çîyaye.

4- Malawa Gulî Xem, Kurte Roman, Hîdad Husên, Bexda,1988 , yekemîn berhema romane di nav bajêr de nav anîye.

5- Koçî Sor, Kurte Roman, Heme Kerîm Arif, 1988.

6- Kêwî Mezin, Kurte Roman, Karwan Ebdulah, Komelî Nuseranî Kurdistan, 1989" [52]

Ev qonaxe, qonaxa derketin û pêşketina kurte romanênkurdî bû. Di alîyê huner û naverokê de bi temamî berbi pêşve çûye. Ji bilî van berhemên romanî kurdî, pêwîste em vê jî eşkere bikîn romanên cîhanê yên bi nav û deng ku bi zimanên cîyawaz hatîne nivîsandin di vê qonaxê de yanî sala 1990-1998 an de wergerane ser zimanê kurdî. Di Govar û Rojanameyan de hatine çapkirin û belavkirin. Hejmara van romanan jî nêzî 16 berhemên cîhanî bûn. Bê gûman ev jî sedemekî gelek girîng bû ji bo vekirina derîyê romana kurdî.

### 1.5.4 Qonaxa Nasandina Romana Kurdî Bi Cîhanê Di Sala 1991 Heya Niha

Ev qonaxe herî zêde bi rewşa sîyasî û bandora wê serdemê ya Kurdistana Başur ve girêdayîye. Bi taybetî jî piştî raperîna mezin a di Bihara sala 1991 an de ya gelê kurd li dijî rejîma behsê ye. Mercên sîyasî û dîplomasî û xwe rêvebirina gel jî di wî demî de pêşket. Gohertin di hemû Kurdistana Başur de hat kirin . Mînak : Rewşa sîyasî, aborî, rewşenbîrî û civakî....hwkd. Bê goman bandorek mezin ya van jî hebû li ser pêşdeçûna jîyanê û bi taybetî jî wêje, huner û hemû alîyê nivîsînê de. Mînak : Wekî, Helbest, Pexşan, Çîrok, Hunera Muzîkê, Gotarên Wêjeyî, Jîyanname,Kurte Roman û Roman....hwd. Wêjeya kurdî û civaka kurdî di alîyê cîhana ji derve û welatan de

---

[52] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r21-22.

pêşketinek çêkir. Bi taybetî jî nivîskarê romanê, Nûbûna romanên kurdî di vê qonaxê de em dikarin bi çend bendan û taybetmendîyan dîyar bikin.

**1**- Damezirandina desthilata sîyasî a kurdî hebûna Kurdistana Ferdaral ya Êraqê, hebûna hukmeta kurdî û Parlemana kurdî. Buna xwedî zagonên xwe. Ev jî berbi pêşveçûna navçeyê û goherîna bajaran, bi taybetî jî nivîsîna romanan û azadîya fikir û hizrê nivîskaran derket holê. Her wiha berhemên çîya û bajaran bû hêvî ji hevre û bûn yek beş.

**2**- Bûyer, pirsgirêkû serpêhatîyên gelê kurd yên wekî, Cînosayd Enfal , goherîna Demogurafîya xaka kurdan, şewitandina 4500 gundên Kurdistanê,Kîmyakirina Helebçe, Newala Xoşnava, Balîsan û Şêx Wesna....hwkd. Buyerên bî vî awayî û çend bûyerên din piştî raperînên bandora wan li ser nivîsîna romana kurdî çêbûye. Pêwîste em vê jî li ber çavan bigirîn wêje û sîyaset di nava sîyasetê de jî bûyerên sîyasîya her gelekî hevênê komek berhem, huner , civak û wêjeyê ye. Bûyerên sîyasî û sîyaset qet nikare ji wêjeyê qût bibe.

**3**- Ziman wekî dîyardeyekî zindî û berçav di nava hemû wêjeyê de û hemû hemû civakan de dibe faktorê serekî ji bo bingeha pêşdeçûna berhemên wêjeyê. Lê belê ji bo berhemên romanê ziman pêwîstîyekî ne veqetandinê ye, ji ber vê jî di vê qonaxê de zimanê kurdî gelek berbi pêşve çû. Di vê qonaxê de di zimanê kurdî de êdî peyvên bi zimanê Erebî, Turkî, Farisî û İngîlîzî radibûn. Ji ber ku pêşîya sala 1991 zimanê xwendinê û damû dezgayên hukmeta Êraqê bi zimanê erebî bûn. Piştî raperînê nivîskar û xemxwarên kurd destbi paqijkirina ji zimanê kurdî kirin . Ev jî sedemek din yên pêşketina berhemên romana kurdî bû .

**4**- Pêşketina dezgehên çapkirin û belavkirinê yên wekî Govar û Rojnaman bi zimanê kurdî. Di demê pêşde ji ber nebûna çap û dezgehên belavkirin,bibû sedemekî girîng ji bo pêşneketina berhemên romana kurdî. Lê belê piştî sala 1991 ev pirsgirêk hat çareserkirin dezgehên çap û belavkirinê gelek vebûn, Mînak ; Dezgeha Aras, Gelawêj, Serem, Wergêran û Nima....hwkd.Ev jî sedemek yê çendîn berhemên hunerî, wêjeyî, helbestî , çîrok û roman bên çapkirin û belavkirin.

**5**- Hatin û çûyîna nivîskar û wêjevanên kurd ji Kurdistanê ji bo welatên Cîhanê bi tayber Ewrupa. Bi vê re jî gelek ji nîskarên Kurd karîn ezmûnên nû yên pêşketî ji

welatên pêşketî werbigirin, bikin di nava wêjeya kurdî de. Mayîna nivîskarên kurd ji derveyî welat, li wir hesreta welat û xorbetî kişandina wan jî bû sedemê pêşketina roman, çîrok, kurte roman û wêjeya nû ya kurdî. Ji wan re jî di gotin; nivîskarên Trawge.

**6-** Bizava Rojnamegerîyê jî piştî raperînê gelek pêşketin di xwe de dît. Bi sedan rojname Govar, Rova, Nameyên rojane heftane û mehane di vê qonaxê de belav dikirin. Behsa reng û dengê, nivîskarên cuda cuda yên kurd dikir. Beşek ji Govaran rupelek yan jî kuncikek ya xwe ji bo nivîskarên Romanê, Çîrokê, Kurte Romanê ve qetandîbûn û belav dikirin. Ev jî bû sedemê pêşketin û bi cîhan nasandina romana kurdî.

**7-** Awirek û zivirandinek li ser babetên Folklora Neteweyî wekî, Çîroka BerAgirdan, Efsane û Destanên din yên kurdî. Folklora kurdî ji alîyê nivîskar û wêjevanan vê sedemekî serekî bû ji bo nivîsandin romana kurdî. Bi taybetî jî romana kurdî pêşketin di xwe de dît, ji qalibekî girtî derket. Nivîskarên Romanê yên wekî, Ezîz Mela Reş, Kake Mem Botanî, Mihemed Mokrî, Cebar Cemal Xerîb, Xosrew Caf û Bextîyar Elî....hwkd rolekî dîyar yên wan hebû.

**8-** Pêşketina wergerê ji bo wergeran sedan pirtûkan di qonaxa piştîraperînê de çêbû. Ji ber ku di vê qonaxê de helbestavn, nivîskarên çîrokê û roman nivîsên kurdî bi wegeranê ve mijol dibû hunera wergerê pêşxistin û berhem jî belavkirin.

**9-** Çêbûna semîne, Festîfal, Konferans, Werzên Wêjeyê , Rewşenbîrî û pêşbirkên wêjeyê di nava nivîskar wêjeyê de sedemek din yê pêşketin û cîhan nasandina romana kurdî bû. Bi taybetî bangeşekirina nibîsîna Çîrokan nivîsîna Romanan rexnegirên Wêjeyê ji bo Kurdistanê , bi taybetî jî di Festîfala Govara Gelawêj de bi sedemekî bi bandor û ezmonekî nu ji bo nivîskarên Çîrok, Roman û nivîsandinêndin yên kurdî û Kurdistanî." [53]

Di vî demî de gelek roman û kurte roman hatîne nivîsandin çapkirin û belavkirin. Ji ber vê jî em girîng dibînin navê nivîskarên van roman yên di qonaxa 1991-2000 an de eşkere bikîn.

**Romanên Sala 1991**

**1-** *Xeware*, Ezîz MelaReş,Çapxaneya Alhwadt, Bexda.

---

[53] Karzan Muhsîn Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan salanî 1991-2000*, Hewlêr 2009, Namey Macester Zankoy Selahedîn, r24-26.

2- *Hîç*, Xesrew Caf, Alhwadt, Bexda.

3- *Bore*, Ezîz Mela Reş, Roman bu Mindalan , Çapxaneya Alzeman, Bexda.

**Romanên Sala 1992**

Ya ku em dibînin di vê salê de qet romanek ber çavê me neketîye. Lêbelêhinek ji lêkolînvana eşkere dikin ku berhema Çawerwanî  a Aram Kake Feleh di vê salê de bû. Ev sal bi giştî ji bo romana kurdî salek vale bû.

**Romanên Sala 1993**

**1-** *Paşayan Koşt*, Xesrew Caf, Çapxaneya, Dar Alrsale, Bexda

2- Lê Qewma, Ezîzî Mela Reş, Bi awayê xelek di govara Karwan de belav kir.

3- *Rewname*, Ebulah Serac, bi awayê xelek di govara Karwan de belav kir.

**Romanên Sala 1994**

**1-** *Raz*, Xosrew Caf, Alhrye, Bexda.

**2-** *Rêga*, Mihemed Mewlud Mela, Ev berheme di sala 1971 an de dipêşbirka Yeketîya Nivîskarên Kurd de xelata duwemîn bi destxist. Lê belê di sala 1994 an de li Siwêde çapkir. Piştre jî di sala 2001 an de ji alîyê Çapxaneya Aras ve cara duwem hat çapkirin.

**3-** *Rawe Piling*, Mewlud İbrahîm Hesen, wekî xelat di Govara Karwan de belav kir.

**Romanên Sala 1995**

**1-** *Gemal*, Xosrew Caf, Dar Alhrye Bexda.

**2-** *Dîwexan*, Ebdula Serac

**Romanên Sala 1996**

1- *Wilatî Tarmayî*, Selah Emer, Le Bilawkirdnewey Rojnamey Alay Azadî,Hewlêr.

2- *Awêne Serabîyekan*, Hîwa Qadir, Dezgay Ktêbî Erzan, Silêmanî.

**Romanên Sala 1997**

**1-** *Dirz*, Kake Mem Botanî, Çapxaney Wezaretî Rewşenbîran, Hewlêr.

**2-** *Enfal*, Mihemed Reşîd Fetah, Çapxaneya Zamwa, Silêmanî.

**3-** *Kilaw Şîn*, Ebdulah Serac, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîran, Hewlêr.

**4-** *Tarîkstanî Lm*, Selah Emer, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîran, Hewlêr.

**5-** *Mergî Taqaney Duwem*, Bextîyar Elî, Nêwendî Rewend Bu Lêkolînewey Kurdî, Siwêd.

**6-** *Muzîkay Mergî Nawexte*, Selah Celal, Bê naw û şiwênli ser erkê nivîskarekî hat çapkirin.

**7-** *Zîndanî Gever*, Selam Ebdule, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîran, Hewlêr.

**8-** *Seîd Zebûkî Lay Xoman*, Kemal Seîd, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîran, Hewlêr.

**Romanên Sala 1998**

**1-** *Xak û Çewsanewe*, Bergî Yekem, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîran, Hewlêr.

**2-** *Ejdîha*, Mihemed Mukrî, Çapxaneya Zamwa, Silêmanî.

**3-** *Êwarey Perwane*, Bextîyar Elî, Nêwendî Rehendî BoLêkolîneweî Kurdî, Siwêd.

**4-** *Zimnako*, Selam Menmî, Çapxaneî Şivan, Silêmanî.

**Romanên Sala 1999**

**1-** *Çinarî Şîr*,Cebar Cemal Xerîb, Bineky Edebî û Ronakî Bîrî Gelawêj, Silêmanî.

**2-** *Koçî Sor*, HemeKerîm Arîf, Çapxaney Ron, Silêmanî.

**3-** *Hêlane*, Hesin Arif, Çapxaney Ron, Silêmanî.

4- *Xak û KêşeyMan*, Bergî Duwemî Xak û Çewsanewe, Ezîzî Mela Reş, Dezgay Çap û Bilawkirine Aras, Hewlêr.

**5-** *Agirî Binka*, Seîd Nakam, Çapxaney Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr. Ev berheme di sala 1971 an de di pêşbirka Yeketîya Nivîskarên Kurd de pileya yekem bi destxist. Di sala 1999 an de yekemîn car çapkir.

**6-** *Tawanbar*, Ebdulrehman Şîwen, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr.

**7-** *Kornî Xwên*, Xafor Salih Ebdule, Çapxaneya Jîn Silêmanî.

**Romanên Sala 2000**

**1-** *Şêx Damos*, Cebar Cemal Xerîb,Bilawkirina Rojnamey Mîdya, Hewlêr. Di vê salê de tenê ev roman ketîye ber çavê me û çi romanên din ne ketîye destê me. Belku di vê salê de hinek din romanên din hebin çi di Kurdistanê de çi jî ji derveyî welat be.

Di vê qonaxê de yan jî di navbera salên 1991-2000 an de gelek roman derketine, gelek pêşketinên berçav di xwe de dîtîne. Kurte roman û romanên di vê qonaxê de bûne çerxa wêjeya kurdî. Nivîskarên romanê û yên kurte romanê di nava pirtûkxaneya hejar a kurdî de romanên xwe dewlemend kirin. Di navbera salên 1991-2000 an de nêzîkî 20-30 kurte roman belavkirin. Gelek ji wan Novilan yanî kurte romanan yan jî roman di Govaran de belavkirin . Em dikarin wan Novilan li jêr bidîn dîyarkirin.

1- *Wêne Yektir Birekan*, Hesam Berzincî, Komele Nuseranî Kurdistan,1992.

2- *Tarîkî Xor*, Heme Elî û Haşim Serac, Govarî Karwan, Jimare 45,1993.

3- *Pîy Kêwan*, Mewlud İbrahîm Hesen, Govarî Karwan, Jimare 10, 1994.

4- *Vîlekey Nadir Şa*, Mihsin Ahmed Emer, Parîs,1995 .

5- *Hesar, û Segekanî Bawkim*, Şêrzad Hesen, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr,1996 .

6- *Sontay Roh*, Ebdula Serac, Hewlêr, 1997 .

7- *Jinanî Aw*, Cebar Cemal Xerîb, Govarî Roman, Jimare, 1997.

8- *Beydax*, Hemekerîm Arîf, Govarî Roman, Jimare,14, 1997.

9- *Kolwêy Peng*, Mihemed Salih Seîd, Govarî Roman, Jimare 14, 1997.

10- *Yaqutî Elwen*, Cebar Cemal Xerîb, Govarî Roman, Jimare 25, 1998 .

11- *Gemey Wirde Masî*, Selah Emer, Govarî Roman, Jimare,21, 1998.

12- *Kirmanc*, Ezîz Mela Reş,Le Bilawkirdnewey Rojnamey Mîdya.

13- *Mizgînî*, Mihemed Remezanî, Govarî Roman,Jimare,26,1998

14- *Kemtyar*, Kerîm Deştî, Çapxaney Danaz, Silêmanî,1999

15- *Mergî Bazneyî*, Sabîr Reşîd, Çapxaney Rewşenbîrî,, Hewlêr 1999

16- *Qîyamet*, Kerîm Deştî, Govarî Nuserî Niwê, Jimare 8 1999

17- *Ele Bestî*, Hisên Caf, Silêmanî 1999.

18- *Borcî Çawdêrî Gerdûnî Ararat*, Piştî sala 2000, Mihemed Emîn Ehmed Govarî Roman, Jimare, 40 1999.

19- *Gulistan û Şev*, Hesên Silêvanî, Çapxaneya Hewar, Dihok,2000.

20- *Remoznat* Roşna Ahmed, Govarî Roman, Jimare 55 2000.

21- *Wenge,* Ebdula Serac, Çapxaney Havîbûn, Elmanya,2000." [54]

**Romanên Sala 2001**

1- *Romanî Berdjenî* , Mewlud İbrahîm Hesen, Hewlêr

**Romanên Sala 2002**

1- *Diwahemîn Henarî Dunya*, Bextîyar Elî, Silêmanî

2- *Dunya Le Kitêpda*, Cemal Cebar Xerîb, Dezgay Aras, Hewlêr.

**Romanên Sala 2003**

1-*Koç Rew*, Ebdula Serac, Dezgayî Aras, Hewlêr

2- *Temî Ser Xerend*, Şêrzad Hesen, Dezgay Aras, Hewlêr

**Romanên Sala 2005**

**1-** *Şarî Muzîqay Respîyekan*, Bextîyar Elî, Çapxaney Renc, Silêmanî.

2- *Heres*, Mihemed Mukrî, Çapxaney Şehîd Aras Hewramî, Kerkuk

3- *Sonatay Ruh,* Ebdula Serac, Çapxaney Genc,Silêmanî.

4- *Wunge*, Ebdula Serac, Çapxaney Genc , Silêmanî

5- *Ejder*, Ebdula Serac, Çapxaney Genc , Silêmanî.

**Romanên Sala 2006**

**1-** *Pertewazey Êre û Ewêkanê Rewan* , Ebdula Serac, Çapxaney Arabxa, Kerkuk

2- *Xwenî Cawcalokekan*, Jinêkî Mingn

3- *Derbar*, Xosrew Caf, Dezgay Aras, Hewlêr.

---

[54] Sabîr Reşîd, *Çîrokî Kurdî*, Hewlêr, 2005, Çapxaney Roşinbîrî, r13 .

4- *Le Serban Senusim*, Cemal Cebar Xerîb, Çapxaney Renc, Silêmanî.

**Romanên Sala 2007**

1- *Êwarey Perwane*, BextîyarElî, Çapxaney Renc, Silêmanî.

2- *Gilasî Xwên*, Eta Mihemed, Çapxaney Yaney Qelem, Silêmanî.

**Romanên Sala 2008**

1- *Xanimî Şewe Erxewanîyekan*, Selam Emer, Dezgay Serdem, Silêmanî.

**Romanên Sala 2009**

1-*Siwarekan Be Qaçax Bokyan Gwastewe*, Karwan Emir Kake Sor, Silêmanî.

2- *Pêncemîn Kitêp*, Cemal Cebar Xerîb, Dezgay Mokiryan, Hewlêr.

**Romanên Sala 2010**

**1-** *Gulçîyayî Romekan*, Rêwas Ehmed, Çapxaney Mokiryan,Hewlêr.

**Romanên Sala 2011**

1- *Jin*, Rêwas Ehmed, Çapxaney Rewşenbîrî, Hewlêr.

2- *PertewîLêktrzan*, Rêwas Ehemd, Çapxaney Rewşenbîrî, Hewlêr.

3- *Raz*, Xesrew Caf, Çapxaney Aras, Hewlêr.

4- *Paşayan Koşt*, Xesrew Caf, Çapxaney Aras, Hewlêr.

**Romanên Sala 2012**

1-*Keştî Firîştekan*, Bextîyar Elî, Dezgay Endîşe, Silêmanî.

2- *Beserhateanî Xezne Memluk*, Beyan Silêmanî, Dezgay Konsêft, Silêmanî.

**Romanên Sala 2013**

1- *Dxdu* , Xesrew Caf, Dezgay Bedirxan, Hewlêr.

**Romanên Sala 2014**

1- *Nazîle*,Yasîn Xeylanî, Silêmanî

Ev romanên ku me behsan wan kirîn û me navê wan anîn ser ziman ji wan zêdetir û hîn zêdetirin. Lê belê ev romanên dîyar û berçavbûn nivîskarên wan jî dîyar û berçavbûn.Eger me navê hinek roman û nivîskarên wan jî ne anîbe ziman ji ber sînorê Teza me dîyare.

Em dikarin bêjin bi şêweyekî giştî romanên kurdî piştî Raperînê pêşket û pêşdeçûnekî cîyawaz di xwede çêkir. Ew kesên ku roman jî nivîsandîn gelek xebat kirîne û dikarên xwede serkeftî bûne. Mînak , ezmûna roman nivîsîna "Bextîyar Elî ezmûna nivîsandina romanên wî cudaye ji ezmûna nivîsandina Eta Mihemed. Ya Eta Mihemed jî cudaye ji ya karwan Kake Sor, Ew jî ji Mardîn İbrahîm û ezmûna nivîsîna romanên Necar Nur, Cebar Cemal Xerîb, Selah Emer
bi temamî cîyawazin, Xwedîyê sitay û şêwazên xwene. Di çavê roman nivîs Goran Babe Elî, Rizgar Heme Reşîd her wiha Beyan Silêman jî bi temamî cîyawazin yên ku me navê wan jî anîn"[55] . Ji ber vê jî romana kurdî pêngavekî baş avêtîye û li rêça xwe girtîye. Belku di dahatûyê de jî em romanên hîn xweşiktir û baştir jî bibînin.

# BEŞA DUYEM

## Naveroka Romana Siyasî Li Kurdistana Irakê De

### 2.1 Naveroka Romana Siyasî Li Kurdistana Irakê de

Wêje û corên cuda yên wêje bi şêweyekî giştî û roman û romana siyasî bitaybetî awête bûn û rakêşana rewş û qalkirin û westeka netewayetî li beşêkî zêde rêbaz û rexne û teoriyên cuda yên wêjeyê , bi watayekî din wêje qadekî xwezayî û civakîye û ne dure ji lêkolîn,hizr û fikirên civakî. Ango çênabi wêje serîhilbidi di civakekî ji aliyê nivîskarênûve , ger girêdayî destê zulum ,zordarî ,çewsandinê û jêr destê bit , ji ber ku wêje rengdana rewş û halê civakî û hewil didi dest bi avêji li ser êş û azar civakê û li pey rêyek ya çareserîya guncaw de digerit ji bo çareserkirin û gihiştin bi amanc, hizir û fikirji bo kesekî civakê , ji ber ku zimanê nivîsîna mijara wêjeya siyasî , ku bi wêje tê

[55] Aram Sidîq, *Berew Romanî Kurdî*, Silêmanî,2015, Çapxaneya Yad, r 204 .

pênasekirin gelek cudaye li gel heman pirsgirêk û mijara siyasî , ger serokekî siyasî qaldiki û tê pênasekirin ji aliyê hunerê zaman û teknîk û tenê fikirênwan asîman û erd di navdeye . Ango wêje û beşên wêje di hemû serdem û di nav hemû rêbaz û teorîi rexne û lêkolînê nû û yên kevin jî çênabi û nikari bi civakê û tenê rewş û hizirê siyasî netewa xwe û gelek bi hinedek car rewşû mijara siyasî cîhanê jî dikevi naveroka xala wêjeyên xwe û ji corek ji coran di nav berheman de reng diditê , ji ber ku tu wêjeyek ji valehiyê nehatiye .

Li pey hev peydabûna fikrên nû ji bo wêje û girêdana bi civakê û cîhana derwûber û ji derveyî mijarê , nimûne pişta peydabûna teoriya wêjeya realistî ku li gorî beşêkî zêde ji lêkolerên wêje roman ji dayîkbûna ev rêbaz û teoriyên ye ,ji ber ku roman bingehê hişkê helgirê beş û fikrê jiyanî nû û di nav dilê xelk û civakge ji dayîkbibit, ev rêbaza wêje wekî ezmunêkî jiyanî temaşeyî mirovayetî diki , ku ziman çawaniya rewşa siyasî ,abûrî, civakî, rewşenbîrî ,olî û hûnerî û .... Hwd. Hemû evane jî dibite keresteyekî bisûd û bingehek ji bo mijara wêjeyên cor bi coran di nav van de jî roman û corên rengdiditê û dibite naveroka sereke ya romanan. Siyaset jî qadeyekî mirovayetî û bi ser bi cîhanî mirove û di nav civakê de kêm û zêdebun heye û qala wê tê kirin, ji ber ku tu sekterekî jiyan nayê dîtin bêy ku girêdana wê bi beşêkî bi siyaset û bîr û hizir siyasî li nav civakê de, divê em ev jî ji bîr nekîn yên siyaset dikin mirovin, mirov jî dibi ku xwediyê hizir û bîrî siyasî bit û xawen eaydolojyayekî taybet bit, bêguman beşêkî zêde nuseran û roşnbîran û edîban û şaîru , çîrok nûs û nîvîskarê romanêhelgirê îdeolojî û aligirê siyasî û tenê beşêkî zêde bi ser yek ji partî rêxistinê siyasî û kom û teyrê rizgarî xwaz û şoreşgeran ,di vê mijar û nivîsînên wêjeyîde reng diditê û cihên wan diyar dibi , bi taybetî li nav romana siyasî de ji ber wê wêje ji aliyê mirovan ve tê nivîsîn û berhem tînin, mirov jî helgirê xem û êş û azar û nexweşiyan , vêca ka ev êş û azare girêdayîbit bi mijara netewî û zulum û zordarî û çewistandina gel ji aliyê dagîrkeran û yên mirov li ser xak û welatê xwe bi hemwelatê pile dû tê danîn û rêyek ya bi azadî fikir diyarkirinê çênabi û mafên wan hatiye zewt kirin , bêguman gelêk xwediyê van hemû neweşî û êş û azarabin çênabi wêjeya wan bê behirbit li rengdana vê rewşa siyasî û kavilkarî û cudahia çînayetîyêbit .

Siyaset jî gotinên zêde liser kirin ji bo vê tê gotin "siyaset kar û çalakîyekî hunera nû ya serdeme , ji bo damezirandina hukumet , yan jî destbiserdegirtina desthelata rêvebirinê û diyarî kirina sîtem û corî têkiliya kar û barê civak legel dewletê de"[56] yan rêbazî bi rêvebirina welat û diyarî kirina şeweyên erk û naveroka çalakîyekanî dewlet "ew mebest û armancanene ku çi tişta civakî di bin navê serkeftina raperîn û parastina destkeft û qazancên xwe dixin navde"[57] bi wê wateya siyaset jî di aliyê dîrokêve yek ji ast û pêwîstîyên jiyana civakê ne . Diyardeyekî dîrokî civakîye bi mebesta pêketina civak û damezirandina şarstanînitê , ango siyaset çalakîyekî cudanekirina ji jiyana civakî ya mirov berdewam di hewla wêdeye bi şêweyekî siyasîyane danûstandinê legel derwûber û civakê de biki û xwe li gel bingeh û pêşwext biguncit .

Ango wêje û siyaset dû aliyê yekgirtîne û nikari bi hêsanî li ji hevdû cudabibin. Îro di cîhanê de mirov li ser aligirê siyasî , netewayetî û olî û çînayetî , tenê liser cudahiya reng û kar û pîşe û .......hwd , tê diyarkirin , bêguman di rewşêkî wiha de axaftin liser bê alîbûnê û biyanîbûna wêje û nivîskar dibiti tiştekî bê bingeh bêwate , ji ber ku nîşandan hercore hest û bîr û helwêstêkî nivîskar , beşek ji vê çewistandina dibi corek ji helwêsta siyasî , yan naveroka bernameya wê şekil û sîmayekî siyasî bi xweve digrit , ev jî wê nadi diyarkirin ku wêje li xizmet û paşmawe siyasetê de bit , belku "siyaset beşêkî di xizmeta wêjeyêdeye , wêje jî di xizmeta siyasetêdeye , ku jêre dibêjîn cîhana berjewendî carubar wêje jî di xizmeta berjewndî deye , eger baş lêbikolîn nivîsekî wêjeyî hercarê dikari di xizmeta berjewendiyê aliyekê dabit , hemû nivîsandinjî ji bo xwe xwediyê şêweykî siyasîne û ji siyasetê bê agahîne , jê belê dikarin ji partî bê agahin"[58] Hemû azadîyek sude jib o serdestekan û paredarekan û çîna arstokirintokirintan û heman watew delalet jî dijî çîna jêr ya civakê, hejaran û yên bê parin. Wate "temaşe bikin ku di roja meya îro de ku gelek zêde em guh didin beşê azadî demoqrasî û mafê mirov, jê belê em xwediyê cîhanekîn ku zêdetirîn astengên azadî

---

[56] Ebdullah Agrîn , *Şî'rî Siyasî Kurdî Le Xiwaruy Kurdistan 1918 -1930,* Hewlêr , 1994 , Namey Master Kolêjî Adab Zankoy Selahedîn, r 44.
[57] Burhan Qanî' , *Ferhengî Niwê,* Bexdad , 1985, Metbe'e Elhewadis, r116.
[58] Aram Seîd , *Mêjûy Barî Siyasî Û Komelayetî Le Çîrokekanî Hesenî Qizlçî Da*, Hewlêr, 2006, Namey Master Zankoy Selahedîn, r 36.

têdabit û vale bit ji dîmukirinsî û rêxweşkerî koletî û astegê jiyana mirov bin"[59] hemû ev rewşane jî dibine sedemê derketin û hi dayikbuna çendîn mijarên nû û afirêner bi taybetî roman , gelek bekêmî mijarekî romana kurdî derdixi , eger hemû ne roman jî goşeyek ji goşeyên romanê dernexitibi ji bo vegotinkirina bûyerên siyasî û netewî û şoreşên kurd û bzavî rizgarî xwaza neteweke , ji bo vê siyaset û wêje bi corek çûne nav hevde nikari ji hevdû cudabikin , divê em vê jî ji bîr nekîn , dema qala bingeh û siyasî yan mijarên siyasî di nav roman tê kirin ne merce hema ki binivîsi ew buyer hatibi serê mirov, jê belê bigiştî jiyan zincîreyek yadîgare eger neyên nivîsîn hêdî hêdî kal dibin û tên jibîr kirin.

Nivîsîn dijberî kirina ji bîrçunêye, bi watayekî din nivîsîna hemû bingeh û serhatiyên jiyanê, di jiyanî asayîde dibite parastina civakê, zanyarî û dokumentên gelek giring û pêwîstî di dem û serdemekîdin û pişta sedan salan sud jê tê dîtin û tê bi karanîn. , bitaybetî di nav xala wêjeya yekanda di nav emanîşda janrî roman , ji ber ku roman têkiliya bi jiyana mirov û karekter û buyeran ve heye , ango roman helgirê deng û rengê cudaye di nav hemû neteweji aliyê hemû nivîskaranî cîhan . "markîz yek ji bû ji wa nivîskara giringane tu bîranînek vale ne diberda , hemûtomar dikir, her dinivîsî û zû zû digot niha ne demê wê projeyek pişt bixim"[60] dema em mirin êdî demek zêde yê me hey ku em têde bêhna xwe vekin dem rastî hemû bûyer,pirsgirêk û çareseriyên giştî mijar û naverokên cudane . Ji ber wê roman şêweyekî aloz û bi asten û firerehende , nivîskarê romanê li gel zimanêkî ciwan pêwîstî bi wê jî heye şarezayetî qalakirina beşên helbest, fikir, derun , civak ,dîrok , felsefe û destan û efsaneyan jî hebit . Ji bo bikari di nava van hemûyan de mijarêk berhem bîni ku hatibi honandin û bibi beşek ji hizir, bîr, îdeolojiya nivîskar li aliyekê û xistina aliyê kêm û kurtî û nexweşiyên ser netewê tenê rêyek ya çareseriyê, bêxi berdestê xwêner û li rêya nexşandin û dirustkirina karekterên corbecorên nav romanê de .

Divê eme ji bîr nekîn roman pêkhateyekî hişk bazineyî heye , herweha lêkolîna nav civakêye , ji bo vê dema nivîskarê romanê dest bi nivîsîna romanê diki û nexşe û

---

[59] Aram Sidîq, *Berew Romanî Kurdî*, Silêmanî,2015, Çapxaneya Yad, r 121.
[60] Heme Se'îd Hesin , *Roman Û Jiyan Name*, Hewlêr ,2018 , Çapî 1 Çapxaney Nawendî Awêr, r 25-26.

pilana romanê didani, fikir ji cor,şêwe,ast,pileya rewşenbîrî û xwendewarî karekteran digrit, ku ji nav civakê di hilbijêrit û dixwazi li ser zimanê van bîr û hizire siyasî, civakî, abûrî,olî .....hwd , bigihîni xwêner, piştre çawa bûyeran helbijêrîn, biki hêvên û bingehê bûyerên serekî yê romanê li ser bingeh bê danîn, ji bo vê jî nivîskarê romanê dema dixwazi romanekê binivîsi roman siyasîbi ew pişt didi bi bûyerên dîrokî û siyasî navxweyî û derve. Naverok û hizirê siyasî di romana başûr de gelek heye , wate rewşa siyasî ya gelê kurd di navçeyê de bitaybetî û cîhan bi giştî buye sedemê ji dayîkbûn û serhîldana çendîn mijarên romana siyasî , ji ber ku netewa kurd xwediyê çendîn buyerên dîrokî û siyasîne , ku bune birînekî kur û giran li bedena dilê kesekî kurd û civaka kurd , ji bo vê nivîskar û rewşenbîran û nivîskarên romanê yên kurdan kêm heya zêde hemû bûyer serhatî û şoreş û tevgera rizgarî xwaza netewî û tenê bûyerên nexweş ûku li ser netewamede hatiye, wekî enfal, cînosayd kîmyabaran, veguhestin şer ,kavilkarî gund, navçe û başaran û şewitandin û zindî binaxkirina gelek ciwanên vî gelî .....hwd, bune naveroka beşêkî zêde ya romana siyasî û nivîskarên kurdan , ji bo vê di xwar de hinek di vê rewş û naverokên siyasî diyar û berçav yên di nav romanên başûrî kurdistanê de heye derdixin holê, mînaka mijarên romanên wan ji bo derdixin holê diyare ku nîvîskar û roman jî gelekin, jê belê em naveroka çendekan derdixin pêş çav û mînakên jê werdigrin û dikine belge û kar liser dikîn ji ber wê heya niha kurd nebûne .

Xwediyê dewlet û hebûnekî siyasîya serbixwe. dîbînîn ku wêje rengdana vê rewşa nexweş û newehiyên ku li ser netewa mede hatiye, bi dirêjahiya dîrokê tu gelek wekî netewa kurd bitaybetî li başûrê kurdistanê ku xwediyê sedan buyerên nexweşe û zulum lê hatiye kirin ji aliyê dijminên kurda ve ji bo vê wêjeya mejî pire ji çewisandinên netewî û cînosayd û kîmyabaran kirin û karesatî trajîdî , hawkat bi dirêjahiya dîrok wêje çekêkî garîger buye , ji bo parstanî dîrok , ziman û kelturu rewşenbîrî kurdî . "ji bo vê dîbînîn ku nivîskar û rewşenbîrên kurd rûberuy erkêkî qurs û giran bune , li aliyekê bergrî û fedekarî maye li ser mile wan , li aliyê din jî beşekî

qelem hizir û fikirin welatû netewî bergirî li pîroziyên kurdistanê kirine"[61] , wate pêwîste wêje ziman çawaniya warê siyasî û rewşa netewî bit .

## 2.2 Karesata Enfal

Enfal yek ji karesat şerê cîhanêne , ku li ser netewa kurda hatiye li ser destê yek ji rejîmê dirindeyên cîhanê , ku ew jî rejîma be'sa Iraqê bû ser dest û raste rast bi fermana serok komarê Iraq Sedam Huseyn bû , vê bûyera karesata na mirovaneye ya rejîma Iraqê ya rureş bi karanîna yek ji suretên pîroz yên quran û berewazanîn û helal kirina xwênî kurd li başûrî kurdistan pêkanî . Di vê piroseyê de bi hezaran jin,zarok, zilam, ciwan, kal û zarokên di landikande hatin qetilkirin. Li cih û navçeyên xwe de hatine desteserkirin. Hatin revandin ji bo bajar navçe biyanî yên naverast û ser sinûrên navbera Surye, Iraq û Urdun û hatin enfalkirin û bê ser û cih bi zindî xistin nava goran de. "Enfal piroseyekî serbazî bû , rejîma be'sa Iraqê bi şêweyekî berfireh destbi valekirina gelên navçey kurdistanê kir bê rawestan ev talankirin,xirabkirin û wÎrankirina van navçeyên Kurdistanî, ev proseya di 29 adara sala 1988 destpêkir û heya 05 / 09 / 1988 berdewam kir , herweha helbijartina navê enfal paşmaweye şer di sureta heştem quranê de hatiye navkirin , ku amajebû ji bo karê hişk û tûndrewiya be'sê di Iraqê de"[62] ,herweha ev karesatê û bûyerên diltezînê bi pilan û bername ji bo hatiye çêkirin. Ji aliyê serok û desthilatdarên rejîma Iraqê ve kar li ser hatibû kirin û dariştin, ji bo vê hemû ne bi yek car û li yek navçeyê bu, berevajî vê bi çend qonax ev kare bi awayek wehşet û dijî mirovayetî jib o pêkanina kar u armanên xwe pêkanîne, armanca wan jî ne tenê ji navbirin û qirkirina netewa kurd bû li başûrê Kurdistanê bu, di vir de pêwîste bê zanîn ku qonaxên enfal yek li pişta ya din bi kurtî qal bikîn.

### 2.2.1 Qonaxên Enfalê

Ev proseya di 29 adara sala 1988 destpêkir û heya 05 / 09 / 1988 berdewam kir di vir de pêwîste bê zanîn ku qonaxên enfal yek li pişta ya din bi kurtî qal bikîn:

---

[61] Hesenî Qzlcî, *Bîrewerî Û Helwêstêk Beramber Çîrokî Kurdî* , Hewlêr , 2011, Govarî Nûserî Kurd, J.10, r13.

[62] Yusif Dizeyî , *Enfal Û Karesat Encam Û Rehendekanî* , Hewlêr, 2001, Ç 3 Çabxaney Wezaretî Perwerde, r43.

### 2.2.1.1 Qonaxa yekem

Enfala dola cafayetî li pişta wê hukumeta Iraqê di 17 cotmeha 1987 amara niştecihên Iraqê hat encam dan, piştre çar mehên yekem qonaxa enfalê di kurdistanê de di şeva 23 sibata 1988 de li dola cafayetî dest pêkir ku li vê navçeyê pilavbû ( dukan , bingird , çurata , qelaçolan , serçnar , sudaş , zêy biçûk , ezmer , susê , mawet , sergel û , bergelu ) û di 18 /03 / 1988 dawî lê hat.

### 2.2.1.2 Qonaxa duwem

Enfala navçeya Qeredax di 22 adar 1988 kesek û 1 nîsana 1988 ev navçaney girt ( çiyayê gile zerd , bazyan , qeredax , derbendî xan , zerayen , erbet ) .

### 2.2.1.3 Qonaxa sêyem

Enfala Germiyan ku li 7 nîsana 1988 heya 20 nîsana 1988 bû , ev qonax ji giştî qonaxên din di aliyê mandî û mirovê de karesat girantir û bi ziyantir bû, ji ber ku 70-80 hezar mirovê kurdî têda bê ser û cih kirin , ev navçane girt (duzxumatû , kifrî , kelar , debendî xan , zincîre çiyakanî qeredax , tekîye , çemçemal , qere hencîr , qadir kerem , sengaw , tîle ko , pêbaz , axceler )

### 2.2.1.4 Qonaxa çarem

Enfala hewzî zêy biçûk 3- 8 gulana 1988 navçeyekî berfireh ji baqurtê ew rê giştî girt ku bajarê kerkuk bi bajarê silêmanî ve girê didi, heweha başûrê rêya navbera koye – deryaçey dûkanê girt ku pêktê ji navçeyên şiwan , şêx bizênî , deşta koye , koptepe , esker , dêgele , altin kopru.

### 2.2.1.5 Qonaxa Enfala pêncem û şeşem û heftem

15 gulan heya 26 tebaxa 1988 ku dola nav çiyayên şeqlawa û rewanduz girt ku têde rejîm bi kîmyabarankirina gundên ( balîsan , balukawe , xetê ) êrîşa wan dest pêkir

, û zêdetir li 52 gundê navçeyên xelîfan û xoşnavetî û rewanduzî wÎrankir , û navçeyên çoman û çiyayê qendîl û ranya çarqurne û hîzop û çiyayê bawacî girt .

### 2.2.1.6 Enfala dawî

Enfala Badînan 25 tebaxê heya 6 îlona 1988 : bi topekî kîmyauy li navçeya Zîreşkan nêzîk sînorê Iraq û turkya destê pêkir û ev enfale jî van navçane girt; Dihok , Zaxo , Kanî Masî, Zêwe , Dêreluk , Etruş û Zawîte .

Van karesata bandorkî zêde kir li ser gelê kurd bi giştî û nivîskar û rewşenbîrên Kurd bi vê jî rengdanekî gelek û diyar heye di nav berhemên netewa mede , eweta Cmal Cebar Xerîb li romana Pêncemîn Ktêb de kele ser zarî vegotinkirinêkanî naz cewahêr xan û geşte xeyalawîyekan Kakoy kurtî jenyarî Murad bi wrdu drştî vegotinkirinêkanyan bas û westeka ew karesat û kavilkarî û şewitandinaî gundu ladêw şaru bajarokên Kurdistan enfal kirin û cînosayd kirina netewa Kurd, nivîskarê romanê li ser zarî van dû karekterên serekîye vegotinkirina van karesat û bûyeraneye ew rojên ku Kako li Mala Seyid Husênî Cîhangîr divê , naz Cewahêr Xan yek li pey yek çîrokên xwe ji bo wan vegotin dikir me jî guh didayê , carekêjî qala çawaniya şewitandin û rûxana gundê kurdan diki ku çawa û çendîn car ev karesat ji aliyê dewletê ve û li hindek cihan de dehan kesî têda li navçeyê enfal kirin û bê ser û cih kirin , ji ber ku di vê romanê de tenê qala karesat, kuştin, revandin û awarekirina romanê nekirin , di heman demê de jî qala çawaniya şewitandin û wÎrankirina gundên Kurdistan û Enfal û kîmyabarankirina xelkê vî welatê jî kirin . Nivîskarên romanê yên serkeftî kar liser van mijarane kirine û zemîn ji bo xweşkirine, bi wêye ku dayika karekterê serekî Kako ye kirine ermen û bavê wî jî Kurd, ji ber wê ev karekterên li jêr bandoriya bûyeran de xwestiy bi hurî çarenûsa romanê bizani. Dixwazi di heman demê de li gel wê dîtina çarenûsa kurdan. "ji bilî vê jî yek ji mebesta sereke ya nivîskarên romanê ewe bu we li rêya vê romanê mezlumbuna herdû netewe bêxi berçava, Ger stem kirin wan ermenekan bi sedemê kamêrî Ceymis Pol em birêkevin û bixin ber çavan , herweha gihiştiye ser rûpelên rojnameyên Emrîka, ew di vê romanê de erkê sereke nivîskarên romanê û karekterên sereke ewe ku

bikevin li pey çarenûsa Kurdên hatîn enfalkirin û vê mijara veki û diyar biki û bêji Kurdên ku hatin sitemkirin tu jî ne kêmî ermeniyanî..."[63]

Ev yek ji çîrokên li ser ziman hatine gotin û parastin Naz Cewahêr Xan ku dibêji: "ewe naz Cewahêr Xan dibêji Hespek bibi ber, kako bi dehan peykerê hesp tê bîra wî, peykerê bi heybet û mezin yên Roma, Hespê pitrosê yekem , Hespê xaw yên yonan û Hespê hatin xemilandin bi textedar, lê belê ew hespê bingehê wê cîhangîr, hespek ji bo kêşana bêhnekê bêhna wî rawesti û bibi ber, hespek karwan li rexê wê re derbaz bibi, cewahêr xan dibêji:

Li dûrî gund rawestiyan, agir vemirî, carê tep û toza karwanê dujmin di hewayê de mabû, me fêm nekir ku ew gunde ku me îro bi cih hiştiye, ji wê diçû di seferekê de bi serde bikevin, bêhn û rê û dar û giya hatibu guhertin, ji ber ku nav gund û hespê wêne helgirtibû hînali wê ketibu, hîna çavê wî zeq û hîna zindî, bi qasî sed kesan girîbû, wêneyê wî liser pişt nebûew sindoq û qumaşê ku me lê pêçabû ji wê ketibun, ewi sultane cîhangîr dixwest, ew li kuye, dijmin biriye ?! li penagehekî hatiy kuştin ?! Kê wêneyê wî biribû ..."[64]

Di vê xalê de ji bo me derdikevi, ger nivîskar sud zêde ji dîrok girtiye "wate gotara dîrokî desthelatdariya xwe diyar kiriye , ev jî tê wateya ew nînî ku nivîskarê romanê mijarekî li serçaveyekî dîrokî tenê serdem jî girtibi, ji bo wê xala heyî berfireh biki , yan mijarekî çêbiki yan ji nu ve bi afirîni, ji bo vê jî guhertinekî sade di mijara

---

[63] Necm Xalîd Necmedîn Elwenî, *Corekanî Deq Awêzan Le Romanî Pêncemîn Ktêb Y Cemal Cebar Xerîb* , Slêmanî, 2012, Çabxaney Yad, r 86-87 .
[64] Cebar Cemal Xerîb, *Romanî Pêncemîn Ktêb* , Dihok, 2009, Ç1 Çapxaney Xanî, r138.
Cebar Cemal Xerîb, li sala 1961 li Bajêrê Qeladizê li Başurê Kurdistanê Ji Dayîk buye li Zanîngeha Bexdayê Lîsans bi dest hînaye, li destpêka deheya heştayan de wekî Çîrok Nivîs dest bi karê Edebî kirye yekem çîrokên xwe bi navê Paşeraw li Govara Beyan da bilav kirîye, piştê wî çend Çîrokên din bilav kirîye wekî:(Teme Piyaw, Şikanî Zê, Giyanî Taşekan, piyawanî Mer Mer, piştê wî di salên newedan de jî dest bi nivîsînên novletan kirîye û di Govaran de bilav kirîye bi taybet di Govarê Raman de wekî( Namusî Tozu ba, Jinanî Aw), Romanên her ya diyara nivîskar evin:(Çinarî Şîr, Şêxî Damus, Dinya Le Kitêbêkda, Pêncemîn Kitêb, Le Ser Baran Denusim, Netewey Zêrabekan, Zêbira Nawêk bo se Kêlekem), Cebar Cemal Xerîb tinê ji roman û çîrok û novlêtan xwdana çend vekolîn û şîkarane di waren çîrok û şano û romanên kurdî û biyanîne ku di pertukek de hatîye çap kirin bi navê (xwêndinewey Kitêb).

yekemda bikin"[65] , dibi ku tenê li jêr karîgeriya enfal û karesata de bûyerên vê xala ketiye nav danûstandina legel wê gutarê de û dixwazi di vir de giringiya karekterêk girêya bûyerê diyar biki , herweha xwêner û nifşên nû di vê karesat û bûyerên şer tejî ji nexweşî li ser netewa xwe de hatiye agadar biki . Ger temaşeyî vê xala serê bikîn dîbînîn ku çawa nivîskarê romanê derketin nav bûyerên dîrokî yên siyasî netewa xwe diki û li gel wê jî bi karekter, wêne û dîmenê xeyalî û hatî gotin balkêş diki û diki mijarekî hunerê û romanekî bilinda hunerê û romanekê liser binemayê qalkirin û xwestk û mijara siyasî netewa mede bi bingeh buye. Hevênê ji dayîkbûna van romanan li ser zimanê karekterê serekî yê roman bi şêweyekî diramatîk, dimanan tomar diki û qala wan karesatan didi. ku wekî bûyerêkî siyasî û paşmayekî nexweş di dîroka gelê kurd li başûrê Kurdistanî Iraq tomarkirin , dema dibêji: "tu tiştê veşartiyê min nîni , navê min kako zanyarî murad bege , bavê min kurde xelkê vî welatê weye. Bapîrê min kum tizbî û sebîleyekî aniye ji bo ewrupa bi çend muriyên şîn dayika dejî . Dayika min jinekî ermenîye qet welatê xwe nedîtiye, ku nave giya dar û ber rêw û rêbarên xwe dizanî. navê gund û kolanê welatî nebu ku dizanî û jiyanî çendan pştî xwe ji berew bapîrî û nenkî û dayika û purekanî û mamekanî û kuru kurezayan denasê ....., jiyan û demboriya van herdû dayîk û bava têr û tejî wisan kirin ku ez ji jiyana xwe fêm bikim. Min dizanî ku ev hemû rastiyên jiyana min bun…"[66]

Nivîskarê romanê li rêyek ya vegotinkirina bîranîn û behskirinên Kako qala li hestê derûniya şikestî ya kesekî Kurd diki , ji wê em tê digihîn ku kurd çî bi serhatiye û çawa jiyanek jiyan kiriye , wate ger ku di vir de kesêk di axivi û qala hest û ramanê xwe diki vegotinkirina wan karesat û bûyerên nexweş diki , lê belê mijarêkî giştî ye û geleke , ji bo vê buye bi hestekî giştî û civakî, ew hestê ku Yong qalkirî .

Herweha Mihabad Qeredaxî di romana Fatîle de ku romaneke em dikarin bêjin romanekî siyasîye û liser binemayê bingehê bûyer û ji serhatiyên siyasî yên netewa mede li başûrê Kurdistan bingeh girtiye, beşekî zêde bûyerên nav romanê de qala enfal

---

[65] Hatem Elsekir , *Teruys Alnes*, Mîsir, 1988 , Hîet Almisrîye El'ame Lîlkîtab Sîlsîlet Dirasat Aledebîye , r184.
[66] Cebar Cemal Xerîb, *Romanî Pêncemîn Ktêb* , Dihok, 2009, Ç1 Çapxaney Xanî , r169.

û kimyabarana navçeyên Kurdistana Iraqê diki û buye hêvê roman û zincîreyekî piştî bûyerên li ser hatîn pêkanîn hemû ev bîranînane tejiye ji trajîdî ,nexweşî û bêmafiyên ku li netewa Kurd hatine kirin di nava xwe de digri. Yek ji wan karekterên sereke yên romane û tenê nivîskarê romanê di gelek cihê romanê de bîr û hêzrên taybetin bi xwe dixi nava hizrê Fatîle yê de û bi navê wê diaxivi çarçoveya îdeolojiya xwe zelal diki li ser karekterê sereke û Fatîle ye, ji bo vê gelek cara min karekter û çîrok dixwend , ku nivîskarê romanê di nav vegotinkirina romanê de nêzîkî hevdu dibin û nikari li ji hevdû cudabikin , tenê hest bi xeta serekî Mehabad Qeredaxî dikîn di giftugow monologê di nav romanê de .

Ew li ser zimanê Fatîla dibêji: "leşkerên enfal wa hatin germiyanê jê wek dola cafayetî û qeredax bêy ku ratî tu bergirîyekê bên , ew xweragiriya li dola cafayetî hati kirin dive di destan û efsaneyan de jî hebit , lêbelê li wê bû sedan sedanî rastî ne zêdahî, pêşmerge li beranber dujmin de jiyana xwe bexşîn , navçey qeredax jî ne bê xweragirî bû li wê derê jî gelek qurbanî hatin dayîn .... , erebekî reş ku tenê didanê wî spî ser kêbilan ve diço"[67] di vê romanê de ku romana Fatîla ye bi corek ku bûyer deshelata li ser vegotinkirinê de , bi wateyek din hatiye jêbirin bi hemû buyerên bi nav bikîn , ji ber ku nivîskarê romanê kariye bi şêweyekî hunerê û bi corek mijarekî nû ji dîroka kevin û bûyerên siyasî û dîroka netewa mede berhemekê bi afirîni. Qala dordariya be's , qala şoreşî Pêşmerge û qala kavilkarî û wÎrankirina Kurdistan , qala kîmya baran û enfal diki . bi dirêjahiya buyerên enfalê sax binaxkirina zarok, ciwani jin û kalên kurda ......hwd , ango di vê romanê de nivîskarê romanê "bûyeran vegotin naki, buyerê heldikoli û buyerekî nû çêdiki"[68]

## 2.3 Karesata Kîmiyabarankirina Navçeyên Kurdistanê

Rejîm ji bo wê biselmîni ku kirarên wê li ser xelaskirina gelê kurda rast û temame , çi bikaranîna hemû çekên teknolojiyê bit li gel yên din, dyare diyare ku çend piştraste ji xwe ku di cîhanê de kes nebû ku wî bisekinî an ji gotinekê jêre biki, ku di

[67] Mehabad Qeredaxî , *Romanî Fatîla*, Dihok 2016 , Çabxaney Xanî, r146-157.
[68] Heme Se'îd Hesen , *Roman Û Jiyan Name,* Hewlêr ,2008 , Çapî 1 Çapxaney Nawendî Awêr, r148.

gelek cihan de ev kar encam daye, karî kîmyabaranê biki çekek ya tunekirina civakan netewan , ew karesata Hîroşîma û Nakazakî ku li ser minak bû , kîmyabarankirina dola balîsan , badînan , sergelu , bergelû , goptepe , sêwsênan û çendîn navçey din cara dawî jî şehîd kirina bajarê Helbçe li 16-3-1988 ku zêdetir ji pênc hezar jin, zarok û zilam têda şehîd bû .

Ev karesata mezin buye sedemê şokkirina giştî cîhan û civakên cîhanê û hemû rêxistinên welatên mezin welatên din yên cihanê . Bêguman karê herî dirinde ku ji aliyê rejîma be’sa Iraqê li beramber netewa Kurd hatiye kirin , kimyabarana navçeyên kurdistan û bi karanîna çekî kîmyayî bû ji aliyê desthelatdarên Iraqê ve beramber başûrê Kurdistan , ji bo vê ev zordariya ku hatî kirin heya ku mirovayetî maye nikari bê ji bîr kriin û tune biki, bi taybetî ji aliyê rewşenbîr û wêjevanên netewa meve bivê jî buye sedemê ji dayîkbûn û serhîldana sedan mijarê hûnerî , tenê buye sedemê serhîldana wêjeyek û qonaxa diyara .Wêjeya benavê wêjeya bergrî , yan wêjeya siyasî û di vê core bûyer serhateyên siyasî şer birîne , divê em wê jibîrnekîndi romanê de rasgoyî bibi bingehê vegotinkirina romanê , ji ber ku ewe ku em rewşa niha fêm bikin , dema em xewnekê li ser bibînin û bi xeyal ava bikîn ,lê belê eger em xerîkê nivîsîna fikrên xwe bîn wêdemê mafê me nîni rastiyan biguherînîn, lê belê roman ne nivîsîna bîr û fîkrên xweye , belku çêkirin û derketina bîrekî bi şêweyekî wêjeyî bi zimanêkî sade, pesinker û tejibi bi trajedî, wêneyên ciwan û hest û dillerzînê. Cara dawî divê ev jî ji bîra me neçi ku wejeyek dernakevi ku sedsal ku ji rewşa jiyana civakî nehatibi girtin û nivîsin. Ango wêje ji valehiyê nehatiye dibekû hinek xeyal û fikrên nivîskar têde hebit , nivîskar jî di nav civakê de ji dayîk bûye û Cara dawî rengdana xweza ,derwûber û civakêye, ji bo vê gotara wêje awênê jiyanê di nav wêje ji roman bê komkirin û tomarkirin ji rengdana rastî û rewşa nexweş û nexweşî û trajîdî û komîdî xelkê, belê di vê nimûneya di nav romana Kurdên başur hatî gotin de wê rastîye deselminit ku Kurd xwediyê civakekê mijarên ciwan û hunerêne û bi taybetî zanayên roman û di nav van de jî romana siyasî û naveroka romanan siyaset û bûyerên siyasî behra şÎran buye ya wan , romana Mergî bêkota ya Rizgar Kerîm yek ji di vê romana siyasîyaye ger giştî bûyerên cih û dem di nava xwe de digrit heye, degate karesatî kîmyabarankirina bajar u bajarokên Kurdistan û bi taybetî bajarê Helepçey şehîd , nivîskarê romanê bi sûdgirtina

ji vê bûyerên dîrokî şer bîr û ji bîrnekirin kariye wêneyê zulum û zordarîya rejîma be's beramber netewa Kurd binivîsî û qala wê biki.

Belê di vê xala de destnîşankirina tirs û destpêka hewldana ji bo daxwaza bi karanîna çekî kîmyayî ji aliyê rejîma be'se ku berî wê seranên Îranê ve agadarkrbun li beranberî metrsiya bi karanîna van çeke komkujiyê , dema liser zarî serokekî Îran û di civînek ya di navbera Îranî û Partiyên Kurdan de kurd agadar dikirin, jibo metrsiya bi karanîna van çeke komkujiyê di navçey Helepçe de ji bo vê dibêjin "bi dirêjahiya wan mehan dezgeha zanyariyên serbazî ji aliyê locistîkî û temamkerê êrîşê radigihand û çend perwerde bi bejdarbuna leşkeran dikir û perwerde û bi dirêjahiya vê perwerdê pisporên Îranî pêşbînî dikirin ku çekên kimyayî di dema perwerdê de dihatin bi karanîn ji aliyê rejîma be'se ve , ji ber ku li berekanî faw û kut û emar de heman çek hatibû bi karanîn , Îranî jî ji bo parastina canê leşkerên xwe û hawpeymanên xwe li ser partiyên Kurdistanî maske belav kirin û derzî û dermanê dijî kîmyayê dan wan......"[69] Wek dibînîn ku di vê xala me dayî diyarkirin rêyek wisan ya giftûgo, runiştin û li hevkirina navbera partiyên Kurdan, hukumet û desthelatdarên Îran de perde li ser tiştekê hat rakirin û ev xistin li ber çavan, ew jî egera kîmyabarankirina navçeyên helepçeye , ev jî li gorî jêhatina nivîskarê romanê hatiye raxistina li ber çavan, bi sedemê bi karanîna teknîkekî hûnerî ku di nav romanê de bi karhatiye û vegotinkirina bi wê hatiye encam dan , ew jî hûnerî pêşxerîyêye , hûnerî pêşxerî di nav romanê de grîngî û bandora xwe heye , ev teknîke cudaye ji ya pêşbînî , ji ber ku di pêşxerî nivîskarê romanê wala rudana buyeran diki , dibe ku di dahatûda ev buyere rûbidit , ger ku çênebijî ew pêş bînîyenek pêşxerî , ji ber ku di teknîkî pêşxerî de dema nivîskarê romanê li gorî wê tevdiger û qal diki div ew tişta ku qala diki çêbibi . Ji bo vê jî tê gotin teknîkî pêşxerî

---

[69] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r 570-571. Rizgar Kerîm, edîb û Çîrok Nivîs û roman nivîse xelkê Bajêra Helebce ye, sala 2000 dest bi nivîsîna romanan dike, xudanê Romana Mergî Bêkota ye ku yek jî binav û dengitrîn romana nivîskarê ye li sala 2002 çap kirîye behsa buyerên sîyasî û Enfal û kîmyabarana navçeya Helebce dike, roman ji li sê beşan pêk tê, ev roman hatîye wergerandin ser zimana Înglîzî bi navnîşana Endless death Faruq 'Ezîz karê wergerandinê ji bo kirîye.

pêktê ji yan ji "di vegotinkirina pêş wext qalkirina wan bûyerên ku carê rûnedane , yan ji dibi ku di demê pêş de rû bidin"[70]

Wate pêşxerî rêxistinkirin û çêkirina bûyerekêye ku bi şêweyek xwêner ji bo wan bûyeran di demê pêş de rû didin amade diki , ji bo vê tê gotin "piroseyekî ya vegotinkirinêye ku mebest dest nîşankirina bûyerêke ku rû didi yan mebest diyarkirina tiştekê berî rubidi"[71]

Ango dema nivîskarê romanê qala wê diki ku dibi ku rejîma be's tole standina hêzên Pêşmerge û çalakyekiyên çekî kîmyaîwî bi karbînin ew jî bi sûd girtina ji hûner û teknîka pêşxerî di rêgeza vegotinkirinê de nivîskarê romanê bekaraniye piştre jî ev pêşxerîye û buyerên kimyabarana helepçe ji aliyê rejîma be's rûdidi , herweha di mijarekî din de di heman romanê de li ser zimanê çîrok xwendin roman ku bingehê nivîskarên romanê yên bûyeran montac diki û vegotin diki xwêner jî gav bi gav bi germiya buyer û serhatiyan li gel xwede dibit . Dema dibêji: " şeva 14 / 3 / 1988 yek bû ji wan şevên meyên netweî û nexweşiyên gelê helepçe û heya sibehê xew neçu çavê kesê , di hurdeyekê de sedan top li ser erdê diketin mejî ji dengê firoke û topan dipeqiya û dil dilerîzi ji tirsa ...... !! Mehmud û hevalên xwe bi veşartî ji nêzîkve çavyan berê xwe didan hevdû û ev êrîş jî cihê dilgiraniyê bû , Mehmud piştî hemin axaftina wî ji bo hevalan ev bû : liser birîna helebçe hemû alî û partî bejdarbûn û destê wan ji xwînê sore, bila em durbin ji wî guhenî ...... ! di bersibeha wê rojê de Mele Ezeđîn bi Allah û Ekber, di rêw û rêbarên bajarde li gel tîmek ji pasdaran gihiştine nav bajar partiyên Kurdistanî bi arîkariya Pasdaran wajoya başar dan bi germî li sera qelabalexiyê kêşan pêl pêl gel jî bi arîkariya pêşmerge sazî û dezgehên bajar talan kir ..... !! Dîmenê bajar di wan rojan de bi wî şêweyî raxistibûn, li ser hevdû aqil û reftarê gel giştî xera bibû.... , gel dizanî rejîma Be's bi hêsanî nahelweşi û bajarê Helepçe kavil û xira dibi . li gor wan ya baş ewbû ku bajar bi cih bêhêlin û koçber bibin...."[72] Wekî di vê xala de diyare nivîskarê

---

[70] Semîr Ehmed Îbrahîm , *Hunerekanî Gêranewe Le Romanekanî Xesrew Caf Da*, Hewlêr, 2015, Namey Master Kolêjî Ziman- Zankoy Selahedîn, r71.
[71] Ehlam Mensur , *Binyatî Hûnerî Le Kurte Çîrokî Kurdî Da 1970- 1980*, Silêmanî, 1999, Çap Û Pexşî Serdem, r76.
[72] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r574 – 575.

romanê li rêyek ya vegotinkirina hemû tişt dizanî ku zanyarî li ser tevahiya romanê de heye vegotinkirinan bi şêweyekî karîger encam didi. 14 / 3 / 1988 ev pirse ji Helepçe destpêdiki û gel bi şêweyekî aram nikari di wî bajarî de bijî û jiyana xwe bidomîni, ji ber ku êdî rejîma be's wa bi hêsanî dernakevi û dest diki bi kavilkarî û ji nav birina hezaran jin û zarok û zilam ciwan û bi temen û ....... Hwd , di bajar de hewil dihat dayîn ku bi yekcarî bajar ji zindiyan gelê herêmê xelas biki , ji bo gav bi gav bi cih kirina ve nexweşî pilanên Sedam Hesîn cêbe cê dibi digot heya bigihê wêderê wesan pêwîst diki helepçe wÎran biki , ji ber ku buye cihî hevpamanên qirêj û li hevkirina partiyên kurda û hukumeta Iraqê , ku rejîma be's li nav çûbû.

Nivîskarê romanê dixwazi wî fikir bidi ku ger yek ji sedemên ji nav birin û topbarankirina vê navçeyê, kîmyabarankirina helepçe divegere ji bo buna partîyên siyasî yên Kurdî û çekdarî û lihevkirina pasdaran û beşêk li pêşmergeye , wisan li rejîma Iraqê kir bi şêweyê herî hişk êrîş bikin û heya hestê bi karanîna çekî kîmyayî jî pere da çêkirin û bi karanîn. Nivîskarê romanê bi sedemê navlêkirina dû karekter di nav romanê de ku zêdetir cih û çavê me bi yek ji wan dikevit ew jî Mehmud e , wekî kesêkî roşenbîr û kesêkî siyasî bê alî û zêdetir di aliyê nîştmanperwer derdixi pêşberî xwêner û didi nasandin, di vir de em hest bi îdeolojiya dûser dikîn di qalbê karekterek benavê Mehmud de, ku zêdetir kesêkî bîrkirinu nîştman perwerew mumaresey hizir fikirmarksyet diki û bevjî bêhna kadîru kesêkî şoreşgere, lêbelê bi awayek raste rast amaje bi vê nehatiye kirin , lê belê xwênerî jîr û zana dikari hîs biki û vê rewşê bixwîni , herweha di heman romanê de nivîskarê romanê wê di pêşî de bi teknîka pêşxerî ev dabû diyarkirin qala buyerê kirbû , niha wiha rû didi û tê cih û helepçe tê kîmyabarankirin lêdan û bi bêhna sêvê tê lêdan. Bajar dibi gorstana mirovan û dojehek ji mirov û mirovayetî têdeye, asîman bi hêlm û ewrê reş qepat buye û dengê awazê bilbil û rengê şînî asîman cilê reş li xwe kiye matem girtiye û zevî ji rengê zer li xwe pêçaye û kefenê spî dikevi pêşiyê û baweş jib o ezîzan dikevi. Ew roj bi mezintirîn nimuneya dîroka mirovatiyê tê danîn jib o netewa Kurd li Kurdistana Iraqê de ev zulmejî li ber çavê welatên cîhanê hat encam dan û hat pêkanîn. Belê di vê xalê de nivîkarê romanê dibiji: " firokeyên dihatin cih ne dida gel û bi komî dihatin, bare xwe vale dikin û raste rast piştî wan komek firokeyên di dihatin, hinek ji wan bombeyan deng jê nedihatin tenê wizênek

dihat!, partiyên Kurdistanê li gel Îraniyan agadarî vê bûn ve core bombane kîmyayîne û maske liser ruyêhan hebûn , tenê gelê bê guneh bê agehî bû ku wesan dizanê te bombebarane ne dizanîn kimyabarane tu zanabûna wan li ser çekên reş yên komkujiyên kimyawî nebûn ....., Mehmûd û hevalên xwe berdewam kirin û siwarî mekineyê bun ji nişkave mekîne rawesta û bêhna sêvan hat li ser gel , piştî çend demjimêrek qirika wan hat girtin, Mehmûd hemû hêza xwe kom kir hewil da ku bazineyekî bêxi ser mekînê di heman demê de kesekî ji gel arî kir û hawar kirin!:

- kimyaye ……………! Kimyaya reş………..!

Êdî dengê wan kêmbû çavê wan kişan ber bi derve û bêhna wan teng bû û êdî nedikarî gav bi avêjin û di himbêza hevdû de canê xwe ji desdan û giyanê wa ji bedena wan derket.

Mehmûd û malbata xwe bûn yek ji laşên bê rih di nava hezaran laşên bê rih de. Kom bi kom laşên bê ser û ber li gel hev kom bubun, tu kesê ji bilî li Îran û hevalbendên wan pêşbiniya vêçendê nekiribun ku rejîma be's dirinde wê bigihê vê astê ku guh nedi kesê ku gaza kuştinê birêji li ser zarok jin, kal , ciwan û pitikên ku di landikandene !!"[73]

Di vê xala serê de temamî nivîskarê romanê di rêyek ya regeza wesfewe wesfêkî hur bi çavê qemerayê qala van rojên reş yên me diki di dîroka sitem û zordarî sersurmanker ji aliyê Sedam Hisên û rejîma be'se ve li ser Kurda hatiye kirin, nivîskarê romanê bi sedemê hûnerê montajeve dîmenêkî trajîdî ji bo me wesa çêdiki ku xwêner dema dixwîni li ber çav dibite flîmekî sînemayê û mirov zehme bikari xwe bigri beranberî vê zulume bêmafiya li ser netewa Kurda hatî kirin bigrit , tenê nivîskar û wêjevanên kurd di nav gotar û mijarên xwede nasnavê Elî Kîmiyawî bibexşêt bi Elî Hisn Mecîd ku yek ji wan kesan bu ku fermana kimyabarankirina Helepçe dabû û dabû pêkanîn.

Yan ger ev buyerên siyasî di dîroka cîhan û gelê Kurd de bê tomarkirin buye dîrokekî neyê ji bir kirin şer ji bo hemû kesekekî Kurd lêbelê nivîskarê romanê kariye bi

---

[73] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî ,r576 – 577.

şêweyekî hûnerî û bi derketinekî din romanekî serkeftî siyasî û civakî lihev bîni û biki berhem , bi watayekî din nivîskarê romanê bi sûd girtina ji dîroka netewî û bûyerên siyasî şer û tirajediyan , mijarekî serkefî romanekî bi wateya peyv berhem bîni û bibi mijarekî ciwan û romanekî serkefî , ew jî bi sedemê hûnera bilind ya roman wekî , diyalog, wesf, flaş bag û monolog cuda roman biki romanekî siyasî û bûyerên tenê navçeyek bikie bingehê damezirandina roman û têde sekefî ji buye , wekî dîbînîn ku di dawiyê de çawa ev bûyerên siyasî nexweşî derdixi pêş rû xwênerî jê agadar diki dema dibêji "bi dirêjahiya şev rojêk gelê li jêr bombebaran çekê kîmyayî debun, bi yekcarî ruberê bajar bi dirêjî û firehî bi laşê zarok,jin,zilam,kal, ciwan û gist giyandarên din têde belav bûne...."[74] ev bûyerne di bîr û hizirê kesekî Kurd bi mezin, biçuk û pîru ciwanave nikari hemû ew buyerên di tomara jiyana reş biki û xwe jê bê par bihêle. ji ber ku netewa Kurd b itaybetî di Kurdistanî başûr de heya niha jî bûyerên nexweş û stemkarîyekan li jêrnavê cudau bi core cudaye û xwe dûbare dikin. Dirêjiyan heye lêbelê li jêr navê cuda û liser dest û desthelata hukmrana nû ya Iraqê , bêguman gelek xwediyê vê dîrok û çîroke pir ji xem û stem û trajîdyê bit wêje heman rengdana divê bitaybetî roman ji ber ku roman veguhestiye rengdana rewşa jiyana civakê ji bo romanan lê belê bi şêweyekî hûnerî û bi zimanêkî wêjeyane û vegotinkirinaekî gelek xweş( fentezı)

## 2.4 Veguhestin (Terhîl û Tehcîl û Tesfîr )

**1–** bi hezaran mûçexwer dj mamosta, karkerê efser, polîs û yên bêhna Kurdan jê dihat veguhestin ji bo navçeyên ereb û derbe derkirên û xistin jêr çavdêrî sazî û dezgehên be'sêve û li cihê wan de ereb û yên be'sê hat danîn .

**2** – be sedhezar xelkê gundan ji cihên xwe hatin veguhestin û li ser kar û bar û hale xwe hatin derxistin, ber bi başûrê welat ve hatin veguhestin.

**3-** zêdetir ji nîv milyon Kurdê li ser xaka bav û bapîran veguwastin ji bo ser sinûrên Îran bi bi hêceta altbîe alayranye û nasnameya Iraqî ji wan hat girtin dest danîn li ser mal û milkên wan evjî di dîrokda bi tesfîrkirina Kurdanî Feylî tê naskirin .

---

[74] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r 579.

Rejîma be’sa Iraqê hemû hewil dida ji bo netewa wekî netewa Kurd ji nav bibit û ji nexşey êrqê de reş biki, ji bo vê her rojêk bi hêcetên cuda şer û stem li vê netewê dihat kirin , ewbu ku êdi bi kimyabaran û enafalê ne sekinî, vê carê destpêkir bi veguhestina kurda ji navçeyên Kurdistanî bo cihwarên ereban, bi wateyek din dest bi bi erebkirina navçeyên kurdan kirin. Dest bi veguhestina kurdan kirin jib o navçeyen emar, kufe û navçeyên naverasta Iraqê, gel dihat veguhestin, tenê xelkê er sînor û li gund dijîn kurdên vediguhestin bajarên hewlêr,silêmanî û dihok taweku ji nêzîkeve çavê wan li ser wan bit. Ji bevjî bi hezaran xan û hawelatyanî kavil kirin ji navê birin û ser û saman û mala xelkekey legel zevî rast kirin û ji nexşeyê hatin reşkirin, ji ber jî gelê wê rastî rewşekî derunî ya nexweş û tejî ji trajîdî buye , herkesekê ji kesên Kurd ev bûyerên nexweş û ev sitme di bîr û hizira xwe tomarkirinbû , buye beşêk yan bîranînanekî nexweş û trajîdî di ferhenga jiyanê de heya niha jî bermayên vê şewitandin û kavilkirina van navçeyane mane, xaniyên wê wek kelhekî dîroka bi çolî, xirabûyî û şewitî maye.

Ango hemû ev karesata nexweş û ne tihal li ser vê netewê de hatiye, bune mijar girtina çendîn vîdyo û di nav kurdanda xwe nîşan didi, reşkirin û perde bi serde girtin karêkî zehmete bitaybetî ji bo kesêk yan nivîskarêk ku bi çavî xwe yek ji bibi li şahed halêvê buyerane û di nav dae jiyan kiribi, biribi qubabiyê vê karesatê û dilşewitîna vê netewêbit. Ji bo vê wêjeya Kurdî bi hemû corên xwe ve vê rastî û heqîqetê derdixin, ku wêjeya kurdî tenê bi mijarek çîrokî û romanên sîyasî beş û rehendîê vê siyasete û bûyerên siyasîne û buye beşêk ji dîrokî jiyana wan û di karu barê rojane de jî rengê dewletê hest bi lêdanê diki , di romana kurdîda bitaybetî li başûr de li ber wê roman fre deng û reng û fre teknîke nivîskarê romanê de di dema vegotinkirinê de sûd ji monolog yan flaş bag wergirtine. ji bo vegotinkirina ji bo demboriyê , her vegotinkrinek jî ji bo raboriya gelê kurd ew rastî xistina aliyê siyasi di nava vegotinkrina buyerê de buye û qal û xwestekên siyasî pêktîni. Ji ber ku raboriya gelê Krud tejiye ji xwîn, trajîdî, sitem, zordarî, şewitandin, kuştin , birîn, kavilkarî û qirkirina civaka kurde, ji bo ev romanejî bibine romana siyasî milbimilê tez û mijara civakî. Rizgar kerîm di romana Mergî Bê Kota di gelek cih û dem ev veguhestine kirine hêvênê vegotinkirinê û xistina aliyê çendîn dîmenê ciwan di nav romanê de bune sedemê bi hêzkirina roman û girêdana

bûyeran bi hevduve. Nivîskarên romanê liser bingehê vegotinkirina xana çîroka roman ku vegotinkirina hemû tiştane dibêji: “nexşeya Helepçe ji ber bi dest hatibû danîn, cihî leşkerî bi pênûsê stur hatibûn kêşan û piştî wê li ser gundê, cihên ku şênî lê zêdene biryar digirtin. Ew cihên durbun ji qezaya Helebçe û ew gundên dikevin ser sînor. Ev ji weke qona destpêkê ya pirojeya dagirkeriyê xistin nav bername. Li pey hev kombûna wan bi lez li ser berqiyekê bi hêzên parastin û sîxurên Silêmanî, ew jî ketibûn ku jib o fermana Sedam Hisên bi cih bînin. Li ser berqiyê wiha hatibû nivîsîn; "biryara taybet ji bo dagirkirina gundan piştre diyarkirina ji ber sedemê serhildanên bi çekdarî ku têde bi hêçet hatibû destgirtin ku ew gund bun cihên pêşmerge û stargehên wan. Şer û pevçonan dixin nava navçeyê de…."[75]

Di vê xala serê debînîn çawa çîrok xwêner bi hurî gava yekem biryardana veguhestin û çolkirina gundên dewrûberên Helepçe û ew cihên liser sînurin û metrsiya şoreş û çalakiyên siyasyan lê dibi bi lêdan bên çol û xirabikin. Nivîskarên romanê gelek bi şêweyekî ciwan û bi wê drêjîyê danûstandinê legel bûyeran diki û naxwazi bi berî demê vegotinkirina nav roman bikevit û zû bi zû hemû tiştik bêxi ber çava û qala wan biki, ji ber ku eger wisa biki xwêner zû dizanî kotayî roman çawaye û wê encam çawabi.

Di heman roman û di cihekî din de vegotinkirina bûyer û serhatiyên nav roman de jî bi vê mijara didi û qonaxên bi cih anînê dibêji: "berprsê parastinê yê helepçe muxtareyên xwe komkir bi çavtirsandinê ji ware got : hukumet biryara veguhestinê ya van gundane daye û divê hun jî arîkariya me bikin ..... , hun bi xwe jî agehdarê rewşê bûne û çeteyên ku xwe bi navê Pêşmerge nav dikin di vê yek dû meheda çawa ji wan gundan dest dirêjî dikin ser cihên giştî û dest ji bo mala gel dibin , bi aqil û zanabuna xwe wesan dizanin ku wê hukumet bi wan biruxe. Mele Mistefa zelamên wan qe ji bo wan nekirin….?! Ji bo vê min ez daxwaz ji we dikim ku hun arîkariya me bikin û dilsoziya xwe ji bo mirî nîşan bdin"[76] wek dibînîn rejîma be's tenê xwendina Kurdî di dibistanan de qedexe kir û dest bi reşkirina û tunekirina çand û zimanê Kurdî kirk û tirsa

---

[75] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r376.
[76] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r377.

wan temamî ji pêşxistin ,peşketina û bi hêzbûna şorş û rêxistina neteweya Kurd. Rojane çendeha ji gel digirtin û biryara sêdarê ji bo wan dihat dayîn. Ji ber vê hestê kurd û hebûna gelê Kurd ji aliyê Sedam û darû destê gunekî mezin xiyaneta welat bû. Di cihek din de nivîskarê romanê yek ji karekteên nav roman de karesat divegerî wî hale deruniya xirab û hestê nexweş yê gelên din, piştî wê awerkirinbu.

Bi zordarî veguhestina ji bo cihek din û jiyanek din, berî wê nemane benda vî core jiyanê ji bo ev gelek zehmete û nexweş buye her rojek ya wna bi vî şêweyê mirinê buye, ku li ser zimanê Mam Abdullah vegotin diki û dibêji "lê belê destê pîlan gundên şêwandin û li pêş malawan Mizgeftek teqandin nu dest bi mal kavilkirinê kirin…..! piştre tîma leşkerên hişk li cihê wan hatin danîn.

Ev corên hesta li ser zarî mam abdullah û xêzan, mal, zarokên wî dihatin ji derve Mehmud û Sofî jî keyfxweş dibun û hêviya wan derdiketpêş ku di demê pêşde dibeku vegerîn li ser ew xaka bav û bapîran....."[77] yan li dîmenêkî dinda dibêjit: "rejîma be's û zelamên wan berdewam di nava şer debûn dijî gelê Kurd , Helepçe ji her çara aliyan ve hat zefkirin , ew gundên dorê yên ser sînûr dihatin veguhestin......"[78] di vê mijara serêda li rêyek ya vegotinkirinê li ser zarî karekteran hest bi vê deruniya ne aram û nexweşey kesekî kurd dikîn û dezanîîn netewekî wek gelê Kurd li başûrê Kurdistan çî bi serhatiye çawa li jêr qanûna zulum û zordarî rejîma be's jiyan û jiyanya beşek buye azar û nexweşî , nivîskar sued ji kesayetê, olî û dab û nerît û wêneyê kesî olî û zealmên rihspî ditiye. , wêney karekterên nav navromanê liser bingeh girtiye, ji ber ku wêney karekteran netenê wêneyekî kaxezî û karekterêkî ser kaxez û nav mijarê romanêne, di heman demê de helgirê civakê êş, azar û derûniya têkçoyî ,ne aramî neteweyekê û daxwaz hezaran kesekî netewekê derdixi holê , bi navê wan dixwazi û di axivi , ger ku ew kesî kesek û karekterê nav romanin ,

---

[77] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r 181 -182.
[78] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r 379 -380.

## 2.5 Rêketin Nameya 11 Adar 1970

Li pey hev berdewam buna şer û neweşî di navbera rejîma be’sa Iraq û bzutnewey rizgarî xwaza gelê Kurd , herweha berdewam buna êrişên yek bi yek yên rejîma Be's ji bo ser kozik û baregehên şoreş û serokên şoreşa îlonê ku Mela Mistefa Barzan rêberayetî dikir di dawiya salên 1940 – 1946 şoreş tunebû partiyek nû hat damezrand bi navê Partî Demoqratî Kurdistan li başûrê Kurdistanî Iraq . Rejîma Be’sa Iraqê hemû hewildanên wê ew bû ku vê şoreşe ji nav bibit û tune biki , piştî çendîn sal şer û nexweşiyên di navbera aliyê rizgarî xwaza gelî Kurd û rejîma Be’sa Iraqê gihiştin van encamey ku şer li berjewendî tu aliyekê de nîni , ji bo vê biryar hat standin û nameyek ya li hevkirinê hat derxistin. Di 1/ 3/ 1970 benavê hevpeyaman 11î adar carêkî din be's şerkirin li dijî kurd ji windakirinê zêdetir tiştek neketiye destê wan. Bi neçarî di 11 adara 1970 biryara dayîna otonomiya kurdan bi demê 4 salan hat danîn ji bo bi cih anînê, di vê demê de Be’s ket xwe bi hêz kirin û pîlangerên ji bo ji navbirina serokên Kurd di 29.09. 1797’an de 11 mamostayên olî ku ji necef û Kerberla hatibun ku çavê wan bi Mela Mistea bikevin li Hacî Omeran, melayek ji wan dezgehekî li pişt hatibû girêdan pişt dabû teoriya Barzanî . du wesayît jî du bombeyên gelek dirêj li bin qayîm kiribûn teqiya. Lê belê pîlana be’s serî ngirt û Barzanî tenê birîndar bû.

Di 11 adar 1970’an de di navbera Mela Mistefa û Sedam Huseyn de hevpeyamanek hate morkirin. Ev ji yekem car bû di dîroka nû dewletek xwediyê desthilat bi bengeyekî yasayî ku mafê siyasî yê netewa Kurd bidin.

Piştî gftugoyekî çar sala di navbera hukumet û şoreş li hemû astekê de û bi bejdarî û bgre bi dest têkdana zilhêzan di sala 1974 parsengî hêz bi aliyê hukumeta be's şqadewe û kar neyarên ji nav bibit û desthelata xwe qayîmtir biki bi taybet piştî bilindbûna meft neramnerô varên din û girêdana hevpeymana dostane ya legel yekîtiya Sovyet di sala 1972 bi wê jî be's hêdî hêdî xwe bi cihkirina di xalên rêkeftinnameyê de hatiye dizîn. Piştre dest bi çendin pilan û terorkirin û xwekujiyên dijî Barznî û hevalbendên wî kesên li dora wî bi yekcarî hemû dergehên guftugokirinê girt û şer li dijî Pêşmerge ragihand.

Ev rêkeftin ji bo demekê xweşî û şadî ji bo netewa Kurdan anî xelkê dest bi şahî xweşî kir. Ji ber ku rêkeftiname ji bo netewa me giringiyekî gelekî zêde hebû. Ji bo vê yekem car bû rejima hukumeta li Iraqê mafê netewa Kurd nasbiki. Lê belê ev xweşiye zêde ne ajot, ev rêkeftinnameye di nava wêjeyên Kurdan de rengê xwe diyar bû. Di na romana siyasî Mergî Bêkota ya Rizgar Kerîm yek ji dive de tê wateya ku ev kare me li ser kiriye û me helbijartiye. Di gelek cihan de ev hatiye diyarkirin û wekî buyerekî siyasî bi nirx di dîroka gelê mede xistiye ber çavan, nivîskarê romanê liser zimanê karekterê serekî yê romanê yê bi navê Mehmud  ku kesêkî roşenbîr û kesêkî zîrekbuy li gel hevalekanîşî bîrubuçunî cuda bû , xwediyê fikir û bîrî şiiyetê bû , ji bo vê dibêji "ji bili drêjbûna ewqas rêkeftin bi xwe cihê  hezar pirsyarên corbe cor bû, vî demê gelek,  fireh û dûr ji bo aştî û bicih anîn rêkeftina 11 yê adar bû ji bo...?! Ne hukumet deng diki û serokên şoreşê ...

- Birêz Xwarehm, bi van çend salên giftigu diyare  ku hukumetê çav lê girtû, ango çi hat kirin divî demî de ji bili tiştên rûkêş û zêde"[79]

Wek di vê xalê de diyare nivîskarê romanê binavananî wê  rêkeftinnameye û qalkirinê vegotin diki  ji bo salên 70’ yên borî  , bi sedemê bi karanîna  hûnerî flaş bag û liser zimanê civak karekterêk di navr omanê de   ku hinek ji wan karekterê serekî yê romanêne , wekî Mehmud , Xwarehm  ku gelek bûyer vegotinkirinên liser destê wan legel Mîrza navêk divê  bazneyê derdikevi , seraxaftin û xwesteka hemû meclîs û kar û kombunên qalkirina  vê rêkeftinameyê bû , ji bo vê nivîskar jî ji ber giringî û aliyê dîrokî û siyasî bû  ku ser kirayeta şoreşa Îlonê bi dest anîbû ev rêkeftinameye bû , ji bo vê nivîskar van bûyerên siyasî vale  neberdane û xistina nav mijarê û mijar  dane  hezkirin . Herweha di heman roman û di cihêkî dinda dibêji "birêj cafir ..... rêkeftina  şoreş û hukumet ne hêsane pêwîstî bi demekî gelek heye, heya bawerî bi hevdû bînin di demboriyek jêre pêwîste.

- Cafir zêdetir mijar  kurkir û  got :

---

[79] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî  Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r224 – 225.

**-** Qurban mafê kurd diyare ..... Daxwazên me li mêje xistiye ber destê hukumet û herdesthelatêk li bexda kursiye bi rêvebirina girtibi dest beçavê xwe ev daxwazane dîtine û piştre jêgerane"[80]

Wek debînîn ku bi sedemê teknîka hunerê diyalog di navbera Cafr u Xwarehm vegotinkirinêke hatiye encamdan li ser û bend û xalên rêkeftinê niqaş dikin, bi pêwîst û giringî dizanÎn ji bo rizgarbûn ji pirsgirêk û neweşî û şer û çareserkirina birînên xelk û Kurdistanê. Pêwîste ev rêkeftine wekî xwe û bi bê kêm û kurtî ji aliyê hukumeta bê bi cih anîn ji aliyê rejîmê Iraq û dawî li zulum û stem û dîmene trajîdiyên Kurd bên.

## 2.6 Şikestina Şoreşa Îlona Sala 1975

Piştî pilanêkî nav dewleta di navbera Iran û Iraq li Cezaîr li 4 / 3/ 1975 rêkeftinnameyê hat morkirin Kurd û şoreşa wa bûn qurbanê parastina hevsengiya navbera dewletên zilhêz yên navçeyê , giringtrîn xalên rêkeftinameyê bi kurtî evanene :

**1–** diyarî kirina sînorê zemînî li navbera Îran ê Iraqê .

**2—** diyarî kirina sînorê avê navbera herdû welatade .

**3–** hişkirina parastina sînorê navbera herdû welata

**4-** bi cihanîna xalên nav rêkeftinameyê, rakirina tiştên rêkeftinameyê dixin xeteriyede .

Piştî 7 / 9/ 1979 Ehmed Hesen Bekir dest ji tevayî karûbar siyasî û leşkerî û Sedam Husîn buye serok komarê Iraq û dijberî xwe beramber rêkeftinameya 1970 nîşan de evjî buye destpêkek ji bo derketina şer . Ji ber sedemê xwepaşde dayîna be's carêkî din şer destpêkir di navbera Kurd û dewleta Iraqê de ku êdî demê serketina şoreşê bi dawî were. Di encamde Sedam li gel şahê Îranê rêkeftinameya Cezayîrî di sala 1795 bi nave Cezaîr hat mohrkirin , destê li hinek cih û avên Iraq di şet al 'erb helgrt ji bo Îran , Îranê jî li jêr vê rêkeftinameyê û di berjewendî xwe giştî arîkariya ji bo şoreş dida birî û bi serokê şoreşê got yan biçin Îran wek penaberan bi cih bibin yan ew wê sinur bigrin û

---

[80] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r226.

li navbera Iraq da ew çî dikin têkiliya bi Îrane ve nîni , bi vê pilana navdewletî şoreşa îlonê ji nav ço û dawî lê hat , piştî rêkeftinameya cezaîr di navbera Iraq û Îran Kurd û kurdistan û şoreşê rizgarîxwaza Kurd di başûrê Kurdistanê de rastî xirabûnê hat û ji navçûn û bi hemû şêweyekî êrîşî kurdan kirn û qir kirin û êrîş destpêkirin. Ji bona Kurdan jî tiştek bi navê rêkeftinameya 11 adar a 1970 , hukumeta Iraqê we paşde kişand û pişt da Kurdan , carek din şer, kuştin, talan û malwêraniya Kurdan destpêkir ew agirê bilind yê şoreşê hat vemirandin û ji navço lê belê şona wê her maye , hestê netewî roj bi roj mezintir û sturtir dibû ji bo tolgirtinê.

Ev bûyerên diltezîne di dîroka gelê Kurd gelek bandorek mezin hebû di hemû aliyên jiyana Kurda reng daye , ne tenê wêje yan tenê di layenî abûrî û olî û civakîde .... Hwd , de bandorekî gelek xirab li ser Kurdan hêla.

Hemû ew romanane ku em di lêkolînên xwede qala van bûyerênyan kirine û giringî dane , lê belê ji hemûyan zêdetir romana Rizgar Kerîme e , ku romana Mergî Bêkota ye , ji ber ku romanekî ji lêvan bi lêve ku ji siyaset û buyerên siyasî yên netewa Kurde , ji bo me ev gelek başe ku buyer û serhatiyên me bên dokumetkirin û zêdetir di vê romana werbigrîn û bixine ber çavan li ser zarî Xwarehm karekter , ku yek ji karekterên serekî roman û di destpêka roman û heya dawî xwedî hebûne gelek bûyeran li ser ziman tê vegotinkirin.

"Di destpêka sala 1974 şer di vê ciwan dest bi Pêşmerge bikin Vidalcu yan ji bo Helepçe û ref ref gel fêrî rênmayîyên dermankirina yekem firaguzerî ..... , di wî demî de bû parêzgarê helepçe têkiliya bi hukumeta merkezîye nema navendekî şoreş û pêşmerge bi rêvedibir ...., rejîm di wan çar salan de bi guman bu ji bo hestê netewiyê Kurdan ji bo ve jî xwst hêz desthelata xwe bi hêsanî zal biki li ser navçekanda lê belê her çend hewil dida hêzên wan li beramber hêza Pêşmegeda xwe ne digirtin di çeperên şerde bindiketin jimareyekî zêde kuştî û birîndarên wan çêdibun ...."[81] Di vê xala de nivîskarê romanê dixwazi nuçeyek nexweş bidi xwênera ew jî ber helweşina rêkftina 11 adar sala 1970 qal dikirin ku piştraste ev rêkeftine ber bi helweşînêve diçi û ser û

[81] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r259.

êrîşên rejîma sedam berdewame û heya tê nav çeberan aloztir dibu û rewş zêdetir xira dibi bitaybetî di navçeyên sînorande , herweha nivîskarê romanê gelek bi hurî bûyerên şoreşî îlonê gav bi gav derdixi pêş tenê qala hinek tişta diki li rêkeftinameya dîrokî de hebûna wê nemaye û hestî pênekirin , nivîskarê romanê bi sûd girtina ji hunerê wesf vegotinkirinê encam daye bi sedemê cihnavê m , min dibêji "ew çaresere jî ku Sedam danîbû cihê sewda gerî û çawa û çima çênebû .... ! li dest devjê berdan rejîm li şt Al'erb Sedam got : ev rêkeftine jî di vê qonaxeda dawî de pirstirêka herî mezin ya hukumetêye û heta heta wê şoreşa Kurd wesa bimîni .......!! Yên ku amade jî ti fikir û pêşniyarek ya wan nebû tenê razî bûn û piştgirîkrin bu , ew rêkeftin jî berê ji nav çobû, li ser destê xwe zû hat çareserkirin û serokî Cezaîr ji bo xwe têkiliya xwe ya xweş di navbera herû aliyan de xwe kir nûnerê herdu alîya !!"[82]

Bi vî şêweyî rêkeftina di navbera Iraq û Îran li Cezaîr kirin ji bo dana şt al'rb bi Îran û guhertina navê wê bi şt fars , bi mebesta kuştin û ji navbirina şoreşa Kurda li başur bi serokatiya Mela Mistefay Barzanî , bi vê jî xewn û xeyalên dewleta Kurdî û bidestanîna armancên kurd û netewa kurd rewş hat guhertin û gel penaber bûn û Pêşmerge jî belav bûn , li pey hev yên çek radikirin dihatin giritin ,li sêdarê didan û dihatin kuştin ji aliyê rejîma be'se ve ev pilan û nexşeya Sedam Hisên serî girt û êdî tiştek nema binavê rêkeftina 11 adar û xalên wê helweşiyan , bêgumtn ji aliyê rejîma be's bi serokatiya Sedam hat encamdan carêkî din şoreş û serokên Kurd rastî çiya û penaberiyî bun û hestê şoreşa rizgariya Kurdistanê hêdî hêdî tune dibu û hemu tişt ji nav diço.

Hest û dil û deruniya kurd û netewa kurdî bi temamî şêweyê xelk hest û xwesteka gel di gund, bajar û bajarokan de roxa, navçeyên kurda rastî nexweşî bêmafî, rewşa xirab dihatin. Di kesayeta mirovê kurd de tu ronahî û xweşî ji bo mirovahiyê nehiştin. Tiştek nema bi navê maf, armanç û encamdana şoreş û netewa Kurd. Lê belê ev buyer nebû sedemê lawazkirina hestê netewayetî Kurd û Kurdbûn zêdetir pêşket heya dehat Kurd fikra wan mezintir debû beramber bi rejîma be’sa Iraqê .

---

[82] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r340.

Nivîskarê romanê ji zimanê Mehmud ku yek ji li karekterên roman qala hest, dil û deruniya gel diki û dibêji : "niştecih ji rexmî brîndarbûn bi wan reftarey rejîma şah helwêstî nemirovî û bi şêwazêkî nû dilgerm bûn ji bo şoreşê .... ,wê roje gel bi zehmetî ji bo gerana nuçeya rêkeftinameya şah û Sedam bi aşkire hat ragihandin mezin û biçûk tirsa girtin û dest bi girînê kirin .... girinekî ji kur û êş jî li gelbu ..... bê hêvîbun serî kêşabû li ser hemû aliyekî ware nû yê şoreşa kurd û xem û êş cardin girtibu….! Çawa dibi ku ev şoreşa mezin bi rêkeftinekî wisan lê bê ku wekî berfekî ber biharê biheli ku 50 hezar pêşmerge ji vê şoreşê dest kêşan û runiştin?!"[83]

Ev diyardeya siyasî û ev buyerên siyası ku bune sedemê nehêlana hêviyê û şkestina deruniya gel di nava civaka kurde bi mezin, biçûk,jin,zelam, kal û ciwanan de û wesan kir ku gel bi bê razîbûna xwe biryar û fermanên hukumeta be’sa Iraqê pêkbînin, serok û pêşngên şoreşê jî bên radestkriia hukumetê bi vî awayî şikestina şoreşa îlonê hate ragihandin.

## 2.7 Şerê Îran û Iraqê

Di 22 îlona sala 1980 hêzên leşkerên Iraq bi dirêjahiya sînur êrîşek berfireh birin li ser îranê û li 8 / 8/ 1988 de şer rawestiya , bi kuştina sedan hezar ji ciwanên Iraq û Îran û wêranbûna dehan bajar û proje û ji destdana çavkaniyên Iraq û hemû bune xaka şer û êdî bi kêrî tiştekê neyên. Sedemên sereke yên vî şerî wihane;

**1 –** pevçonên ‘Ereb û fars li ser desthelat û zalbûna netewî li ser navçeyê de

**2 –** pevçonên mezhebî û olî

**3 –** piştguhkirina rêkeftina cezaîrê ku edî li ser ne disekinîn

**4 –** xweparçekirina Iraqê di nava xwede bi taybetî bi bikaranîna çekên komkujiyê yên kimyayî.

**5 –** dîgdatorbuna serokên rejima û hertişt di destê xwede girtina wan.

---

[83] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r341 – 342.

Ev şere şerêkî navxweyî bû li navbera herdû welatê Îran û Iraq ku şereke nêzî heşt sala girt , buye sedemê kavilkarî û bê ser û cih kirina hezaran leşker ji herdû welata, bi dîlgirtin û li sêdaredana hezaran kes , herweha ev şere buye bermayekî hûnerê şer û trajîdyayekî şer di bir li bîrewera herdû neteweda û tenê di qada wêjeyî de rengî dewletêve û gotin li ser kirin bitaybetî di romana kurdan , ji ber ku cihê vî şerî û tunebûn li ser xaka kurdanbûn. hem li başûrê Kurdistanê – Iraq hem li rojhilatê kurdistanê - Îran bit , nivîskarê romanê Bextiyar Elî di romana Cemşîd
Xanî Mamm herdem bayê ew li gel xwe dibir bi şêweyekî hûnerî û bi.

Teknîkêkî gelek nû û bilind ev bûyerên din hêvênê beşêkî zêde yên bûyerên vegotinkirina nav romanê liser zimanê karekterên sereke yên wek Simayîl , Cemşîd Xan û ew di vê vegotinkirinê de dibêji : "kar di wê şevê de li aliyê serbazîyewe bi serkewtnêkî bê wêne piştre hat , mamê min di bakurewe temamê wan xalê veşartî û kozikên Îranîniyan dîtibu dive ber bi sibehê ve destbi êrîşê bikîn , wê şevê ber bi sibehê ve bi dirêjahiya roj topxaneyên Iraq û frokên şer leşkeran ew cihe cihen veşariyên xurt ku mamê min cemşîd dest nîşanî kirbû , we wesan kir pilana Îraniyan ji bo demekî dirêj bê paşxistin , em û mamê min cemşîd di gelek şerê giringe de role me hebû "[84]

Karekter Cemşîdxan ji aliyê roman nûsewe rolî kesêkî sîxûr û amêrêkî keşf kirina nexşe cihê giring û veşartiyên şerî Iraq û Îranê dabuyê , ku ev jî tiştekî nûye di romana Kurda de legel wêjî qala malwêranî û akam û derencamên xirab yên vî şerî diki ku buye sedemê ber bi jorve çûna Iraq û wate şoreşe kurdan li pişta xwe hêla û xeta 36 derket . Nivîskarê romanê di romana Cemşîd Xanê Mamê min ku herdem ba legel xwe de dibir, karekterê sereke yê roman Cemşîd Xan ku qala şerê Îran û Iraq diki , ji ber ku ev romana romanekî liser bingehê bûyerên siyasî damezraye , temamê bûyer û serhatî li

---

[84] Bextiyar 'Elî , *Romanî Cemşîd Xanî Mamim Ke Hemîşe Ba Legel Xoyida Deybird*, Silêmanî, 2010, Ç1 Çabxaney Karo, r32 - 33.
Bextiyar 'Elî, Roman nivîs û şa'îr û rewşinbîrê kurd e li sala 1960 li Silêmanî ji daiyk buye, yekem berhemê xwe bi navê Qesidey Nîştîman li sala 1983 nivîsye û yekem roman jî bi navê Mergî taqaney diwem li heman sal da nivîsiye, Bextiyar 'Elî xwdanê çend qesîde û roman û witar û komele şî'r û korr û semînar e , li sala 1994 de Kurdistan bicih dihîle û berê xwe dide diyasporayê û li Elmanya yê nîşte cêh dibe , berhemên herê diyar ya nivîskarê: Qesîdey Nîştîman, Diwahemîn Henarî Duniya, Şarî Mosîqare Sipiyekan, Cemşîd Xanî Mamim, Xezelnus û Baxekanî Xeyal, Ewarey Perwane, Koşikî Balinde Xemgînekan, Keştî Frîştekan.

ser zimanê cemşîd xan hatiye tomarkirin . Bi watayekî din çîrokxwêner bingehê romanê Cemşîd Xane belê di vegotinkirina bîranînên Cemşîd Xan de dibêjit "di vê demê de wezîrî parastinê xwe bi nameyekî veşartî serkirey hemû feyleqên di çîrokê de bi bawer agehdar kir giringî mamê min ji bo leşkera bi corek bû ku divê tenê di dema êrîş û li rewşên gelek giring û tenganeda bi kar bînin ..... di şevekî gelek dreng de siwarî maşênêkî leşkerî wek qefesê kirin û ber bi başûrê welat birin, wê şeva direng û tarî gihişt cihekî dur û nenasi , ji durve dengî topxaneyên Iraq û Îran dihatin, me bi nêzîkbûna dengê topan me dizanî ku em nêzî çeperên şer dibîn…. Di sibehekî zû de feramndarekî mezin pêşwazî li me kir : serfermandar li benda meye ..... Guman heye sibe şev hêzên Îran êrîş bikin, lê belê ew hêza heyî dibin qontirola wan deye kêm û biçûke , ji bo vê dixwazin piştrastbin gelo Îraniyan li pişta çiya xwe vaşartine şêweyê xwe bicih kirina wan çawaye"[85] Wek di vê xala serêda diyare nivîskarê romanê bi şêweyekî hûnerî li rêyek ya nivîsîna bîranînên cemşîd xane û qala serdemekî mezin ya dîrokî ya cîhanê diki , ku şerê Iraq û Îrane , ku buye sedemê kuştin û malwêraniya hezaran malbatên Îranî û Iraqê,şewitîn û kavilkariyek zêde di navçeyê de , wek dîbînîn ku nivîskarê romanê tenê dem û navê şer ji cihê buyerê û dîrokê de girtiye , ku xwe ji rêyek ya teknîk û hûnerî vegotinkirinê û karîna bi awayek balkêş bi zimanekî bi corekî din û di jêr ronahî û bi karanîna mîkanîzmeya ba û firînê de qala buyer û serhatî û kavilkarî şerê me vegotin biki , ku evjî teknîkêkî nû û şêwazêkî nazike di romana kurđî de û ev teknîk û şêwazê hunerî berî wê kar liser nehatibû kirin jêre nehatibû nivîsîn , di vir de dest rengînî û hêz û qudreta nivîskarê Romanê li ser vegotinkirina roman nîşan didi, ji bo vê tê gotin nivîskarê romanê bûyer karekterên ji cih û rewşa jiyanê werdigrit û cîhanêkî din û warekî hunerî di afirîni. Herweha Bextyar Elî di romana Bajarê Mosîqare Spyekan jî de ev bûyerên siyasî derxistiye pêş qala kiriye , dema çîrokxwêner qala Dalya Sîracedîn diki ku yek ji karekterên sereke ya romanêye û dibêji: "ku şer dawî hat , çend hefte bû Dalya li aliyê Mûsay Babek kar dikir , dawiya şer têr û tejî nehatibû pêşbînîkirin, Îranî yek ailiyê qebûlî yê nêvdewletî pejirand ,di çeperan de bi malavaniyekî zû ne asayî ku qet li gel wê rika kurde nedigunca xwe paşde kêşan, di her cihekê de bostek hatin pêş û paşde vegeriyan, paşveçona Îraniyan wehmekî bi tirs li ser sînoran bi cih hişt, li gel

[85] Bextiyar 'Elî , *Romanî Cemşîd Xanî Mamim Ke Hemîşe Ba Legel Xoyida Deybird*, Silêmanî, 2010, Ç1 Çabxaney Karo, r28 – 29.

têkçûn wan de termê bi hezaran leşkerên hatin kuştin û di çeperan de mayî helgirtin û vegeriyan ji bo mala xwe di vî sînorî de tiştekî seyr despêkir"[86]

# BEŞA SÊYEM

## Têkiliyên Di Navbera Romanên Siyasî û Corên Sereke û Teknika Hunerîya Roman de

### 3.1 Têkiliyên Di Navbera Romanên Siyasî û Corên Sereke Yên Roman de

Roman nikari bi şêweyek giştî bê nivîsîn. Ger ku ev rêgez û corên serek têde nebin. Bi wateyekî din roman bi giştî romanên siyasî bi taybetî bêy van corên sereke nikarî bigihje serkeftinê û nikari bibi ramanek temam û xwedî giringiyek serkeftî. Di heman demê de jî vî corî wesan kiriye ku di serdema me de bi giringiye mezin cih bigri û berdewam biki û ber bi pêşve biçi. Giringiya vî corî jî di têkiliya wê bi jiyana mirovan ve heye ku qala hemû pirsgirêk, êş û azarên mirovan diki. Di heman heskirin û xwesteka xwendinê bi xwêner re çêdiki. Giringiya wê radixe liber çavan.

Bi hemû corên din yên wekî Cih, Dem, Buyer, kesayet, vegotin qalkirin û Ziman wekî bazinekî û bi hevdûve girêdayî di xizmeta avakirina xeta sereke ya romanêne. Herwiha di nava pêkhatya roman de dibi sedemê rêgezên pêkhateyên din yên roman bi hevdûve bêne girêdan û ber bi pêşve bibit. Wek Cih, Dem, Buyer, guftufo û menalog..... hwd.

### 3.1.1 TêkilIya Di Navbera Roman Siyasî û Karekter de

Bê guman karekterê di nava roman de xwedî cihê û meyla herî giring ya roman ye ku di bingeha romanê de jî cih digre. Ji ber ku bê hebûna karekter tu hebûn û çawaniya wê diyar biki wekî karekter ku bikari buyeran sererast biki û bi awayek baş

[86] Bextiyar 'Elî, Romanî Şarî Mosîqare Sipyekan, silêmanî, 2003, Çapxaney Endêşe, r 437.

bidi diyarkirin û bikari wesfekî hunerî û îstatîkî bidi rêgezên din yên wekî Cih, Dem, Buyer, kesayet, Gêranewe gerandın ‘ê. Ger ku em mijara roman bigrîn dest ji hemû beş û mijarên din zêdetir giringî didi mirov û têkiliya mirov ya bi xwezayê re, ji ber vê jî berçavgirtina kesan zêdetir di nava xwe de digre. Ji ber ku "karekter yan jî kes rengdan cîhanî ya navxweyî ya berheman, şêweyê pêwîstî, daxwaz,xwestek û nêrînên li ser tiştan û mirov, ev hemû evane rengdan û xemilandina wan buyeranin ku di wir de xwedî rolin" [87]

Zimanê karekter yan kesayetî di nava zimanê rojane yê gel de bi awayek gelek berfireh û zêde tê bikaranîn. Wateyên cor be cor di nava xwede digri. Peyva karekter yan kesayetî wek "Elpurt dibêji; peyva kesayetî bi îngilîzî bi peyva Personality bi latînî bi peyva personalitas di serdemên navîn de hatiye bi karanîn. Lê belê di latîniya kevin de peyva Person hatiye bi karanîn"[88]

Berî serhildanên Romayîyan peyva karekter hemû di peyva qehremantî de hatiye komkirin, desthelat û zîrekî bi giştî dayîne qehreman anjî pehlewan. Bi vî awayî karîye hemû kar û buyeran biki, di heman demê de kariye guhertinan li ser çêbiki, ji ber ku karên wesan kiriye ku yeki ji milit ji rêzê nekari wî karî biki. Ev pehlewane jî gelek car " li ser şêweyê xweda, dêw û gelek bunewerên din yên xeyalî ve hatine diyarkirin. Wek gilgamêş, Enkido û xumbebe di destan gilgamêş da. Her wiha ew pehlewane quwetek ya wan ya zêde heye ku di kesek asayî ji nav gel de ev êz nîni. Wekû Îlyada û Odesa Homeros, hindek ji van di rêza xwida û xwedawendan debûn. Wekû xwida Zeus û Poseydon û yên din" [89]

Li gorî ditînê nû yên rexnekirinê de xwêner rolekî giring heye li ser awênkirina karekter. Ev bi ji ber sedemê ew rewşenbiriya heyî ye. Li ser vê mijarê Flip Hamun wiha

---

[87] Necim Xalîd Necmedîn Elwenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdîda Janî Gel- Şar-Raz Lêkolîneweyekî Tiyorî Praktîkî Rexneyî Ye*, Hewlêr, 2003, Têzî Diktora, Kolêjî Adab- Zankoy Selahedîn, r85.

[88] Semîr Ehmed Îbrahîm , *Hunerekanî Gêranewe Le Romanekanî Xesrew Caf Da*, Hewlêr, 2015, Namey Master Kolêjî Ziman- Zankoy Selahedîn, r26.

[89] Ceuher Şêxanî, *Binyatî Karekter Le Romanekanî Hisen 'Arif Da*, Hewlêr, 2014, Çapî 1 Çapxaneî Rojhelat,r15-16.

dibêji; " karekter li encamdana dubarebûna pêkhateyên nû û zêdekirina xwêneran de ku hurahiya wê encam bidi"[90]

Li gorî vê xwêner li gorî asta bilindbûna rewşenbîriya xwe xwendinek cuda ji bo karekter biki û bi corekî din dikari xwendina xwe li ser biki û şêweyekî din bi wî karekterî.

Di nava Romana siyasî de diyarkirina şêweyê karekteran gelek giring û pêwîste. Di nava roman de karekterê asayî û sereke ninî, ji ber ku dînemoya zivirandina hemû pêkhateyên din romane. Li gel vê jî kesê roman dinivîsi, di danîn û diyarkirina karekteran de karanîna şêweyekî hûnerî û zanabûnek rewşenbîrî pêwîste û çênabî hema ji ber xwe ev şêwe û sîmaya karekter bê danîn û diyarkirin.

Karekter beşekî giring yê romane û rolekî bi bandor di bingehê romande cih digri. Ji ber vê sedemê guhertin di buyeran de pêktê. Ev jî buye sedemê ku pênase û bîr û boçonên cuda û cihên cuda ji bo wê bê danîn. Gelek lêkolîn li ser karekter yan jî kesayetî hatiye kirin, di van lêkolînan de pênaseyên cor be cor derketine pêş û hatine gotin, hinek ji van pênaseyên ji bo karekter hatîn kirin wekû;

1- Rolan Bart "Karekter zindiyên kaxezanin" [91]

2- Perêz Sabîr " karekter rolekî sereke dibîni di bingehê hunerê çîrok Roman û bi yek ji sedemên herî giring yê serkeftina xebatê tê danîn"[92]

3- "Dîroka tiştan girêdayî dîroka karekteranin" [93]

4- Endrî Yecîd " Qet nêrînek nebêje ku ne li rêya karekter bit" [94]

---

[90] Ceuher Şêxanî, *Binyatî Karekter Le Romanekanî Hisen 'Arif Da*, Hewlêr, 2014, Çapî 1 Çapxaneî Rojhelat,r30.
[91] Erdelan Şukir Sabîr, *Tekinîkî Gêranewe Le Şi'rekanî Şêrko Bêkes Da*, Hewlêr, 2009, Zankoî Selahedîn Têzî Master Kolêjî Ziman, r 44.
[92] Sumeye Necîb Xelîl, *Afret Le Romanî Afretanî Kurd Da 2000-2009,* Hewlêr, 2010, Têzî Master, Zankoî Selahedîn, Kolêjî Ziman, r39.
[93] Senger Qadir Mihemmed, *Biniyatî Gêranewe Le Dastanî Mem u Zîn î Ehmedî Xanî u Romanî Şarî Mosîqare Sipiyekanî Bextiyar 'Elî Da* ,Hewlêr, 2007, Têzî Master Kolêjî Ziman- Zankoî Selahedîn, r127.
[94] Ebrahîm Qadir Mihemmed, *Lêkolînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başûr Da 1970-1980*, Hewlêr, 1997,Têzî Diktora Kolêjî Adab Zankoî Selahedîn, r106.

5- Arîsto "Bi taybetmendiyên kesan kesayeta wan derdikeve; Lê belê bext û bexteweriya wan bi xebata wan anjî kirdarên wan ve derdikeve pêş" [95]

6- Eduyin Muyer "awênê diyarîkirî yê kesayetan, buyeran diyar diki, bûyer jî di rolên xwe de kesayetan diguherîne û giringî diditê. Bi vî awayî heya dawiya roman berdewam dibit"[96]

Her wekî em di vê romanê de dibînîn ku dibêje ; "Mîrza lingê xwe avêtîye wî alîyê din yê derî, Fatimê bi dengekî bilind û bi tirs temaşeyî  hevjînê xwe kir û got :

- Mîrzayê rih tu xudê Erselan..... Ew qasê got dest bi gîrî û qîrînê kir.
- Çi bi te hatîye........min ji nîvro ve şandîye......Emîne û Fatim bê deng bûn, mîrza jî hêdî hêdî di got :
- Çi bi te hatîye....? Ka jimin re bêje...... ?!!
- Emînê ji dil û cerg got :
- Bavê mim...... Tiştek wisan runedaye...... Dayîka min meseleya nimêjê mezin kir !
- Keça min rehmê li min bike çi bûye ?
- Emîneyê tifek daqurçand û bêhndanekî sar kêşand û got :

Bavo Erselan çûye ji derve da ku bibe Pêşmerge......

Mîrza wekî ji serbanekî bavêjin xwarê wisan lê hat. Kurê xwe ji sîyasetê dur bixe.... Başe çawe û di rêya kê de....? "[97]

Eger em temaşeyî vê mijarê bikîn emê bibînin ka çawe romannivîs behsa karekterê yekem yê di nava romana xwe de dike. Ka çawe, li kur û çawe bûye pêşmerge. Çûye nava sîyasetê, dema behsa Erselan dike, Erselan yek ji karekterên serekî yê di nava romanê de ye. Destpêkê çûyîna di nava gotarê de ji wî destpê dike. Ji ber ku roman nivîs di xwaze di yek pêngavê de kesayet çawe  derbasî sîyasetê dibe. Di heman demê de

[95] Mîran Celal Mihemed, *Binyatî Karekter Le Romanî Kurdî Başûrî Kurdistan Da*, Silêmanî, 2009, Çapî 1 Çapxaney Renc, r38.
[96] Serwer Ebdulla, *Seretayek Le Barey Binemaî Gutarî Kesayetî Nêw Roman*, Hewlêr,  2002, Govarî Raman, J.75, r14.
[97] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî  Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r 14-15.

çûyîna wî ya dinava pêşmergan de karekterê serekî ji bo me eşkere dike. Yekem pêngava çûyîna nava sîyasetê de pêşmergayetîya Erselan bi me dide nasandin. Ji ber ku Mîrza Rehîm Û Erselan du karekterên sereke yên di nava romanê de ne. Di hemû alîyên romanê de beşdarbûna wan heye.Ev jî bûye sedem ku ev roman û karektên wê bibe sîyasî û bergekî sîyasî bi vê romanê bibexşîne û bike romanekî sîyasî.

Her wiha di mijarek din ya romanê de dibêje : "Bavo Erselan vaye demeke karê rêxistinê dike ez bawer nakim bizivirînin......

- Te destpêkê dizanî ne wisa, xanim xas....?
- Belê....
- Te çima ne di got ? Ax....Ax....

Gotinek ya birayê Emînê hat bîra wê, xîret da ber xwe û got : Bavo.... Em hemû pêwîste ji bo Kurdistanê jîyan bikîn,rizgarkirina Kurdistanê cihê şanazî û giştî kurda ne.

Ev gotina Emînê bavê wî hejand hestên netewayetî di singê wî de wekî birîskekê veda. Hinek çû di nava xeyalên kur de, hizra qehremantîya wî dike û bi vê gotinê re hat dîlgirtin.

Dil sozje vaye çend sale wî xwedî dike hêvîya xwe pêve girê dabû, gelek caran wê beramberî wan spayên wehşî û dirende yên rejîmê were...."[98]

Roman nivîs di rêya dubarekirinê de em dibînin ka çawe di rêya karanînê de pesn û çawe behsa bûyera yekem dike. Serhildana romanê û karekterê yekem ji mere eşkere dike, romanê di be nav qalibekî sîyasî, şoreşgerî û berxwedana dijî rejîma behsa a ruxayî ya Êraqê.

### 3.1.2. Giringiya Cihê Karekter Di Romanên Nû de

Li pey hev ew guhertinên mezin yên di wêjeya cihanê de rudayî, ji ber derketina çend dibistanan yan jî çend rêbazekî nû nêrîna roman nivîsan li beranber karekter hat guhertin û hewil hat dayîn ku desthilatdariya karekter kêm bikin. Ev ji bi rêya

[98] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r16.

jimarkirina karekteran wekî zindiyekî ser kaxezê yan jî xeyalî ne wekî kesekî zindî, ji ber ku roman nivîs di rexneyên nu de, li gorî wan mijar text karekter diyar diki ne buyerên rewşên civakî.

Mebesta roman nivîsan li vir ewe ku " dixwazin li ser xwêneran bi çespînin ku ne dîrok ne jî rewşên civakî hene, berevajî vê wekî binemayên din vegerîn, ziman, cih û dem tenê hebûnekî li ser kaxezêne" [99]

Di romanên nu de roman nivîs li cihê nav tîp û jimar ji bo karekter bi karanîne. Her wiha ji bo dexistina pêş ya karekter wekî corekî sereke yê sade li ser kaxezê, nivîskarê romanêan dev ji nav û nasnavê karekteran berdane. Sedemê giringîdana nivîskarê romanêan ya ji bo navê karekteran bi rêya navê buyera romanê hatiye diyarkirin ne nav û nasnav.

Yek ji taybetmendiyên giring yên romana nû we ku ji dervey mirov û beşên din roman jî wekî cih û dem, dar û daristan, lawir û xweza û hemû giyandarên din rolê wan heye ku bi şêweyekî ji dervey hêza mirov derketine.

Ji ber vê nivîskarê romanêên romanên siyasî gelek caran karekter bi ser şêweyê giyandarek, kevirek yan darekê yan ji her çi tiştek din li ser şêweyê sembol û nehênîdebin diyar diki. Bi taybet di civakên ku azadiya fikrî nebê û sansurên siyasî rêgirbin li beranber dem huner û wêje û beşên din yên jiyanê de ev karanîn gelek li pêşe. Mînak; Dayik ya Maksîm Gorgî an romanî jana gel ya Îbrahîm Ehmed ku ji beşê romanên siyasîne ku karekterên wan wekî sembol dane pêş.

Karekter divê di romana siyasî de xwedî fikir û îdeolojiya siyasîbi û divê hizrên wan di çarçoveya mijarê li gorî xwesteka siyasetmedaran vegotin biki. Her wiha nav û nasnavê karekteran di van corên romanan de bi şêweyêk bin ku bikarin fikra siyasetmedar û ramyarî, kesên şoreşger û qehremanên li nav buyerên siyasî yên gelên xwe yan jî cihanî bin. Bi awatayekî din rolê karekteran divê di nav bûyer, pêşhat û

---

[99] ˈEwnî Emîn Umer, *Biniyatî Karekter Le Du Romanî Ferhad Pîrbal Da Be Nimuney Mulazim Tehsîn u Ştî Tirîş u Hutêl Eurupa*, Hewlêr, 2015, Têzî Master, Kolêjî Perwerde, Zankoî Selahedîn, r 23.

serhatiyên nav romanê de biguncêt û hevdû bigrin. Di heman demê de divê qet tiştek din rûnedit ji bo beravajikirina an jî gerandina romanê.

Wêdemê karekter û diyarkirina karekter di nava romanên siyasî de ji aliyê nivîskarên romanan ve kesên wesa tên hilbijartin ku xwedî navûbangek siyasî û ramyarî bit. Yan ji di tekoşîna rizgarîxwaza netewa xwede xwedî cihek diyar bit û navek diyar bit ji bo vê meydanê. Hindek car jî kesên asayî ji nava civakê tên hilbijartin û mijar dikevi biwarekî siyasî û netewî û wekî qalkirinek zêde ya kesekê, komekê yan jî tîmekê ku ew jî ji aliyê rezîm û zordaran ve hatîn girtin û zîndanî kirin û cihê wan hatiye bilindkirin....hwd. Nivîskarên roman van û çend mijar û kesên din, diki mijar û karekterê sereke ji bo romanê û li ser vî bingehî roman tê nivîsîn.

Her wekî em di vê romanê de dibînîn ku dibêje ; " Mîrza lingê xwe avêtîye wî alîyê din yê derî, Fatimê bi dengekî bilind û bi tirs temaşeyî  hevjînê xwe kir û got :

- Mîrzayê rih tu xudê Erselan..... Ew qasê got dest bi gîrî û qîrînê kir.

- Çi bi te hatîye........min ji nîvro ve şandîye......Emîne û Fatim bê deng bûn, mîrza jî hêdî hêdî di got :

- Çi bi te hatîye....? Ka jimin re bêje...... ?!!

- Emînê ji dil û cerg got :

- Bavê mim...... Tiştek wisan runedaye...... Dayîka min meseleya nimêjê mezin kir !

- Keça min rehmê li min bike çi bûye ?

- Emîneyê tifek daqurçand û bêhndanekî sar kêşand û got :

Bavo Erselan çûye ji derve da ku bibe Pêşmerge......

Mîrza wekî ji serbanekî bavêjin xwarê wisan lê hat. Kurê xwe ji sîyasetê dur bixe.... Başe çawe û di rêya kê de....? " [100]

Eger em temaşeyî vê mijarê bikîn emê bibînin ka çawe romannivîs behsa karekterê yekem yê di nava romana xwe de dike. Ka çawe, li kur û çawe bûye pêşmerge. Çûye nava sîyasetê, dema behsa Erselan dike, Erselan yek ji karekterên serekî yê di nava romanê de ye. Destpêkê çûyîna di nava gotarê de ji wî destpê dike. Ji ber ku roman nivîs

[100] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî  Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r14-15.

di xwaze di yek pêngavê de kesayet çawe derbasî sîyasetê dibe. Di heman demê de çûyîna wî ya dinava pêşmergan de karekterê serekî ji bo me eşkere dike. Yekem pêngava çûyîna nava sîyasetê de pêşmergayetîya Erselan bi me dide nasandin. Ji ber ku Mîrza Rehîm Û Erselan du karekterên sereke yên di nava romanê de ne. Di hemû alîyên romanê de beşdarbûna wan heye.Ev jî bûye sedem ku ev roman û karektên wê bibe sîyasî û bergekî sîyasî bi vê romanê bibexşîne û bike romanekî sîyasî.

Her wiha di mijarek din ya romanê de dibêje : " Bavo Erselan vaye demeke karê rêxistinê dike ez bawer nakim bizivirînin......
- Te destpêkê dizanî ne wisa, xanim xas....?
- Belê....
- Te çima ne di got ? Ax....Ax....
Gotinek ya birayê Emînê hat bîra wê, xîret da ber xwe û got : Bavo.... Em hemû pêwîste ji bo Kurdistanê jîyan bikîn,rizgarkirina Kurdistanê cihê şanazî û giştî kurda ne.
Ev gotina Emînê bavê wî hejand hestên netewayetî di singê wî de wekî birîskekê veda. Hinek çû di nava xeyalên kur de, hizra qehremantîya wî dike û bi vê gotinê re hat dîlgirtin.
Dil sozje vaye çend sale wî xwedî dike hêvîya xwe pêve girê dabû, gelek caran wê beramberî wan spayên wehşî û dirende yên rejîmê were.... " [101]

Roman nivîs di rêya dubarekirinê de em dibînin ka çawe di rêya karanînê de pesn û çawe behsa bûyera yekem dike. Serhildana romanê û karekterê yekem ji mere eşkere dike, romanê di be nav qalibekî sîyasî, şoreşgerî û berxwedana dijî rejîma behsa a ruxayî ya Êraqê.

### 3.1.3 Têkiliya Di Navbera Romana Siyasî û Corên Vegotinkirin

Dubare nîşandina bûyerekê, yan çend bûyeran bi rêya vegotinkirinê ku bejdarbûna kesekê nav bûyeran ya baş agahdar kirine. "Wate pêwîste kesê nu dikevi nav bûyerê divê agehdarî bûyerê bit, yan ji di derbarê bûyeran de xwedî zanyarî bit, Ji ber ku

[101] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r 16.

qet nikarin bi şêweyekî raste rast bê karanîn teknika vegotinkirinê li gel xeyal dahonana karekter li hevdû nêzîk bikîn" [102]

Eger têkilî û guncandinek di navbera wan de nebit, şêweyê vegotinkirinê bi pêşketina jiyana mirovayetî guhertin bi serde hatiye. Wek hunerekî di hemû serdemande hebûna xwe parastiye. " Di destpêka sedsala 20'an hunera vegotinkirinê bi şêweyekî baş pêşketiye" [103]

Bi giştî çawaniya vegotinkirinê giringî bi nîşandana buyeran didi û kar li ser ber bi pêşveçûna demê bûyerê gerandin û xwendinê didi. Divê em vê jî ji bîr nekîn ku vegotinkinek bi wî şêweyî bit ku di xizmeta corek yê romanekê de bit û zêdêtir qala sîyaset û xwestkên siyasî biki. Ji ber ku corê romanê ji romana siyasîye. "Rolan Bart" di pênaseyek giştî de dibêji; "vegotinkirin wekî ji nava jiyanêye, di aliyê dîrok û rewşenbîriyêve cîhanekî pêşketî pêktîni, lê belê vegotinkirin li gorî Bart hebûnekî tenê li ser kaxezêye" [104]

Ji ber vê yekê çawaniya vegotinkirinê di hûnera çîrokan de rolekî giring û berçav heye. Serkeftina her çîrok û romanê jî girêdayî serkeftina şêwazê vegorinkinêye " ji xwe ji ber wêye ku rexneyên wêjeyî giringiyekî taybet daye vê rê û rêbazan ku nivîskar li çawaniya bi karanîna vegotinkina xwe de bikartînin û nav didinê teknikên vegotinkirinê" [105]

Romana Siyasî li gorî gotarên xwe ku tînin ziman vegutinên xwe encam didin. Dengek taybet bi berhem tînin û nabin sedemê derketina wesfeki sade ji ber Grimas dibêje; " kesê ku di romanê de di axivi tê bêşbinîkirin ku pêşketina wî li gorî axaftinên wî diyar dibe" [106] bi wateyek din xala bingehîn ya vegotinkirinê piştre dê diyarkirin li gorî bingehê mijar, babat û bûyerên siyasî û newetewî yan jî gelên cîhanê.

---

[102] Ebdulla Ebdulmutelîb, *Mîkanîzmî Karekter- Gêranewe Le Beheşitî Ewber Pirdeke*, Hewlêr, 2000, Govarî Karwan, j 146, r 135.
[103] Hêmin Casim Mihemed, *Hunerî Gêranewe Le Çîrokî Folkilorî Kurdîda Çîrokî Mindalan Be Nimune*, Hewlêr, 2014, Têzî Master Kolêjî Ziman- Zankoî Selahedîn, r10.
[104] Ebdulla Ebdulmutelîb, *Binyatî Gêranewe Le Nêwan Deq U Xuenerda*, Hewlêr, 2013, Govarî Raman, J 190, r 66.
[105] Cîhan Yusif Ehmed, *Teknîkî Gêranewe Le Çîrokî Rîşole Da*, Hewlêr, 2014, Govarî Raman, J 205,r 64.
[106] Amadekirdinî Lîjney Roşinbîrî, *Dîdarî Romanî Kurdî* , Hewlêr, 2012, r 162.

Romana siyasî û karekterên di roman de di navbera kesê bêjer û kesê guhdar de di nava hatinûçonekê dene. Di vê rewşê de, dema bi şêweyek hemwext demakû hevgirtina qehreman, bêjer û guhdar çêdibe li gorî Dêlkont "vegotinkirin diyardeyekî ji berxweye girêdayî kese" [107]

Ji ber ku roman di hemû aliyan de mijaren cuda cuda di nava xwe de digri ku divê bê hurkolînkirin, ew jî ji ber ku ji aliyê kesan ve şîroveyên cuda cuda derdikevin pêş. Ku dikar corên romana bi hevdûve bidi girêdan û bûyeran bidi berdewamkirin. Her wiha bi kombûna piştî romanê tê danîn. Ji ber ku têkiliyek raste rast bi kesayeta romanivîsan û ew nasnavê di çîrokê de hatî vegotin kirin de heye. [108]

Pêwîste ku şêweyê vegotinkirinê bi şeweyek wesan bi ku bala xwêner bikêşe xwe û peywendiyekî xurt hebit di navbera naveroka roman û şêwazê vegotinkiria wê. Ji ber ku bi vegotinkirina bûyerê û bi serhatiyên siyasetmedaran xwêneran razî bikin û wan bînin nav germahî û hewaya romanê de. Bi wî şêweyî bi ku ji destpêkê heya dawî li gel romanê bimînin û wisan hîs biki ku hez biki bikevi nav wê romanê de. Her wiha Rolan Bart dibêji; " Dema ku mirov tam ji xwedina mijarekê text digirin, wê demê ew bi mijara tamê tê nivîsîn" [109]

Hinek mijar hene ku zû winda dibin, hinek jî zu li cîhanê bilav dibi. Hinek jî ne bi sêhrin ku ji aliyê beşek yê xwêneran tê hezkirin, dibe ku xwênerên wê zêde li pey neçin ku ev ne merce ku hemû hemû vegotinkirinên mijaran û bûyeran bi dilê xwênranbin û bi bandor bin. Ji ber ku " bûyerên heyî piştrast dikin ku tu tişt ne bi dilê her kesêye" [110]

Wate ewa ku xwêner radikêşi nav cîhana romanê çawanî, şêwaz û tama vegotinkirina wêye.

---

[107] Emced Xulamî, *Gêranewe Le Goşenîgay Aydolojiyayekî Haşa Lêkirawewe Xiwêndinewey Komele Çîrokî Denge Dengî Bê Dengî*, Hewlêr, 2014, Govarî Raman, J 211, r73.
[108] Şaxewan Ferhad Mihemed, *Rewtekanî Gêranewe Le Romanî Kêxwa Sêwê Da*, Hewlêr, 2012, Govarî Raman, J 183, r 82.
[109] Aram Sidîq, *Teknîkî Gêranewe Le Romanî Xewtu Da*, Hewlêr, 2015, Govarî Raman, J 126, r 154.
[110] Mehdî Mêhir Perwer, *Kesayetî Voltêr U Berhemekanî*, (Wer. Ehmed Eranî), Hewlêr, 2009, Govarî Raman, J 150, r 120.

### 3.1.4 Têkiliya Romana Siyasî li Gel Dem

Dem yek ji rêgez  û binemayek giringe ku bejdare di avakirina roman de, şêweyek hûnerî didi roman, ji ber ku " bûyer di nava bazineyekê de dizivirin, ew jî Dem e" [111]

Ev rêgez rol û badorekî berçav heye ji ber ku girêdanê di navbera beşên din yên roman wekû bûyer û kerekter, nivîskar di nîvîsandinên wan de pişt dibestin ji bo agahdarbûnê, di haman demê de wisan li kesayetê dikin ku di lutkeya herî bilind de bimeşin ji ber ku nivîskar bi şêweyek hemwext "dizani ku cîhan li beranberî wî de ne xweedî soze hem di aliyê dem hem jî di aliyê cih de" [112]

Eger em bi awayê payekî giring temaşeyî şêweyê roman bikîn, ev bandorekî giring li ser her aliyê bûyer û karekteran heye. Demê çîrokê jî ji li peyhevhatina demê xwezayî û demê vegtinê,çawaniya pêşkêşkirina wî demî bi xwêner " demborî, niha,paşeroş, wate dem" [113].Dem li nav romana siyasî de pêwîstiyekî gelek giring. Ji ber ku di vî corê romana de nivîskarê romana divê bi şêweyekî wesa qala  dem biki ku li gel rewşa roman biguncit. Bi şêweyek din dem li vê derê helgirê beş, hêma û delaletiya siyasetê bin û divê di romanê demê bûyerên ramyariyên me cih bigri, ji bo vê mebestê jî nivîskarê romanê divê sud ji dîrok û bûyerên dîrokî bigri û girêdana wan bi dem re çêbiki.

Di aliyê zanistî û felsefeyê de dem, vegotin û cihê romanê ji hevdu cuda bikîn di aliyê îstatîkî jî dem û cih têkiliyekî xurt  di navbera wan de heye, di wêjeyê de bi şêweyê hunerî hatiye girtin, ku Baxtîn " wisan nav kirye Chronotop  ku tê wateya Demcih. Her wiha dem jî hatiye hûrkolînkirin ku biwarekê çareme ji bo cih" [114] Lêbelê di piraniya

---

[111] Hîmdad Husên, *Derwazeyek Bo Rexneî Edebî Kurdî*, Duhok, 2007, Çapî 1, Çapxaney Duhok, r209.
[112] Kazim Şerîf, (Wer. Mhemed Kerîm), *Raz U Amirazekanî Roman*,  Silêmanî, 2012, Çap Û Pexşî Serdem, r20.
[113] Ebdulla Serac , *Berew Astaney Romanî Kurdî*, Hewlêr, 2000, Govarî Raman, J 54, r 33.
[114] Kejal Ebdulqadir Osman, *Biniyatî Şwên Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da Deqekanî Dilawer Qeredaxî Û Kejal Ebrahîm Xidir Wek Nimune*, Hewlêr, 2015, Têzî Master, Kolêjî Ziman, Zankoy Selahedîn, r 93.

rexneyên nu yên li ser cih û dem, li gel hev tên destgirtin û qalkirin û ji hevdû cuda bûne, tenê dû ruyê wan hene lê belê ji hev nayên cudakirin

Wê demê cihdem pênaseya wê karlêkirinêye, ku têkiliya cih li aliyekê û têkiliyên dem jî li aliyekî din tevlî berhemên hûnrî tên kirin. Hêjayî qalkirnêye ku dem di roman de bûyeran zindî diki û wisan lê diki ku wekî zincîreyekî li duhev bên. Ji ber ku " hemû romanek yan aliyekî zemînekî taybet heye, amadeye alugoriyê li wî demî bikit ku roman têde tê nivîsandin. Dêmên wê jî yek li du yek rêkûpêk diki" [115]

"Pêşmergeyan xwe di sengerên xwe de bi hêz kirîne, tê gotin ku hêzekî zêde di rêdeye....

- Bi xudê Mîrza ew xwînrêje bin wê serê me hemûyan bi birin...

- Xuda kerîme Rehman... Xudê Kerîme.... "[116] Wekî li jor de jî dîyare demê goftogoyê eşkere kirîye. 3 mehe di vir de,demê wê jî demekî fîzîkîye. Dîyare ku sê mehe, ji vî cûrê dem re jî dibêjin; demê serekî. Demekî sîyasîye, ji ber ku dibêje ; Sê Meh e di goftoguyê dene. Daxwaz ew e ku demê goftugoya di navbera hêza pêşmerge û rejîma behs ya êraqêde dÎyar dike. Bi vê re jî di alîyê dem de roman dibe romanekî sîyasî. Ji ber ku ji destpêka romanê heya dawîya wê ev cûrane Karekter, Cih, Dem, Bûyer û Zivirandin bi şêweyekî tund bi hev ve girêdayîne. Em nikarin wan bi hêsanî ji hevdû cuda bikin û bitenê rol bidin wan.

Her wiha di romana Dexdo ya Xesrew Caf de, di cihekî romanê de nivîskar behsa dagirkirin û bûyera hatina İskenderê Mekedonî dike ku Qela Hewlêrê bigirin û dagir bikin. Di vir de roman nivîs demekî dîrokî û bûyerekî dîrokî û sîyasî dubare dike. Ev di rêya karekterekî di nava romanê de. Mamosteyê dibistanê di xwaze xwendevanên xwe agahdar bike ji bûyerekî mezin ya bi vî awayî. Ew bûyerên ku tejî ji êş yên bi ser neteweya wan de hatîye.

Xwendevanên xwe tîne ji bo ku amojgarîyan jê werbigire. Dema ku dibêje : " Her li vê deverê yekem car ferhenga Rojava û Rojhelat tevlî hev bûye. Êrîşa îskenderê

---

[115] A.A. Mindlaw, *Elzemen Welrîwaye*, (Wer. Bekir Ebas), Beyrut, 1997, Elteb'el Ula Sadir, r75.
[116] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r158.

Mekedonî ya li ser Asayê li vir şerê mezin li Arbeîlo çêbû. Li bin Qelaya Hewlêrê de bi hezaran cengawerên Yunanî û îranî li hevdane. Ji ber vî şerî gohertinekî mezin di jîyanê de çêbû. Yekem care ku Rojava bi ser Rojhilat de serket. Bi dirêjaya sedan sala desthilatîya xwe domandîne " [117]

Romanivîs ji vî demî re dibêje demê borî, di alîyê dem de jî xistîye nava romanê de. Buyera vî şerî dîrokekî gelek kevnar heye, dizivire destpêka romanê . Behsa hatina Cengîz Xan û Hulaku dike, ka çawe hesp birîne û bi rêyekê gehiştine nava Bexdayê wir kavil û wêran kirin. Ji bo ku xwendevanan başbide fêmkirin di rêya van karekteran de dibêje. Bi vê re jî mijarê dike mijarekî sîyasî. Demê wê jî wextekî dur û dirêjê zemane.

Her wiha Bextîyar Elî di romana Şarê Musîqa Respîyekan de dibêje: "Wan rojan cenga berdewam nêzîk û nêzîk dibû, çend corên şeran li ser vê xalî tevlî hev bûye. Cenga Welatan, Netewan, Olan û Hizban, şevek ji şevan şer gehişt nêzîkî wî bajarokî. Bi dirêjahîya şend demjimêra gohdarî teq teq û teqînan kirin. Siharê rêbarek nûçe anîn xelkê wê deverê hemû vale dikin, wan ve digoherînin ji bo gondên derdor. Bi dirêjahîya şevê borduman kirin bi sedan qurbanî di cih de hiştin. îshaq bêyî xwendevanên xwe geştekî kurt kir, dema zivirî wêneyek di çavî wî de bû ku pir bû ji sîbera karesatan, Merg li hemû cihan bû, supayek bêşumar yê dewletê ji başûr ve dirêjan koç û kolanê vî bajarî de. Bi hezaran serbazbûn di bin komikê hesin de mejîyê wekî tirsonukan bû.Bi Hezaran çekdarên kor yên dewletên bû, ev corên şer pir bû ji çekan. Bi xwe û simbêlên sitor ve "[118]

Peyvên wan rojan, şevek ji şevan, bi dirêjahîya çend demjimêran, geştekî kurd....hwkd Ev corê deman ku di deqan de behskirîye demê navendîne. Ew demeye ku ne dîyarkirîye û çend rojan dîyar nabe du roj sê roj pêncî roj....hwkd . Her wiha geştekî kurt belku niv demjimêr be, belku du demjimêr be, belku jî pênc çirke be. Behsa demê wê jî kirîye, di romanê de armanca wê eşkerekirina bûyer û babetekî sîyasî bûye.

---

[117] Xesrew Caf, *Romanî Dexdu*, Hewlêr, 2012,Desgay Aras, r23.
Xusrew Caf, Endaziyar û Edîb û Hunermend e li Newroza 1945 li Kelar a başûrê Kurdistanê ji dayîk buye qonaxên xwêndinê li Baxdayê qetandîye, beşa Telarsazî li Kolêjê Huner a Zanîngeha taranê qetandîye, xwdanê zêdetir ji 70 pertukên cor bi core ser dîroka kurd û Edeb û Huner û Telar sazî û peyker û hin karên mezine wekî monomenta Helebce, romanên herê dîyar a nivîskarê ewin:(Kodere, Hîç, Dexdu, Wirêne, Raz, Paşayan kuşit, Derbar, Şazade û Şa'îr, Mewlana û Razî Neyî...).

[118] Bextiyar 'Elî, *Romanî Şarî Mosîqare Sipyekan*, silêmanî, 2003, Çapxaney Endêşe, r36.

Romanê dike romanekî sîyasî, Ji ber ku temamî vê paragrafê behsa tirs , merg vegohestin û hatina supaya sedam hisên ji bo navçeyê . Ev jî bi alîkarîya cehşên kurdan dike. Ev jî bese ji bo ku bê zanîn roman romanekî sîyasîye di alîyê dem de jî.

### 3.1.5 Têkiliya Romana Siyasî li Gel Cih.

Tu romanek li ser ruyê vê cîhanê nehatiye dîtin ku hebûna cih têde nebit. Yek ji corên serekiye. Ji ber ku cih bi hemû corên xwe hebûnîkî konkirît û nehatîbirîn di şêweyê roman de heye. Li gorî wan guhertinên ku di destpêkirina serîhildana roman de li ser vî şêweyî hatiye. Cih jî wekî rêgez û corekî bingehîn yê roman bê beşnemaye ji vê gorankariyê. Ji ber vê lêkolînvan û rexnegirên vî biwarî di dema pênasekirin û beşên wêde fikir cuda û giringiyek cuda dane pêş. Lê belê di encama hemûyan de hem fikirin li ser wê cih ew rolê giring û serekî yê xwe ji dest nadit. Çênabi ku roman bi bêy faktora cih bênivîsîn û pêşbikevi. Ji ber ku roman zêdetiri ji hemû şêwazên din yên wêjeyî li ser êş,elem,nerehetî, ne aramî, xweşî û aramiya mirov û cikatê lêkolîn diki û dinivîsi.

Eflatûn di derbare cih de wisan dibêji: " cih hevkareke ku ji bo tiştan, cih wehme ku bedendê mijûl diki û rê didikê ku kirdarên xwe têde bi cih bîni" [119]

Her wiha "Erîsto" ku xwendevanê "Eflatunbû" bi vî şêweyî pênaseya cih kiriye û dibêji; "cih astekî ku tevger naki bi şêweyek raste rast hevkareke, herwiha li gorî wî ne gengaze ku hebûna cih bidîn diyarkirin. Cih li gorî wî dibi du beş; yek ji van hevbeşe ku zêdetir laşekê li xwe digri, ya din jî taybete ku laşekî ku li gorî taybetmendiya xwe cih digri û bi wê hatiye nasîn"[120]

Bi vî şêweyî her fîlozofekê li gorî fikra û nêrandinek cuda pênaseya cih kiriye. Ev jî vê ji bo me didi diyarkirin ku beşê cih yek ji wan beşane ku bala mirov kêşaye ser xwe. Cih hevkareke ji bo mirov bi her tiştê xweve.

---

[119] Ebrahîm Qadir Mihemmed, *Lêkolînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başûr Da 1970-1980,* Hewlêr, 1997,Têzî Diktora Kolêjî Adab Zankoî Selahedîn, r31.
[120] Ebrahîm Qadir Mihemmed, *Lêkolînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başûr Da 1970-1980,* Hewlêr, 1997,Têzî Diktora Kolêjî Adab Zankoî Selahedîn, r32.

Di pênaseyek din ya cih de hatiye gotin "cih ji bikaranîna gumanên ji bo diyarkrina hest û ramam û fikrane" [121] .Li gorî vê cih ne tenê qalkirina cihekî yan xwezayekêye û ne tenê li xwe girtina karekter, bûyer û tiştane, cih zanist, wate û delaletekî îstatîkî heye di nava şêwazê romanê de. Ji ber vê aliyê hunerî yê cih û aliyê tamsehkirinê yê cih dirêjbûnekî îstatîkiye. Hest û ramanên hunermend rolekî giring dibînin ji bo şekildayîna beşê hunerî yê cih de. Li gorî vê "wêneyê hunerî yê pêktê ji erdnigariyekî ya mejî ku cudaye ji cihek stûştî. Ji ber ku helbijartin û xeyal têdeye, ji ber vê cihê hunerî cudaye ji cihê xwezayî" [122]

Di nava romande bê cih serkeftin çênabe. Bi tayibet romanên siyasî, ji ber ku di vî corê roman de çendeha cihên cuda cuda tê bikaranîn. Bi vê jî cih bandorê li rûdana buyran diki û qalibek xwecihî û bawerî pêhatî didi diyarkirin ji bo xwêneran. Xwêner di dema xwendina roman de di wî cihê ku lêye de diveguhêzî bo wê cîhana xeyalî ku bi peyvan hatiye hunandin di wî cihê ku hatî çêkirin de dijît. Her wekî ku “Mîşel Botar” dibêji; " xwendina roman geşteke ji bo cîhanekî cuda ji ew cîhana ku têde jiyan diki û ji hurdeya yekem ya xwedina yekem ku xwêner pirtûkê vediki diveguhêzi ji bo cîhana raman ku ji peyva roman pêkhatiye, ev cîhan dikevi navçeyekî cuda ji cihê xwecihî yê ku xwêner raste rast têde jiyan diki" [123] Wê demê divê em wê ji bîr nekîn ew cihên ku pêwîste hebûna wan hene di roman siyasî de hebin û nivîskarê romanê divê giringî biditê û bal bikêşîni ser wê xalê. Di wan cihan de hêvênê bûyerên siysî têde çêdibin. Bi wateyekî din nivîskar divê di vî corê romana de ku romanê siyasî ne bi şêweyekî tevkariyekê li gel cih de biki. Wê demê xwêner li aliyekê divê hîs biki ku li ser ruyê erdê cihek wesan heye. Her wiha li aliyê din vî cihî bi şêweyekî hunerî û îstatîkî bêxi ber destê xwêneran. Divê wesa nezani ku tenê mijarekî dîrokî dixwîni. Ji bo fikîrina van curên cihên ku di nava romana siyasî de hene karekî zehmet û girane bi çavê qalkirina cih li corên din yên roman. Di romanên siyasî de divê cih, cihên bûyeran û cihên serhatiyên bûyerên siyasî bin. Lê belê çênabi ku romanivîs wekî xwe rabighîni û nîşanî xwêneran bidi. Divê bi şêweyekî fikrî û seriçrakêş bi cih bidit û bi şêweyekî îstatîkî

[121] Ebrahîm Qadir Mihemmed, *Lêkolînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başûr Da 1970-1980*, Hewlêr, 1997,Têzî Diktora Kolêjî Adab Zankoî Selahedîn, r12.
[122] Ebdulla Serac , *Berew Astaney Romanî Kurdî*, Hewlêr, 2000, Govarî Raman, J 54, r16.
[123] Ebdulla Serac , *Berew Astaney Romanî Kurdî*, Hewlêr, 2000, Govarî Raman, J 54, r41.

dabirêji ber çavan. Di dawiyê de em dikarîn bêjin; di rexneyên nû yên serdem de nivîskar û rexnegirên wêjevan cih û dem li hevdû tevlîhev dikin û nikarin ji hevdû cuda bikin û bi cuda qala wan bikîn, bi taybetî nivîskarê bi navûbang “Baxtîn” li ser navê “Cihdem” qal diki û derdixi holê wekû cotikekî ji hev cuda.

Piraniya fîlozofan û zanyaran di wê baweriyê dene ku dem di nava mejiyê mirov de dirûst dibi ne ji dervey wî mejiyîye. Wê jî napejirînin ku cîhana ji derve di hişê mirov de sebixwebit. Lê belê de bi tu şêweyî ji cih cuda nabit. Di têkiliyekî diyaletîkî de dijîn. Cûdakirina wan ji dervey zanistêye. Ji ber ku " tu ruberê cihekî nîni ku kesayetên dem bi ser de neçobe, her wiha tu firehiyên dem jî nîni ku li ser ruberê cihekî dernekevin"[124]

Cih jî di roman de ew cihên ku karekter têde jiyan dikin û tevger dikine. Nirx û giringiya paya cihê roman jî girêdayî hebûn jiyan û tevgerkirina kerekter ya di wî cihîdeye. Her wiha Ebdulmelîk Murtaç jî wisan dibêji "cih diyardeyekî bê sûd û bê bihaye ger karekterek têde jiyan neki"[125]

Ji ber ku dem û cih wisan girêdayî hevin, wekû laşekî ku temamkerê hevdûn tê danîn, ji ber vê ji hevdû cudakirina wan ne guncawe. Di ahengiya bingehê roman de derdikeve holê, ji ber wê çênabi ji hevdu bên cudakirin. Her wekî ku (Çaston) dibêji; "şekspîr giringiyekî nedaye navbera zeman û mekan dem û cih "[126]

Di vê derê de derdikevê ku wesifkirina cih û diyarkirina dem û bawerî dayîn wî kesê hunerî ku arîkarin ji bo dariştina hesan û paşpiştê corên tevgerkirinêne. Ev hemû ev jî arîkarin ji bo derxistina aliyên veşartî û kur yên karekterê roman. "Ze'îm Sedîq di malekî hamîya Silêmanî ye de runiştîye. Pêşî çend demjimêran berqîyek ji behsîyan gihişt destê wî. Gelek gilî û serzemînî lê dikirin ji ber wan bûyera di Şarezûr û Helebçede çêbûn. Revandina maşîneyên hukmî û kemîn danîn çend çalekîyên din yên cûr bi cûr....

---

[124] Kazim Şerîf, (Wer. Mhemed Kerîm), *Raz U Amirazekanî Roman*, Silêmanî, 2012, Çap Û Pexşî Serdem, r24.
[125] Tanya Es'ed Mihemed Salih, *Bînaî Şuên Le Du Nimuney Romanî Kurdî Hêlane . Ejdîha Lêkolîneweyekî Tiyorî Piraktîkî Rexneyî*, Hewlêr, 2006, Têzî Diktora, Kolêjî Ziman, Zankoî Selahedîn, r146.
[126] Yan Wat- Deyvîd Lac Û...Komelê Nuser, *Tiyorî Roman tiyor- Rexne- Lêdiwan*, (wer. Şêr Begî Husên) , Taran, 2004, Çapî 1 Bilawkirawey Nezer, r35.

Acizî kîn û nefretek di xwîna wî de digera, di nava malê de dihat û diçû. Piştî çend rojekê Man'i Altcol li silêmanîyê kirî bû, hejmarek zêde ya xelkê golebaran kirî bû. Kefîya xwe avêt serê xwe, carna jî zendên xwe radikir ji acizî wext bû bike qêrîn.... Serê xwe xist malde û got :

- Qurban hemû amadene....

Bi tundî bi ser efserên xwe de çû.

- Ew kuçikên duh we çi pêkir.... ?

Efsera wijî hemû ji tirsa canê wî dilerize û got :

- Qurban em li benda fermana te ne.

Bê qeyt û şert got :

Serê wan jî wekî seyan pehn bikin....Zu.... Bila ez wan gohdar bikim...."[127]

Di vê mijara li jor de em dibînin ku roman nivîs, di rêya zivirandinê de teknîka cih, şerê sîyasî û şanoya bûyeran, alozîyên di nava romanê de ji bo me eşkere dike. Ji mere eşkere dike,parêzgeha Silêmanîyê, navçe, bajargok, gond û gundikê wê çawe zilma rejîma behs ya êraqê li ser wanheye. Em dibînin hêvênê bûyer û serpêhatîyan, şer,nexweşî, tundutîjî, girtin, birîna xelkê, heya di gehe bi saxî kirina çalan de, Enfal kirina xelkê navçeyê, bi van re ev roman dibe romanekî bi temamî sîyasî. Ji ber ku ew cihên ku roman nivîs behsa wan dike bûyer hemû tê de çêdibin. Ev cihane jî cihekî girîng di coxrafya êraq û Kurdistanê deheye. Eşkere dike ku hemû xelkên Silêmanî, Helebçe û Seyîd Sadiqin.

Her wiha di cihek din yê vê romanê de nivîskar pêngav bi pêngav cihê bûyeran,şer, serpêhatîyên ceng, behsên sîyasî,nexşe û pîlanên dijmin ji me re behs dike. Dema ku goftugoya di navbera Hesen Fendî û Mîrza de ji me re vê dîyar dike.

---

[127] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r158.

Rewş hêdî hêdî xirab dibe,hemû navçeyên Kurdistan bi taybetî vê deverê dibêje; şer lê aloztir dibe.

"Selam elêk....

Hesenê Fenî hinek ma û nû got :

- Elêykum selam Mîrza.... Tu li kurî ?.... Wisan xûya dike ku tu jî li pey cihek hunik di gerî, tejî ye ji asawîşê da ku tu jî deronîya xwe hunik bikî....

- Belê qurban.... Ez gelek dil teng bûme min di xwest hinekî xeman bi revînim....

- Tu ne niheqî.... Her çi qas hêza pêşmergeyan ne hiştîye ew hêze bi gehe Helebçe, lê belê kes nikare misogerîyê bide vê rewşê....

- Qurban ew xwîn rijandine dixwaze me ji bajarê me xilas bikin,Me hemûyan jî bi kûje û keçên me jî fesad bikin....

- Bê goman wisaye Mîrza.... Hêzên dagirker dilê wan bi miletek din na şewite, wekî xenîmeyekê temaşe dikin....

- Dibêjin ew zilmkaran kesek şewitan dîye....!!"[128]

Weku di romanê de jî dide dîyarkirin ku cihê wê Helebçe û Seyîd Sadiqe, cihê rast gotîye û her kes hest bi wan cihan jî dike. Li ser xakê jî hebûna wan heye, bi vê re jî bûye şanôya bûyerên sîyasî yên vê romanê. Roman kirîye romanekî sîyasî, hizir û fikrê îdeolojîya sîyasî di nava romanê de zale. Pêkhateya serekî ya romanê li ser avakirîye.

### 3.1.6 Têkiliya Romana Siyasî li Gel Bûyer

Diyarkirina bingehê bûyeran di romana siyasî de ne karekî hêsane. Divê kesê jêhatî û xwedî zanabûn di romanê de, bawerî pê anîna xwêneran bi romanê ku afirandina mijarekî zindîye. Helbijartina bûyeran ji aliyê nivîskarên romanan ve pêwîstî têkel buna li gel başî xirabî, ciwanî û neciwaniyê û ... hwd, bi wî şêweyî bi ku hebûna

[128] Rizgar Kerîm , *Romanî Mergî Bê Kota*, Slêmanî 2002 , Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, r41-42.

rastiyê têde diyar bêt û xwêner girêdayî bûyera nav romanê de bi. Piştrastiya bûyeran jê ava bikit. Di derbarê karanîna bûyeran di romanên siyasî de çênabi ku nivîskarê romanê herwiha bi şêweyê herêmî bê xeyal û raman û bê hunerê îstatîkî û teknîkî vegotina xwe rabixe ber çavên xwêneran. Ji ber ku bûyerên çêdibin pêwîstî bi rêzbendiyekê û rêkxistinekê heye, çi bûyerên nivîskarê romanê ji rewşê werdigri bi yan ji ew bûyerên ku li xeyalê xwede çêkiribi, yan jî ewên têkelin li gel rewşa heyî û bi xeyal, raman û bi şêweyekî hêja hatibi nivîsîn. Wate destwerdan li ser bûyeran tên kirin, carek din bi şêweyek din ji bo rêbazek din ji aliyê nivîskarê romanêan ve tê xistina nav çarçoveyekê de, pêkhateya vegotinkirin û rêzbendiya bûyerên romanê de.

Ji ber vê yekê têkiliyek xûrt di navbera bûyer û hemû beş û rêgezên din de heye. Em nikarîn ji hevdû cuda bikin. Di dema qalkirinê de ji bi hevdûve girêdayîne. " karekter nabit xwedî hebûn bê bûyer"[129]

Bûyer bingehekî diyar û berçave ji binemayên pêkhênerên roman. Li gel wê jî bûyer wekî binemayek hebûnekî ne serbixweye. Ji ber ku bi şêweyek hişt bi binemayên din yên roman ve hatiye girêdan. Yan ji bi binemayên din re hevgirtîne. Ji ber vê ji bandora xwe li ser binemayên din yên roman heye. Giringî û bandora bûyer dernakevit ger ne di çarçoveya van binemaan debit. Ji ber ku " vegotinkirina bûyeran û derxisitna rewşa kesayetiyan û çawaniya têkilîdanina bi cîhana hindir û dewrûber de, yek ji derketina asta hunerî ya vegotinkirinê yan jî hunera çîrokêye"[130]

Her yek ji van binemayan bandoriya xwe li ser hevdû dikin di aliyê ber bipêşveçûna karekterve. Ev ji li gel berbipêşveçûna dem derdikevi, kombûna ven binemyan jî pêwîstî bi bûyerekê heye ji bo kesan bikevin nava tevger û pêşveçûnêde. Ji ber ku " tenê bi rêya têkiliyên di navbera wan de em dikarîn ku bûyeran yan jî kesan bi hevdûve bidîn girêdan û nivîskar jî guhertinê di karê xwe de diki" [131]

---

[129] Rêzan Osman Mistefa, *Biniyatî Corekanî Rudaw Le Romanî Kurdî Başurî Kurdistan 1985-1990 Lêkolîneweyekî Rexneyî-Şîkarî- Piraktîkiye*, Hewlêr, 2008, Tezî Master, Kolêjî Ziman, Zankoî Selahedîn, r28.
[130] Bexitiyar Secadî, *Gêraneweyî Nuêkarane Û Pêkhatey Hunerî Le Romanî Kurdî Da Xwêndineweyekî Girewî Bextî Helale*, Hewlêr, 2009, Govarî Raman, J 140, r32.
[131] 'Ebdul Rehîm El Kurdî, *El Rawî Uelnes El Qisesî*, Qahîre, 1996, Teb'et El Sanîye Dar Elneşir Lîlcamihat, r24.

Nivîskarê romanê wan bûyerên di romana siyasî de didi pêş di nava xwede bîr û zanistên siyasî digri, yan ji; şer, peyman, zîndan, girtin, kuştin, birîna mirov, şewitandin, kavilkirina gund,bajar û navçe, qirkirin, enfal, nehêlana netew û netewên din, qirkirina netewên di ku hîs diki ku di aliyê  di aliyê zulm û stemkariyê ve nêzî netewa wîye dibi berhem. Ji ber vê bûyer "hindek bûyerên ku rewşên lêkolînên jiyana rojan ku wê rewşa civaka nivîskar didi diyarkriin hatine, nivîskar bûyerê ji civakê digri, lê belê wekî xwe na nivîsi, ji ber ku girtina bûyeran wek xwe wisan li  roman yan çîrok diki ku tenê erkê tomarkirin û veguhestina xal bi xal ya buyerê bidi diyarkirin" [132]

Ev jî giringiya giritna bûyerê derdixi. Ji ber ku roman û çîrok bê bûyer dernakevi pêş, bûyer jî bê mebest nayê vegotinkirin. Wê dem em dikarîn bêjin: "di nav romanê de alugorîkirina  li gel kesayet me digihîni wê xala ku pêwîstî bi kesaeyetkî dîrokî hebêt, heta ger ku di nava guhertinê dejî be " [133]

Nivîskarê romana bi şêweyek raste rast rewş û taybetmendiyên karekter dernaxi peş, ji ber ku karekter xwe bi xwe xwe pêşkêş diki.  Di vê derê de xwe diyar diki û cihekî ji bo karekter divehûnit ku taybetmendî, kar û reftarên xwe nîşan bidi, wate "giringtirîn rêga ji bo pêşkêşkirina kes ewe di rêya kar û kirdarên xwe de bên pêşkêşkirin" [134]

Her bi vê rêye têgihiştina mirov ji bo wê dibi ku roman bi giştî û romana siyasî bi taybetî  bandoriya bûyeran li ser bûyerên nav xala giring diyar dibit û dîtina xweya cîhanî li gorî çarçoveya têgihiştina wan bûyer û guhertinên ku rûdidin de berfireh dibe.

Bûyer rolekî bingehîn û serekî digir di dema sazkirina romana siyasî de, ji ber ku xwêner û rexnegirên di warê wêjeyê de di rêya bûyerên na romanê de dikarin xwedinekî siyasî  ji bo romanê bikin û wekî romanekî siyasi bidin diyarkirin, bi wateyekî din bûyer bi pileya yekem biryar li ser corên romanê didi. Gelo romanekî civakiye, polisîye,aboriye,şaristaniye,gunde, oliye yan romanekî siyasiye û .... hwd. Ji ber vê

---

[132] Mîran Celal Mihemed, *Binyatî Karekter Le Romanî Kurdî Başûrî Kurdistan Da*, Silêmanî, 2009, Çapî 1 Çapxaney Renc, r36.
[133] Arî Osman Xebat, *Piraktîkî Binîyatî Rudaw Le Romanî Paşayan Kuşt Û Qeble En Yehluq El Başiq Da*, Hewlêr, 2012, Govarî Raman, J 181, r72.
[134] Serdar Fayeq Mecîd, *Binîyatî Rudaw Le Romanekanî Mhemed Mukirî DaLêkolîneweyekî Wesif-Şîkarî-Piraktîkîye* , Silêmanî, 2013, Têzî Master Kolêjî Ziman, Zankoî Silêmanî, r27.

bûyer ji bo romana siyasî kevirê bingehîn yê romanêye û ji wê ve ber bi nava xala bingehîn ya romanê ve diçin û gav di avêjin ji bo rêgez û pekhateyên din yên romanê.

Wekî ku em di mijara xwe de jî dibînin, ka çawe bûyerên sîyasî ser bi bûyerên serekî ve bûne bingehê bûyerên romanê. Bi vî awayî roman li ser hatîye damezirandin û roman jî bûye romanekî sîyasî. Wekî di mijara romana Koçrew ya  Ebdulah Serac de eşkereye ku demê Camêr dîmenên bûçareyîya van koçberan dibîne. Wan malê xwe hiştine û bi xwe jî nizanin ka wê berbi ku ve herin û wê çarenûsa wan çawe be. Hest dike ku hemû berpirsyarîyek li ser milê wîye û hemû kesekê hişyar dike. Vê karesetê binivîse û tomar bike dema dibêje : "Helebçe û Enfal, her çiqas bi sedan pirtûk jî bê nivîsandin heş bi serê min.

Çawe di vê peyîza dirêj de ez denynê xwe bidim.... pênûs binivîse pêşîya ku ez bêxim ber xwendinê, nîgar û qelema reng bûm.... Di bistana seretayî de qelama reng û mela xefkem naskir.... Di tayîfa heskirinê de min pirofîlek çêkir, bi ava pîvazê û min ji ewran re di got : Kaxezê li ser agir ne qelînin vaye çax nêzîk bûye "[135]

Em di vê mijara serî de dibînin ku ka çawe bûyerên sîyasî bi awayekî zincîrî di nava romanê de hatîn û çûyînekê dike. Hinek caran rastî qetandinê dibe, ew jî jiber hatina nav wan ya behsê ye. Armanca wî jî xizmetkirina bûyerên serekî ya romanê ye. Ew jî koçberîya welatîyên kurd bû ka çwe berê xwe didin welatên din û ser sinorên din. Sedemê vê jî şer, zilm û zordarîya rejîma behs ya êraqê bû. Heya niha jî bi heman zîhnîyetê bi heman şêweyî wisan bi neteweya Kurd dikin û tînin serê Kurdan. Evan jî roman kirîne romanekî sîyasî. Ji ber ku bingehê wê çêbûna wê û berhemên wê romana sîyasîye.Bi awayekî din romana sîyasî di alîyê cor û çawenîyê de nabe romana sîyasî.Eger bingeha romanê li ser çendîn bûyerên cuda cuda bin, li goşegirîyekî sîyasî ne hatibe damezirandin eger bûyerên hebin û sîyasî bin pêwîste karekterên wê sîyasî, şoreşger,berxwedan, cih û demê bûyerên bûyerê jî heye bi vê yekê re dibe romanekî sîyasî.

---

[135] Ebdulla Serac, *Romanî Koçrew,* Hewler, 2003, Desgaî Çapu Pexşî Aras,  r 55-56.
Ebdulla Serac, Nivîskar û Roman nivîs û Edîbê Kurde li sala 1937 li Kerkukê ji dayîk buye, niha li Usturalyaîyê jîyan dike, Ebdulla Serac xwdanê gelek berhemên Edebî û Roman û Vekolînên rexneyîye ku pertuk xana kurdî têr û tijî kirîye wekî:( Çon Bume Tîtitwasik, Efsaney Rengistan yan Rengistanî Efsane, Pertewazey Ere û Ewêkanê Rewan, Kawlaş, nawê lem Têkiste binê...)

## 3.2 Têkiliyên di navbera Romanên Siyasî û Teknika Hunerîya Romanê de

### 3.2.1 Têkiliya Romana Siyasî Bi Hûnerê Pênasekirinê (Wesifkiirinê)

Çawaniya rêgezên din yên di nava romanê de nîşandana ew rewşa ku têde jiyan diki, di her romanekê de giringiya xwe heye. Ji ber ku xwêner ger bêtû zanabûnek temam di derbarê karekter û beşên din yên romanê de nebit û ne nasi û fêmneki, ew nikari di xeyalê xwe wêneyek ji bo wan çêbiki, her wiha nikari wisan li xwênr biki ku bikêşi nava çarçoveya romanê de û nikari heya dawî berdewam biki û bi xwe bibi yek ji karekterên nav romanê de, yan xwe û kesayeta xwe li nav pêkhateyek yek ji kesayetî û karekterên nav romanê de bibînit. Di heman demê de li gel bipeyivi. Ji ber ku ew " karekter kesayet yan jî Qehreman ku rêgez û beşê herî sereke yên çîrokên kurt û romne. Divê di şêweyê takekes kes de wesif pênase biki, ne wekî şêweyê nimune, yan nimunya giştî"[136]

Wesif pênasekirin bi şêweyekî giştî di nava roman de ji aliyê nivîskarên romanê ce gelek cor û pêkhateyên wê hene. Nîvîskar di dema encamdana vegotina wesif diki sedemû pêkhateyek giringe ji bo wesifkriina kesyetî, karekter, cih, dem û bûyerên sereke yên nav romanê de. Dema ku destbi wesifkirinê tê kirin dema vegotinkirina nav romanê de yan disekini yan jî sist dibi. Ji ber ku wesif û curên wesif yek ji erkên ku wan zanyariyên temam bê kêmasî di derbarê cih, bûyer, daxwaz û hemû qalkirinan bidi xwêner. Ji bo vê di derbarê wesifkirnê ve tê gotin " çênabi romanek bê nivîsîn bêy ku vegotinkirin û wesifkirin têde nebit"[137]

Ger ku wesif di romanên kevin de tenê ji bo diyarkirina beşê derve yê karekter û bûyeran bû. Ev di rexneyên nû û di nava romana nû de wesif kur bune bo beşê hindir yê jor û xem,jan û azarên hindirê karekter, her wiha li gel pêşxistina jiyanê,tam, şaristanî û wêjeyê, wesif jî hinek erk û beşên nu wergirtine. Wekî tenîka vegotinkirinê ji bo berdestkirina hemû aliyên jiyanê di nava roman û çîrokan de hatiye bikaranîn û sûd jê

---

[136] Sîrus Pirham, *Karekter Sazî Rîyalîstî Le Roman Û Çîrokî Kurit Da*,( Wer. 'Arif Heme Kerîm), Hewlêr, 2000, Govarî Raman, J 44, r158.
[137] Necm Xalîd Necmedîn Elwenî, *Corekanî Deq Awêzan Le Romanî Pêncemîn Ktêb Y Cemal Cebar Xerîb* , Slêmanî, 2012, Çabxaney Yad, r101.

hatiye giritin di vî warîde “Tanya Esed” dibêji "wesif pêwîstiyekî vegotinêye û gelek zehmete bêy wesif bikari bê vegotinkirin" [138]

Şêweyê herî hêsan ji bo wesifkirina karekterê nivîskarên romanên kevin bi şêweyekiye û ji aliyê nivîskarên nûve bi şêweyekî dine. Guhertin li ser çêbûne, ji ber ku di romanên kevin de "ji wesifkirinek kurt ya qala şeklê derve ya jiyana karekter pêkdihat..... her wiha asta jiyanê, lê belê di romanên nû de diyarkirina wêneyê karekter têkiliya xwe bi jêhatina nivîskar ve heye. Ku tenê bi wesifkirina ruyê derve narawesti, Amaje bi hinek taybetmendiyên hevbeş yên nava rêgezên mirovande diki" [139]

Di nava romana siyasî de hûnerê wesifkirinê gelek pêwîste û divê hebunekî piratîkî hebit û xwêner bi hêsanî wê hîs biki. Ji ber ku wesif miftiyea vekirina hindek zanyariyên giring û pêwîstin. Vêca çi wesifkirinek bingehîn bêt ji bo qalkirin û xistina ber çavan ya zanyariyan ya jiyana karekteran û hemû diyarkirina hemû rewş, derûnî û hestên karekter jî rabixê ber çava, yan jî wesifkirinekî derekî bit ku wesifê hemû ew xweza, dewerûber û hemû ew tiştên ku li dewerûberê karekter dehene. Bê guman ev core wesfê hûr û tejî zanyarî di nava roman de giring û pêwîste bi taybet ji bo romanê siyasî ku ev corê romanên siyasî pêwîstî bi vî corê wesifkirinê heye. Ji ber ku bi vê wesifkirinê nîvîskar çend erkek di aliyê xwe diyar diki û didi wesifkirin û corên we. Ji bo vê wesfê zêdetir ji bo diyarkirina awênê karekter û qalkirina bûyeran bê bikaranîn di aliyê nivîskarde. Li gorî vê di vî corê romanê de ku romana siyasiye bi şêweyekî ku dema qala karekteran diki yan wesfê wan diki, divê bi şêweyek bit ku sîma û şêweyek wesan bihonit ku li gel naverok û mijar û teoriya siyasî biguncit. Di aliyê din de wisan bi xwêner têbigihîni ku ew karekterê ku tê wesifkirin kesekî qehremane evîndarên netewî û di tekoşîna rizgarîxwaza netewa xwe de xwedî rolekî diyare û berçav heye. Hindek car û hinek zanyarî nehênî heye li corê romanande ku romana siyasî di rêya wesif û berdewamkirina wesifkirinê di aliyê bêjerve, yan karekterekî sereke perde li ser tê hildan û radixi li ber çavanên xwêneran. Li gorî vê em dikarîn bêjîn: wesif pêwîstiyekî giring û serekeya romane û tu romanek nikari armanca xwepêkbînin û xwêneran razî bikin.

---

[138] Tanya Es'ed Mhemed Salîh, *Bînay Şûên Le Du Nimuney Romanî Kurdî Hêlane Ejdîha Lêkolîneweyekî Tîyorî Piraktîkî Rexneyîye*, Hewlêr, 2006, Têzî Diktora, Kolêjî Ziman- Zankoy Selahedîn, r187.
[139] Celal Enwer Se'îd, *Teknîkî Gêranewe Le Romanî Ewareî Perwane Î Bextiyar 'Elî Da*, Bexda, 2006, Têzî Master, Kolêj Perwerde- Zankoî Bexda, r81.

Eger em temaşeyî vî corê romanê bikîn emê bibînin ku roman nivîs di rêye teknîka wesfê de karîye mijarekî sîyasî derxîne holê. Her wiha di alîyekî din de jî wesif û corên wesfê di nava romanê de arîkarîyekî bas ya xwe heye ji bo rêgeza duberekirinê û corên dubarekirinê jî berbi pêş de dibe.

"Ez binketîyê wê cengê bûm,bêyî ku ez hizra tiştekî bikim, xem ketîye dest de. Ew muzîka siharê rihê min ji tozê, tarîyê û xwînrêjana çend sala paqij kir. Wê şevê min fêmkir ku mûzîk madeya rastîya a mirovan dibîne.Ew kanza û cawidê paqij yê ku em jê çêbûne, celadetê kevokên wî wê şevê ez dinava daristanê de diçûm. Efserekî dizî ku hemû jîyana min di nava kuştin, şewitandin û wêrankirên de diçû. Neqîm Samîrê Bablî, hevalê serokkomar, li cem behsîyan dilawertirîn efserê leqê çar, xwedîyê notên qehremantî, ew zilamekî tirsonek bu û bêhna gelek texlîdan jê tê. Bi sedan gund di Kurdistanê de li gel zevîyên wan bi erdê ve kir yek. Çend bajar roxand, hey zarokê bêzirav ez vî zindîyê tirsonekê ber devê te "[140]

Eger em temaşeyî mijara jor bikîn ka çawe roman nivîs karîye vî karekterê dirinde bi sedan bajar û navçeyên kurdistanê wêran kirîye, di rêya hunera mûzîkê de eşkere kirîye. Di alîyekê de dirêjî bi dubarekirina romanê dide,ev sedem jî karê dubarekirinê sist û lewaz dibe. Di alîyek din dejî komek zanyarî li ser karekter û bûyên bajarê me dîyar dike. Ew bûyer û serhatîyên  sîyasî yên bi ser netewe û gelê me de hatî ji xwendevanan re eşkere dike.

Di wesfek din de di romana Gulçîyayî Ruhekan roman nivîsa jin  Rêwas Ehmed nivîskar wesfê  zebir û zengê rejîma behs ya ji navçûyî dike. Her wiha ew kurdên cehş yên ku xîyanetkarin, li gel hukmeta wî demî ya êraqê kar dikirin, Kurdan li Başûrê Kurdistanê didan kuştin, gund û navçeyên Kurdistanîya didan roxandin. Li ser vê armancê roman nivîs wesfa wê bi monlogê dubare dike. Behsa wê dike dema hukmetek bi reftarên xirap li dijî kes û gelê xwe bû. Wekî girtin, ji navbirin, talankirin û eşkencekirin. Ev hemû dibin sedem ku bandorê li ser hizrê civakê çêbike û jibîrkirina wê ne hêsan be. Ji ber ku ev bûyerên sîyasî bûyerên bi serhatî cergbir û wêrankirine. Dema di vê wesfê de dibêje : "Dayê tu birçîyî, ev du roje te nan ne xwarîye tu hertim memik jî

---

[140] Bextiyar 'Elî, *Romanî Şarî Mosîqare Sipyekan*, silêmanî, 2003, Çapxaney Endêşe, r182.

têxî di devê her du birayên min de, ji bo ku tu wan bê deng bikî. Tu di tirsî bi girî û gîyê wan jî cehşan aciz bike,gulekê berde serê wan"[141] . Di vê zivirandinê de bandora hizra netewayetî li ser deronîya roman nivîs çêkirîye. Di xwaze di rêya nivîsînê de vê ji dilê xwe derbixe û bi gehîne xwendevanan. Di vê wesfê de behsa acîzî û dil reqîya desthilatîya rejîma behs ya li navçeyê de dike.Ka çawe ketîne rihê zarok, jin û zilamê kurd de. Bi neheqî wan di kuje enfal û zindî têxedi çalan de. Bi vê yekê re romana xwe dike romanekî sîyasî, ji ber ku tejîye ji hizrê şer û nexweşîyê.

### 3.2.2 Têkiliya Di Navbera Romana Siyasî û Hunera Montajê de.

Montaj di romanê de xwedî rolekî erekeye, hebûna montaj di romande wekî pêwîstiyekî hûnerî û teknîkek giringe. Ji ber ku montaj zindibûnekê bi mijarê didi qezençkirin û wisan lê diki ku roman bibi corek ji romanên bi tevger,ciwan û îtatîkî têde hebit bi wateyeekî din roman bi giştî û romana siyasî bi taybetî gelek pêwîstiya wê bi hûnerê montajê ve heye. Ji ber ku dema nivîskar bi rêya karanîn û sûdgirtina ji vê teknik û hûnerêve diki bi şêweyekî hûnerî ciwan bidi awên û bala me bikêşi ji bo vê hest bawernakin ku ku karekterê heyî ne ya li ser kaxezêye di roman de.

Hemû berhemên wêjeyî yan karekterekî hunerî û pêşdikivi divê bi şeweyekî rast û kurt çend carek bi serdeçonek ji bo bê kirin. Ta wekû bê kêmasî bê pêşkêşkirin. Ev kare ji di rêya montajê dibit. Ji ber ku " montaj rê didi bi şêweyekî gelek balkêş nêzî hur û kurahiyan bibin. Ev nêzîkbûne jî wate ava diki, wateya wê jî bi veguhestina dû dîmen ku dîmenê yekem destpêke li pêşiya wê jî dimenê duwemîn hatiye dayîn, yan di encama birînê wate didi"[142]

Di nava roman de têkiliyek xurt heye di navbera teknîka montaj û rêgez û beşên din yên romanê de heye. Mînak; karekter bûyeran diafirîni û didi berdewamkirin, teknika montaj wan bûyerên ku rûdidin watedar dikin. Xwe bi xwe di nava xwede tam û îstatikekî hûnerî didi avakirin. Ji bo vê em dikarîn bêjin; "têkiliya di navbera teknîka montaj bi beşên karkter di hemû romanade wekî têkiliya kar bi hevdûve girêdayîne. Li

---

[141] Rêwas Ehmed, *Romanî Gulçîyayî Ruhekan*, çapxana mukiryan, Hewlêr, 2010, r63.

[142] Şiwan Gazî Pîrdawid, *Teknîkî Montaj Le Romanî Kurdî Da Romanekanî Karwan Umer Kake Sur Be Nimune*, Hewler, 2015, Kolêjî Ziman- Zankoî Selahedîn, r39.

ser vî bingehî têkiliya navbera roman de yeksan dibi. kar montaj+biker karekter ji ber wê montaj danûstandin û tevgerên karekter di romande tên guhertin. [143].

Li gel wê jî li ser ji bo nivîskar pêwîste ku wesfê karekter, cih,demê cuda, buyeran û vegotinan û dîtinên cuda diki li ser cihê rast yê xwe rabixi ber çavan û nîşan bidi û wisan li xwêner bikit ku kur bibi nava romanê, hest bi hebûna rastî ya romanê biki. Ji bo vê bandora aligir ava dibi, wek kesekî asayî yê civakê danûstandinê li gel biki. Ji bo vê jî pêwîstî bi hunerekî wekî montaj heye ji bo komkriin û danîna dîmenên pêwîst di nav romanande.

### 3.2.3 TêkilIya Romana Siyasî ligel Hunera Guftugokirinê

